

Feqî Huseyn Saĝnîç

Hêmana

RÊZIMANÊ KURDÎ

MELSA Yavînlari

MELSA Yayınları : 10

Birinci Baskı: Mart 1991

Dizgi: DİZ Basın Yayın 512 36 68

Kapak ve İç Baskı: GÜLŞAH Matbaası

MELSA Yayınları

**Mustafa Kemalpaşa Cad. Yıldırım Palas Han No: 17/9
Aksaray / İstanbul**

Feqî Huseyn Saĝnıç

Hêmana

RÊZIMANÊ KURDÎ

MELSA Yayınları

Fihrist

Pêşgotin	7	Cinavkên qertafi	73
Zman çiye?	11	Cinavkên xwediti	74
Çêbûna zmanan û rêzman	12	Dî hawira zmênda	75
Celebên zmanan û zmanê Kurdi	13	Rengdêr	77
Brên zmanê Kurdi	15	Brên rengdêran	78
Nvisandinên Kurdan	16	Rengdêrên zêdedari	80
hevok	18	Rengdêren wekhevi	80
peyv	19	Rengdêrên kîşkeri	82
kite	20	Rengdêrê hejmara rêzdari	83
deng	21	Rengdêrên hejmara beşdari	84
Elfabe	22	Rengdêrên îşarki	87
Pevdak	24	Rangdêrên pîrsyari	88
Nvisandina wan dengên bê tip	24	Rengdêrên nekîşî	89
Nvisandina tipên gîr	25	Pêkhatina rengdêran	89
Tipên keljandînê	26	Dabaş gelê bindest	91
Dî serê peyvanda tipa "î"	26	Lêker	93
Ketina tipan	27	Lêkera binyati	94
Ci guhertina tipan	28	Lêkerên çêkiri	95
Celebên peyvân	29	Lêkerên qertaf	98
Name	30	Lêkerên hevedudani	100
Nav	32	Lêkerên dervazi û nedervazi	105
Brên navan	33	Rader	107
Praniya hindîk	36	Qurmê lêkeran	108
Kîşî nekîşîya navan	38	Pêkhatina qurmê lêkera fermanê	109
Mê û nêr	39	Lêkerên sazi	109
Qedinek	43	Lêkerên nesazi	115
Qedandi	43	Dî lêkeranda neyini	118
Nekîşîya qedinekan	45	Dî lêkeranda ahengi	121
Qedandek	47	Dî lêkeranda dem	125
Têgihên celebên qedinekan	48	Dî lêkeranda kes	126
Tewang	50	Dî lêkeranda rawe	128
Celebên tewangan	51	Nevroz	128
Nav û çêbûna navan	54	Raweyên pêşkeri	128
Daxwaznamek	59	Boriya têdayi	132
Cinavk	61	çirokiya boriya têdayi	133
Celebên cinavkan	62	Boriya dûdar	134
Desta ez	62	çirokiya boriya dûdar	134
Desta mîn	65	Dema nho û freh	137
Cinavka zvirandi	66	Çirokiya nho û freh	138
Cinavka hevayî	67	Çirokiya nho û freha hevedudani	139
Cinavka kevnê lêkeri	67	Dema bê	141
Cinavka kevnê daçeki	67	Çirokiya dema bê	142
Cinavkên îşarki	69	Dema bêya hevedudani	143
Cinavkên pîrsyari	71	Çirokiya bêya hevedudani	145
Cinavkên grêki	71	Şertiyên pêşkeri	147
Cinavkên peywendî	72	Raweyên daxwazi	151
Cinavkê nekîşî	72	Fermanî	153

Raweya xwestini	154	Çirokiya şert-daxwaza hevedudani	170
Çirokiya xwestini	155	Tabloya tevayi	172
Xwestiniya hevedudani	157	Welat	174
Çirokiya xwestiniya hevedudani	158	Lêkera bûn	176
Raweya blani	159	Hebûn	185
Çirokiya blani	160	Dî lêkeranda pîrsyari	192
Blaniya hevedudani	161	Hoker	193
Çirokiya blaniye hevedudani	162	Daçek	198
Raweya vênî	164	Baneşan deng	201
Çirokiya vênî	165	Ghanek, grêk	202
Vênîya hevedudani	166	Niqteşani	204
Çirokiya vênîya hevedudani	166	Hevok û celebên hevokan	208
Raweya şert-daxwaz	168	Hevokên navdêri	209
Çirokiya şert-daxwaz	169	Hevokên lêkeri	213
Şert-daxwaza hevedudani	170	Ferhengok	219

Pêşgotin

Zman ji çar endamên netewî (zman, welat, çand û bazar) endamêki jî gişkan gringtîre. Zman çeka serbestî, serxwebûn û serfîraziya gel û netewîye. Zman neynika çand, pişê, dilan, wêje, afirandî û pêşve çûnêye. Zman pergala peyivîn, hev nasîn, hev serwest krîn, nîşîn, xwendîn, hin bûn û hin krînêye. Zman rêçenasê rêzani, peyman, danîstan, lêkhatûn, lêkanîn û gişk tevgerên mîrofanîye. Bî kurtasî bîbêjî merîf çî heyînên xwe wînda bîke hînde heyînan wînda dîke, lê gava zman wînda bîke gişk heyînên xwe wînda dîke. Çî heyînên netewî jî wînda bîbît zman dîkare wê vegêrine lê gava zman wînda bîbît tu heyînan nîkare wî vegêrine.

Şxwe têtê zanîn ku pîşker, dema alaziya pîştîna gelekî û netewekî bîkîn, pêşî radîhîjne zmên. Lewra ew gelek rînd dîzanî ku dema zman pîşî ew gel û netewê bê çek, bê neynîk, bê pergal û bê rêçenas dîmîne, êdî nîkane tu şîrî bîke û dî cîda dîmîre.

Neteweyên Dnî bî sedan sal emek lî zmanê xwe dane, wêjeya xwe zengîn, xezîna peyvan frêh, teknîka zmên tekûs krîne û bî pêkanîna van zanîn, pişê, tevger û şîrezayî pêşda brîne. Me heta nîha jî zmanê xwe zêdetîr emek lî zmanê biyanîyan daye û hê jî dîdîn. Îro jî gelekên jî me zmanê biyanîyan jî yê xwe çêtîr dîzanîn. Qey ne bese.

Me lî jorîn "neteweyên Dnî teknîka zmanê xwe tekûs krîne" go-

tibû. Heçi zmanê me tekûs krîn naxwaze. Lewra tekûsiya teknîki dî hêmana zmênda heye. Teni pêgeran dîxwaze. Bî şanazi dîbêjim ew qaydên dî vî rêzîmanida ci girtine, bî lêgeranên curbecur me jî hêmana zmên derêxistine. Jî alî mînve yek qayde jî ne hatiye çêkirin. Disa bî şanazi dîkarim bî bêjim jî alî teknîka zmênve zmanê me pîr dewlemende. Şxwe çend sed salin ev şerê gran me hîştîye ser mlê zman heta iro jî berxwedan û jî şer krîna wî jî dewlemendiya wî tê zanin. Dîvê jî vê dewlemendiyê em wec bî binin û wec bîdine zmanên biyaniyan jî. Ew jî pzo bî xebatên hêjayî pêktên. Çawan me pêkanîna şolan gişk hîştîye hêviya cwanan, ev jî wlo maye hêviya wan. Gumandarim cwanên me vê xebata hêjayî jî dê pêkbinin.

Dî temenê sêzdehêda bûm, sala 1938 an çûme medresê. Mîn dî ku graniya wanên qutabiyan rêzîmanê Erebiye. Mîn jî hevalan pîrsa rêzîmanê kurdi dîkîr lê bersîvek qenc ne dîstand. Hnekan "em nîzanin", Hnekan "me ne bhistîye" û hnekan jî "ne guncane rêzîmanê Kurdi hebit û bîbit jî" dî gotin...

Lî ser vê yekê jî wê rojê vîrda hêdî hêdî mîn dest avête rêzîman û peyvan. Dî pîr demanda mîn dabaşa cvatan dîfetilande ser qaydên rêzîmên û zanîna peyvan. Pîştî 1960 an xebata Kemal Badîllî ser rêzîmên mîn bîhist û gava mîn xebata wî dî gelek şah bûm û bî dîlek xweş û geş mîn notên xwe gişk danê ku xebata xwe baştir û tekûstir bîke. Misoger Badîllî gorê guncanên wê rojê rêzîmanek qenc nîvisî û çapand.

Pîştî 1970 êyê hinde heval lî ser mîn pîr sekînin û jî mînra "dî demên borîda xebata te ser zmanê Kurdi hebû. Heke hinde jî xwe bîwestîni tuyê rêzîmanek qenc bîkarîbî çêkî û chê vala mayî tîjî bîkî" Hindekan jî "jîbîl nîvisandîna rêzîmên û ferhengê tu kêrî tu şolê nayê" dîgotin.

Lî ser vê yekê gelek ponîjim û mîn bîryara xwe da ku alîkarî jî zanîna bîxwazim û dest bî rêzîmên bîkîm. Gava mîn dî ne welê bû. Jî zanayên dî gumana mîda heyî mîn wecek kêr hatî ne dî. Bî tenî Mele îsmet wecê mîn gîrt, him alîkarî him jî dî çewtî dîst krînêda gelek kêrê mîn hat. Bî vê rewşê ketim nav vê xebata pîroz.

Gava mîn bergerana xwe pêkanî û dest bî nîvisandînê kîr, xwîya

ku ev ji ne hêsane. Lewma metnên bî Kurdi nvisandi şxwe kê m peyda dîbin, qasi heyî jî û jî nvisandîna xwe ya rojek berî jî bî hêsani min ne dikariya wec bibinim. Lewra gelege ne lî bal min bûna. Bî vî tîrs û weywelê nvisandîna vî rêzîmanî sala 1978 an qeda. Vêca lî çara çapandîne geram.

Jî xwendevanan xwestîna min: Ne bî rîk û ne jî bî bexşendeyî lî vê pirtûkê menêrin. Bî ponijînek gran qenc bixwinî, qenc feh m bîkî, paşî kêmasiyên dî pirtûkêda heyî û rexne xwe jî minra bîşî nî. Vê yekê eger hûn jî mîra bîkî dê pîr dîlxweş û bextiyar bîm.

Dabaşekê grîng ewe ku dî vî rêzîmanîda hinde rasnîvis û qaydên qîasîkî hatîne guherandin. Dî hezra mînda vê guhertîne hê têrê ne kîrîye dîbe ku hinde cîyên dî jî bîne guherandin. Şxwe rasnîvisa zmanê Kurdi hê rûnenîştîye. Pêgerên nû hinde qayde û rasnîvisê nû bibînî ne sodrete. Qenc bala xwe bîdîne zmanên ne- teweyên Dnî ku sedan salî rêzîmanên wan hatîne çêkîrî, rasnîvi- sa wan hatîne dîtin û rojê sedhezaran pirtûk, kovar û rojname bî wan têne nvisandin, disa hinde qayde û rasnîvisa hinde cîyan têne guherandin. Nexu çawan her bûyî û heyî dî hundîrê xweda her- gav tekamûl dîke wsan zman û rêzîman jî dî vê rêzîkêda dîherîke.

Mîsoger dîvê bête zanî ku ev guherandin ne jî xwestîna kêfa mî, jî xwestîna hêmana zmên derketîye. Tenî peywîra mî pêgeran, dîtin û nvisandin bû. Heke bî kûrayî lî hêmana zmên bînerî hûnê van qaydan an wha û hinde qaydên dî jî bibînî.

Jî bîl navdêra cinavkê navdêrên rêzîmanî yê qîasîkî ne hatîne guherandin.

Pîştî dane nasîna zman, rêzîman, hevok, peyv, kite û danîna el- fabeyê dgel hinde qaydan me dest bî nîvisandîna navan kîr. Jîbo hesîneyê berî parçek xwendîne, jîbo hîlbîjartîna navan kovana egi- teki hate danî. Paşî nav dgel çîngîlên navan hatîne vekîrandî. Ci- navk û rengdêr jî bî vê rewşê gîşk jî bî vekîrandînekê kurt hatî danî. Lêker jî mîna nav, cinavk û rengdêran pêşî parçek xwendîne dûra metnek hîlbîjartîne paşî dest bî celebên lêkeran hate kîrî. Jî- ber ku celeb û peywîrên lêkeran zêdene lî ser sekî jî zêde xwest. Bî vekîrandînekê kurt lêker û rawe hatî danî. Lêkera bûn û lêkera hebûn her yek bî têgîhan û drûvên xwe hatî vekîrandî.

Heke teng ji bit hoker, daçek, baneşan û nîqteşani hatin danin. Ê hinde taybetiyên wan hatin vekitandin. Lî ser hevokan jî qederek dabaş hate krîn. Hevokên navdêrî û hevokên lêkerî dîgel taybetiyên xwe hatin danin û heke kurt jî bit têgihanên van yê curbecur hatin nmandin.

Kijan daneka dabaş jê hati krîn wekokên wê jî hatin danin. Graniya wekokan bi tabloyan pêk hatine. Ew peyvên ku jî alî herkesve nayne zanin û dîgel gişk navdêrên rêzîmanî bi ferhengî lî dawîya pirtûkê hate ci krîn.

Ev pirtûk afirandina min ya pêşîne. Guman dikim ne ya paşîn bit

Feqî Huseyn Sağnıç
21.3.1978

WANE I

ZMAN ÇIYE?

1. Heke bî kurtayi bersîva vê pîrsê bête dan: Zman pergala hev serwext krînêye. Pergalek welêye ku jî zayînê heta mîrînê jî her keskra mîna xwarîn, vexwarîn û wergirtinê peywîstîye. Jî jîna kîflet bigire heta jîna cvatî, jî aboriya malê bigire heta aboriya dewletê, dî her gehinekekda zman wek heyînên bîngchin peywîra xwe dîbine. Zman bî vê jî ranaweste, çand, pişe, şhrezayî, pîspori, bî kurtasî jî kes û cvatanra çî bîvê, gişk dîgchine û pêşve dibe.

Zman ne malê ref û tebeqek cvatî û ne jî malê sazîmaneke. Pzo zman dî gişk ref û tebeqên cvatî û sazîmananda, wek heyînên bîngchinên wê ref, tebeqe û sazîmanê dîdome.

Qenc bala xwe bîdînê ku bî guhertîna sazîmanan zman naguhere, heta dewlemend dibe, dîxemîle û pêşve dîçe. Jîna komûnotê dervazê sazîmana koledarî, sazîmana koledarî dervazê sazîmana feodali, sazîmana feodali dervazê sazîmana sermayedarî bû û dî heryek van sazîmananda aborî û rewşa hîlberiyê hatî guherandin, aborî û hîlberî gorê sazîmanan drûvên xwe girtî, disa şoreşa "oqtobrê" dî sala 1917 handa lî çarîtîya Ûrîs pêkhat û Soviyetî hate hmatê. Aborî û hîlberî gorê sazîmana karkeran hate guherandin lê

dı gişk van sazımananda zman herweki xwe ma. Bı teni heryek van sazımanan peyvokên xwe lê zêde krın û xemilandın.

Vaye ji roja komûnotê heta roja me zman dı bın xızmeta gel û refên cvatida xebata xwe kriye û dıke. Jı ber vê yekê dıvê herkes lı ser zmanê xwe yê taybeti bısekıne û pêşve bıbe. Lewra jıbo ghiştı-na jına wek hevi, pêşve çûna gel û çanda gelêr dıvê. Pêşve çûna gel û çanda gelêr ji pzo bı zmanê gelêr pêktê.

Jı kûraya mêjoyê (dirokê) hetani roja me, karbıdestên neteweyên serdest bı gişk finfonekên zordariyên xwe, lêxebıtine ku bı zman û çanda neteweyên xwe, netewe û gelên bındest bıpışêvın (asimile bıkın). Netewe û gelên bındest ji him ber xwe dane ku nepşıvın him ji ji bê çaretıyên xwe zman û çanda netejeyên serdest xwendıne lê pêşve ne çûne û naçın ji. Şxwe tê zanın ku yek kesên gelan dı nav zman û çanda bıyanıda bıgıhıjın ji, çara bı tevayi gel ghiştınê tune û heta nho recetek wha ne hatıye nvisandın û nayê ji.

Jıber vê yekê dıvê ku herkes ji zmanê xwera xebatkar û ji zmanê gelê dınra ji berêzkar bıt...

ÇÊBÛNA ZMAN Û RÊZIMÊN

2. Dı nav candaranda insan heyinek welêye ku dıponıje, serwext dıbe, serwext dıke, hin dıbe û hin dıkeye. Jı van taybetıyên xwe insan ji heyinên dın cdaye. Şxwe zanayên beri: "Insan bı ponı-jın û hzırınê ji heywanan cda dıbe" dıgotın.

Insan dı nav cvatêda dıji, jıbo pêkanına şolên xwe yên curbecur dıviyabû ku bı kesên hawirê xwera bıpeyive, wan serwext bıke ji wan hin bıbe û wan hin bıke. Heta insan bı vê ji ne sekıniye û nasekine, dıxwaze ku xwestına xwe bı heywanan ji bıde fehm krın. Jıbo pêkanına van xwestınan, insanan zman afirandıye.

Dı demên kevnareda insanan, pêşi bı işaretên curbecur hev serwext krıne, paşi hêdi hêdi bı ali danganve çûne, pêşi dengên xwerû, paşi hêdi hêdi bı aliyê peyvane şemıtine, pışti pêkanına peyvane, hevok û dûra ji wêje (edebiyat) anıne hmatê. Zman hê ji ne

rawestayê, rojbîroj pêşve diherike û xwe nû dîke, dîçe.

Ew îşaretên kû kalên me bîkaranine, me hê ji beşek jî wan jî bir ne kriye û em bîkartinin. Mina: Jîbo erênîyê serê xwe bî ali jêrve, jîbo neyîniyê jî bî ali jorve dihejinin. Dî şûna hereyêda em destê xwe bî ali derve, dî şûna wereyêda bî ali xweve dihejinin. Gava kêfa me xweşbe berken dîbin û gava kêfa me ne xweş bî eniya me dîqîrmîçe. Beşek jî wan dengên ku em bîkartinin jî, mina: "hah, hî, ax, ox, wax, of, oy" û êd. jî wan dengên kevnarene.

Çqas berkêşan û pergalên berkêşanê pêşve dîçe tekûs dibe, zman jî gorê wan xwe dîgîhijîne û dîxemîline bî wanra dîçe. Lewra heyinên nû derdîkevî û jî wan heyinanra peyvok dîvên. Jîber vê yekê peyvên çend sal berî têra peyivî û nîvisîna îro nake.

Vaye zman bî berkêşanêra serbîser diherike. Çawan berkêşana gelên paşve mayî paşve mayîye, wsa zmanê wanjî paşve mayîye. Dî qutbê başûr û bakurda gelên paşve mayî, berkêşan paşve mayî û zman paşve mayî hene, tenî jî heyinên dorê xwe dîkarî baxêvî.

Pîştî pêşve çûna berkêşan û insanan, êdî peyvî û hevokên xwerû bî serê xwe têra peyivî û tevgerê ne krî. Vêca rêzîman kete bernamê. Rêzîman jî jî hêmana zman hate derxistî. Lewra dî zmanekda gava xezîna peyvî zêde û freh bû, êdî bê rêzîman nayê tîgîhan. Rêzîman jî gorê pêşve çûna hîlberî û cvatan xwe nû dîke û pêşve dîçe. Vaye edebîyat, afirînekên edebî teknîkî bî rêzîmanên drîst pêktî. Pişe, aborî, rêzîman, çand, peyv, edebîyat û êd. Gişk bî zmênve grêdayîne. Zman jî gorê berkêşanê xwe nû dîke, xwe tekûs dîke û xîzmeta berkêşanê dîbine...

CELEBÊ ZMANAN

Û

ZMANÊ KURDÎ

3. Celebên zmanan hîngî hejmara cvatanî. Dî dînyayîda çqas cvat hene, heryek jî wan xwedî zmanek taybetîye. Heya nha bî ve-bîr hejmara cvat û zmanan ne hatîne zanî lê bî qasî duhe-zarûpênsedî jortîr hatîne senîfandî. Jî van bî qasî sedûpêncîyî jê

zmanê dewletanin. Dî mêjoya kevînda zmanê Kurdi jî zmanê dewletê bû. Nho jî lî Eriwanê û lî Iraqê jî zmanê resmi tê hejmartin.

Dî navbera zmananda çqas nîzikayî hebe jî disa heryek xwedî xezinek peyvan û nemaze xwedî rêzîmanek taybetîye. Dî navbera cvatanda çawan danîstana aborî heye, wsan jî danîstana peyvan heye lê rêzîman dgel qaydên xwe jî zmanek nîkare bîçe zmanek dîn. Bî danîstana peyvan jî zede nagihîje xezîna peyvan, heta pê dewlemend dibe û tesir lî rêzîman jî nabe.

Ev zmanên cûrbecûr û jî hev cda, heryek bî serê xwe pêkhatîne û tene bikaranîn jî lê dî navbera wanda destê û destê hinde nîzikayî grîng hene. Emê van nîzikayan bî hêmanî û drûvî hildin destê xwe.

4. Hêmana zmanan: Wsan dîxwîyê ku ew zmanên bî hêmanî nîzikên hev jî reyek, jî makek derketîne û lêzîmê hevîn. Gava dî zmanekda peyvek tune bî jî zmanê lêzîm anîna wî hêsanê û rêzîman jî lî hev tene kemperandîn.

5. Drûva zmanan: Dî drûva zmananda lêzîmî ne şerte. Têni ew zmanên drûva wan mîna hev bî jî drûvek tene hejmartin. Heta nha zman lî ser sê drûvan hatîne pejirandin. Lê hêmanên zmanan cda û cda hatîne ditîn.

Hinde zanayên kevîn, hejmara hêmanên zmanan heta heftan rakirîne. Paşî dî navbera hêmanên hinde zmananda, hnek nîzikayî xwîyane û hejmar hatîne kêmkirin. Îro çar hêman tene pejirandin.

Hêman

- 1- Hindi-Avropa
- 2- Çîn-Tîbet
- 3- Banto
- 4- Ural-Altay

Drûv

- 1- Zmanê yek kite
- 2- Zmanê bî qertaf
- 3- Zmanê tewang

Hinde zmanzan "Semitik"ê jî hêmanek cda dî pejirîn, ez wlo nabinim.

1- Zmanê yek kite: Lî dû hev rêz krîna kîtan hevok pêktên. Mîna Zmanê çînê.

2- Zmanê bî qertaf: Tîpên qurmên peyvan naguherîn. Yanî

qurmê peyvan her wek xwe dîminin û lî pêşî yan jî lî paşîya qurman qertaf têne zêde krîn, mina zmanê Tırki: Zmanê Tırki jî zmanê bî qertafa paş qertafe. Wekok: "yap" yap - tî = yaptı, yap - ıyor= yapıyor, yap-acak= yapacak.

3- Zmanê tewangi: Him tipên qurmê peyvan dîguherin him jî bî daçek û qertafên curbecur têne tewandin. Mina zmanê Hindi-Avropa.

Zmanê Kurdi bî hêmanê xwe û bî drûvê xwe jî jî zmanê Hindi-Avropêye. Yani zmanê Kurdi, zmanek tewandi yê tip guhere. Wekok: "Kır" kr-ıye= kırır, dî-k-e= dîke, dê bî-k-e= dê bîke.

BRÊN ZMANÊ KURDÎ

6. Beri îslamiyetê Kurd rûniştûbûn û lî pişê û çandînayê dîxebîtin, dî warê şehrezayida pêşve çûbûn, dî navbara xweda pîr û hindîk yekitiya zmên pêkanibûn. Piştî hatina îslamiyetê; jiber zordariya eşîrên ereban, jîbo xwe parastinê Kurd carek dîn jî derketin çîyan û jî nûve jîna aşîreti destpê krîn. Jiber vê yekê zmanê Kurdi yê kevin bû çar (4) bîr, çar zarava:

- 1- Sorani (Sori)
- 2- Lori
- 3- Zazayî (Dmîlî, Dîlmî)
- 4- Kurmancî (Kurdmancî, Kurdmanî)

1- Zaravayê Soranî dî bnîka xweda dîbe sê devok: Gelhorî, Babanî (Babakurdi) û şêxbîzîni. Gelhorî lî rojavayê Îran û dorê Kerkûkê, Babanî lî dorê Xanîqîn heta xalîça Besrayê rûdînin. Şêxbîzîni eger bermayek wan dî Iraqêda mabî jî graniya wan lî dorê Trebzonê, Diyarbekîr û lî hawêrê Ankarê rûdînin.

2- Lori: Lîbaşûr û rojavayê Îranê, yani lî dorê Abadanê rûdînin.

3- Zaza: Heke dî Iraq û Îranêda bermayek wan mabî jî graniya wan lî Dêrsîmê heta hawêrê Diyarbekrê rûdînin.

4- Kurmancî: Zaravayê Kurmancî jî gişk zaravayên dîn frehtîre

û hejmara nfûsa Kurmancan ji ji gişkan pirtire. Kurmanci lî hawêrê Eriwan û Nexçivanê, rojhilata Tirkîyê, bakura Sûryê, bakura Iraqê û rojava û bakura Îranê rûdinin.

Zaravayê Kurmanci dî bnîka xweda dibe sê devok: Buhti, Mehmedi û slivî (Glivî). Herçiqas dî metnê kevînda dabaş jî van hersê devokan tê krîn jî lê iro dî navber wanda tu ferqên grîng naxwiyên. Şxwe dî metnên kevînda jî, ne ciyên wan devokan ne jî ferqên wan ne hatine nişan dan. Wsan dîxwiyê ku hozanên Kurdan hersê devok bî hevra bîkaranîne û ew ferqa lî navbera wan heyî rabûye. Hozanê mezî Ehmedê Xanî dî Mem û zinêda wha dîbêje:

Buhti û Mehmedi û slivî

Hîn lîl û hînek jî zêr û zivî

Wsan dîxwiyê ku Ehmedê Xanî jî ferqek grîng dî navbera hersê devokanda ne diye. Em jî nabinin.

Herçiqas ciyê Botan (Buhtan) jî derê dî çêtir dîpeyivî lê dî hezra mînda ev ne jî devokêye. Jîber ku tevlaya ciyê Botan bî biyanîyanra hîndîke, demek drêj jî navendi (merkezî) ya Kurdistanê kriye û gelek jî hozan û hîlbestevan jê rabûne, lewra peyivîna wan xwerûtir û edebîtir.

NVÎSANDINÊN KURDAN

7. Kurdan jî mîna hevdemên xwe, dî mêjoya kevînda bî nvisandîna bîzmêr nvisandîne, xwendîne. Bî wê nvisandîne şehrezayî gelek pêşda brîne. Şehrezayî ghaye gehinekek wîsan ku êdî nvisandîna bîzmêr têrê ne kriye. Vêca elfabeyek jî alî Kurdanve hatiye çêkirin ku heta iro jî jêra elfabeya Kurdî tê gotin lê gelek gelên dî jî jê wec ditîne. Dewletan û olan jî ew elfabe xebîtandîne. Zendawestaya Zerdeştê me jî bî wê elfabeyê hatiye nvisandin.

Ew elfabe heta derketîna ola îslamê dî nav Kurdanda jîna xwe û peywîra xwe domandîye û pîr xebatên grîng jî kriye. Nha jî Kurdên êzîdî (yezdânî) pîrtûkên xwe, tevgerên xwe yê olî (dînî) bî wê elfabeyê dînivîsîn. Lê iro jî bîl hêjana wê ya mêjoyî zêdetir gelege lê

neyête nêrin.

Pîşti ola islamê Kurdan ji mina gişk gelên islam bî tipên Erebi nvisandine û xwendine. Dî destê meda bî tipên Erebi nvisandi gelek afirinekên Kurdi hene. Hê ji lî Îranê bî tipên Erebi tê xwendin. Lî Iraqê dî dbîstanên Kurdanda wane gişk bî tipên Erebine. Bî mîn, zmanê Kurdi bê kêmasî bî tipên Erebi nayê nvisandin. Yek ji hin bûna nvisandin û xwendinê, bî tipên Erebi pîr izaye.

Qasî pêncî sal berî, Kurdan lî Sûryê dî pêşengiya Celadat Bedîrxanda kovar û agehname bî tipên Latîni çap krîne. Hewara navdar yek jî wane. Jî wê rojê vîrve Kurd lî Sûryê bî tipên Latîni dî-nivîsîn û dîxwînîn. Lî Bêrût û Avropê jî Kurdan tipên Latîni pejirandine û gelek pêşda brîne. Nemaze lî Avropê gelek pîrtûk, rojname û kovar bî tipên Latîni derkevtine û derdikevîn jî. Lî Kurdolojiya zanoşka Sorbon û Kordolojiya zanoşkek Îtalyayê, wanê Kurdi bî tipên Latîni têne dan û şxwe dîvê welê bî.

Pîşti şoreşa mezîn ya Oqtoabrê dî Sowîyestanêda bî tipên Latîni dest bî nvisandin û xwendina Kurdi hate krîn û qasî deh salan ajot. Paşî fetilandinê elfabeya krîlik. Lê nêrin ku tipên krîlik lî zmanê Kurdi nayê. Nha lê dîxebîtin ku disa elfabeya Latîni saz bîkîn.

Lî Tîrkyê, herçiqas dî dema Osmanîyanda, rewşenên Kurdan lî Stenbolê jî sala 1908 an paş, rojname û kovarên rêzani (siyasi) û edebî bî tipên Erebi derêxistine jî lê pîştî komara Tîrkyê hêdî û hêdî bî alî tipên Latînîve çûne. Jî hîlbîjartîna 1950 yî vîrve weşek xweşkêş pê ketîye. Nho gişk rewşenên me lî ser tipên Latîni dîsekî-nî û mafê jî wloye. Lewra bî tipên Latîni Kurdi drîst tê nvisandin: Dîvê her Kurdek jî dî vî warîda bîxebîte.

Hêvidarîm ku gişk Kurd dî vî warîda bîxebîtin û tipên Latîni bî-dîn pejirahdîn ku em jî bîgîhîjîn hemdemên xwe.

WANE II.

HEVOK

8. Hevok: Dî nav peyvînek yan ji nvisînekda, ew peyvên têgîhdar yan ji wezîfedar ku li dû hev tene rêz krin dîbin komîkek, ew komîk ji bî serê xwe têgîhek îfade dike û xwestînek, agehiyek, ponijînek û kovanek bê kêmasî dîde diyar krin, jêra hevok tê gotin.

Hevok ji tipa gîr destpê dike, bî nîqtê dîqede û têda du peyv yan ji gelek peyv hene.

Hevok du celebî: 1- Bî lêkera bûn yan ji jî lêkerek nedervazî.

2- Jî lêkerek darvazî hevok.

1- Dema hevok bî lêkera bûn yan ji jî lêkerek nedervazî pêkbêt, têda du peyvên hêmanî hene: Kîrde, pêxîstî.

	Kîrde	Pêxîstî	Kîrde	Pêxîstî
Bî lêkera bûn hevok:	Ez	rindim.	Tu	qenci
Jî lêkerek nedervazî	ez	revim	tu	keniy

2- Dema hevok jî lêkerek dervazî pêk bêt têda sê peyvên hêmanî hene: kîrde, serve, pêxîstî.

kîrde	serve	pêxîstî.
ez	rêzîman	dînivîsîm
Mamoste	mîn	hîn dike

Emrika gelan dımije

Kırde ewe ku krînê, bzavê dıke yan ji bzav û bûyin dı nefsa wida tê hmatê. Eger kırde bı lêkera bûn yan ji bı lêkerek nedervazira bêt, bzav yan ji bûyin dı kırdeda tê hmatê (lı mjara 108 an bînêrın). Eg ır bı lêkerek dervazira bêt, kırde krînê dıke (lı mjara 106 an bînêrın) çawan lı jorin ji dıxwiyên.

Serve ewe ku bzav, krın lê tê krın, yan ji bzav û tê ghana pêxısti bı ci, drûv, dem, sebeb û êd. dıde diyar krın.

Serve bı van taybetiyên xwe dıbe du celeb:

1- serva rasteder (serva misogeri)

2- serva nerasteder = têrker

1- Serva rasteder ewe ku bzav rastbıras lê tê krın. Mina:

ez **karkeran** dıparêzım. ew **şol** dıkın

2- Têrker bı çawani, çendani, ci, dem, sedem, rewş û drûvê xwe têgıha bzava pêxısti dıqedının.

Gel bı **canê xwe** arikariya karkeran dıke

karker **bı hnerê xwe** şol dıkın

Jı têrkeran yên ku ci, dem û çawaniya bzava pêxısti dıdın diyar krın, jı wanra têrkerê hokeri tê gotın.

Gel bı **canê xwe herdem** arikariya karkeran dıke.

Dı pırsanda carna peyvek ciyê hevokek dıgire. Mina:

Tu jıkû tê? Jı **Kurdistanê**. Navê te çiye? **Şevger**.

Dı daneka celêbên hevokanda bı drêjayi dê dabaşa hevokan bête krın. Jıber vê yekê lı vır nayê drêj krın.

PEYV

9. Peyv: Peyv ewın ku lı dû hev rêz dıbin û hevokan tının hmatê. Dı daneka hevokanda (lı mjara 8 ê bînêrın) peyvên têgıhdar û wezifedar hatıbûn dabaş krın. Peyv bı van taybetiyên xwe dıbin du celeb:

1- Peyvên têgıhdar

2- Peyvên wezifedar

1- Peyvên têgıhdar bı serê xwe xwedi têgıhên taybetine, gava dabaş jı wan tê krın têgıha wan yanji drûva wan tene zanin û bı

têgihên xwe dıkevıne nav hevokan. Mina:

bajar, dbıstan, xani, zevi, parêz, pêşmerge
rabûn, rûniştın, çûn, hatın, bezin, revin
hış, hdam, giyan, can, hêz ageh, rınd, sık

2- Peyvên wezifedar bı serê xwe bê têgihên taybetine, gava da-
baş ji wan tê krın têgih û drûvên wan nayên zanin. Ev celebên pey-
van bı wezifên xwe dıkevıne nav hevokan. Mina:

mina, wek, qas, qasi, weki, disa, heke, bla, eger.
Jı, jıber, bo, jıbo, ji, dı, bı, lı, wlo, wsa.

Gava qas bête gotın jê tu nayê fehm krın lê gava qasi mın bête
gotın têgih dıgire û tê fam krın. Ev celebên peyvan bı wezifên xwe
dıkevıne nav hevokan û têgihê gorê wezifên xwe dıgırın û hevokan
dixemılın.

Herdu celebên peyvan ji ya ji kitek yan ji ji kitek zêde pêktên.

Ew gotınên têgihdar yan ji wezifedar ji kitek yan ji ji kitek zêde
pêktên ku hevokan tinın hmatê ji wanra peyv tê gotın.

KÎTE

10. Kite ewın ku ji dengêk yan ji ji dengêk zêde bı dev vekırı-
nek û yek car ji dev derdıkevın û yek teni yan ji çend lbek dıdın pê
hev peyvan tinın hmatê. Bı ewayek dın: Dı peyvekda çend dengdêr
hene ew qas kitene.

Dı zmanê meda yanzdeh celeb kite hene. Dı kitanda ji yeki heta
şesşan tip peyda dıbin. Mina:

- | | | |
|--|---|--------------|
| 1- bı dengdêrek | : | a, e |
| 2- bı dengdêrek û bêdengêk | : | av, ev |
| 3- bı dengdêrek û du bêdengın | : | ard, erd |
| 4- bı bêdengêk û dengdêrek | : | ba, bi |
| 5- bı bêdengêk, dengdêrek û bêdengêk | : | dar, dêr |
| 6- bı bêdengêk dengdêrek û du bêdengın | : | kuşt, şuşt |
| 7- bı du bêdengın û dengdêrek | : | spi, bra |
| 8- bı du bêdengın dengdêrek û bêdengêk | : | stûr, stûn |
| 9- bı du bêdengın dengdêrek û du bêdengın | : | stêrk, şkest |
| 10- bı sê bêdengın dengdêrek û bêdengêk | : | strik, stran |
| 11- bı sê bêdengın dengdêrek û du bêdengın | : | strand |

DENG

11. Deng: Deng ewin ku bî bêhn dan û standinê jî kûraya gew-riyê, jî arika dev, jî navber herdulêvan, jî bnê zmên, jî dfinê, jî serê zmên û pîştâ dranên jorin û êd. derdikevin û yek teni ya jî çend lbek dîgihîn hev kitek tinin hmatê.

Dî zmananda gelek deng hene. Dî zmanekda çqas deng hındîk bîn jî disa dervazê çîlî dîbîn. Dî hinde zmananda hejmara dengan heta sedan jî radîbîn.

Heke jî her dengekra tîpek hatîba danin, hejmara tîpan pîr dîbûn û hin bûn gelek zor dîbû. Jîber vê yekê elfabenivîsan, ew dengên nîzîkên hev anîne cem hev lî tîpek grêdane. Paşî dî nav herîkîna mêjoyêda deng û peyv hatîne traştin lî tîpan hatîne.

Dî zmanê meda jî gelek deng dîxwiyên. Hemîne ku jîbo her dengekî tîpek ne hatiye danin. Dîvê qenc bête zanin ku ew dengên dîxwiyên dî nav demên bêda dê hnek jî wan wînda bîbîn, yan jî dê bîterîşîn lî tîpan bîn.

Jîber vê yekê elfabeya Celadet Bedîrxan û Kamran Bedîrxan (ya kovara Hewarê) bê guhertin dîvê bête pejîrandîn. Em jî elfabeya wan camêran dîpejîrinin. Bî teni hîndek dengên grîng hene, jîbo çawan nîvisandîna wan emê ponîjinê bîdîn dîyar krîn (lî mîjara 15 an bîncîrîn), dervaz bîbîn û gotîna paşî jî aqedemiyêra bîhêlîn. Yek jî jîbo bî hêsanî xwendîna xwendevanên welatê me emê lî ser "î" nqut danin û "î" jî bê nqut bîdîn dîyar krîn.

işareta dengan tîpîn û jîbo gişk tîpanra elfabe tê gotîn.

Dî elfabeya meda siy û yek (31) tîp hene û pevdakek jî hatiye pejîrandîn.

Tip, gorê destnîvis û çapnîvis dîbîn du deste û gorê tîpên gîr û hûr jî du destene

Ger dê hebûya me jî xwedanek

ali keremek letifedanek

ilm û huner û kemal û izan

şîir û xezel û kîtab û diwan

Ev cîns bîba lî ba wî memûl

Ev neqdî bîba lî nîk wî meqbûl

(Ehmedê Xanî)

WANE III

ELFABE

12. Grek (tipên gir) ên çapê:

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W
X Y Z

Hûrek yê çapê:

a b c ç d e ê f g h i j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Grekên destnîvis:

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V
W X Y Z

Hûrekên destnîvis:

a b c ç d e ê f g h i j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

DENG DÊR Û BÊDENG

13. Du celeb tip hene:

1- Dengdêr

2- Bêdeng

1- Dengdêr: Dengdêr ewin ku li rêya danganra bi serê xwe û bê arikariya tipên din bi hêsani derdikevin.

D1 elfabeya meda heşt dengdêr hene:

A E Ê I Î O U Û

a e ê i î o u û

J1 van tipan ji a ê i o û drêjin. e î u kurtin

Â- Drêje, Mina : Ala, afîr, agîr, av, ava, arhan

Ê- Drêje, Mina: Êzing, êvar, êriş, êdi êl, êş

Î- Drêje, Mina : Îsot, îsal, îşev, îro, înca, îza

O- Drêje, Mina : Ol, olî, obe, ofîs, orin, oremar

Û- Drêje, Mina : Dûr, Kûr, bûn, cû, zû, rû, rabûn

E- Kurte, Mina : Ez, em, erzan, enîr, elem, evin

U- Kurte, Mina : Kurd, kurmanc, kur, dur, ku, kurt

1- Kurte, Mina: Bîn, dîn, kîr, şîl, kîn, jîn, dî

2- Bêdeng: Tipên bêdeng ewin ku lî rêya danganra bî serê xwe bê dengdêrek dernakevin. Jiber vê yekê ji wanra bêdeng tê gotin.

D1 elfabeya meda bistûsê bêdeng hatine pejirandin:

B C Ç D F G H J K L M N P Q R S Ş T V W X Y Z

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Bêdeng hnek jê nermîn û hnek ji hîşkîn. Yê hîşk nehî nermî ji çardehîn.

Tipên hîşk: Ç F K P Q S Ş T X

Tipên nermî: B C D G H J L M N R V W Y Z

Ç- Hîşke, Mina : Çar, çat, çit, çeleng, çend, çem

F- Hîşke, Mina : Felek, felat, fedi, fêlbaz, fîr

K- Hîşke, Mina : Karker, kêm, kes, kîrî, ket, kovar

P- Hîşke, Mina : Pal, pînde, pêl, pey, pûngal, pîr

Q- Hîşke, Mina : Qad, qal, qayoc, qemer, qelûn, qas

S- Hîşke, Mina : Sîr, sîm, sêv, sal, sehok, serma

Ş- Hîşke, Mina : Şîl, şûm, şahî, şîn, şeletan, şêr

T- Hîşke, Mina : Ta, tar, tax, tqên, tore, tving

X- Hîşke, Mina : xîşt, xal, xaf, xezal, xem, xêr

B- Nermî, Mina : Ba, baran, balî, ber, bed, bes

C- Nermî, Mina : cal, car, cem, cîndî, cêr, cot

D- Nermî, Mina : Dar, dem, dêr, dev, dep, das

G- Nerme, Mina : ga, gel, geli, ger, gerden, gez
H- Nerme, Mina : Hêk, hêl, hej, haf, him, hêle
J- Nerme, Mina : Jar, jêr, jor, jin, jan, jin, ji
L- Nerme, Mina : Lehêf, lêv, lva, lûle, lehi, li
M- Nerme, Mina : Mak, mar, mêr, mehin, mûri, min
N- Nerme, Mina : Nerim, nêr, nir, nok, nan, neyar
R- Nerme, Mina : Radan, razan, rev, rmêl, rabûn
V- Nerme, Mina : Vala, vedan, vêl, vir, vêca, vi
W- Nerme, Mina : Welat, wan, we, wira, weki, wre
Y- Nerme, Mina : yar, yari, yek, yeqin, ya, yani
Z- Nerme, Mina : Zan, zanin, zevi, zelal, zêr, zik

PEVDAK

14. Pevdak: Ew denga ji du tipan tê hmatê jêra pevdak tê gotin. Dî elfabeya meda pevdakek hatiye pejirandin. Ew ji eve: xw Mina: xweda, xwedi, xweyi, xwendin, xwarin, xwil, xwin, xwê, xwe

NVISANDINA WAN DENGÊN BÊ TÎP

15. Dengên bê tip: Her kurdizaneke dîzane ku dî zmanê mede hê çar dengên gring ji hene:

- A- Lî navbera "C" û "Ç" yê. Mina: Ç ya Çêlek, çem, çal
- B- lî navbera "D" û "T" yê. Mina: t ya tu, tewandin, teng, tir
- C- Lî navbera "B" û "P" yê. Mina: p ya par, pêr, pê, pênc
- D- lî navbera "G" û "K" ye. Mina: k ya kew, keko, keç, kêr

Ev dengên han ne b c d g û ne ji ç k p t yê xwerûne lê divê ev deng bi tipên hîşk yanî bi ç k p t yê bên nvisandin. Mina: çêlek, kew, par, teng...

NVISANDINA WAN DENGÊN KU PEVDAK TÊDA DIXWIYÊN

Jî bil pevdaka (xw) ku hati pejirandin her weki ku sê pevdakên din ji dî zmanê hene: A - GW, B - KW, C - QW. Gwîrmêna tvin-

gan, kwirika mehinê, qwirmê darê û êd. Gava ev deng bixwiyên divê bî tipa "u" bêne nvisandin. mina: gurmina tvingan, kurika mehinê, qurmê darê...

DENGÊN VEŞARTÎ

Her weki dî zmanê meda du dengên veşarti ji hene: "R" ya stûr "L" ya stûr. Mina: Ber, por, hıç, per, pertal, frin û palas, paldim, lep, fle, tolaz, pling... Ev jî dê bî "R, L" yê edetî bêne nvisandin.

Balakêş: hinde mrof hinde îşaretan lî ser van dengan datinî lê ez wan îşaretan çewt dîbinim.

DI DEVDA BÊLAV BÛNA DENGAN

Lêvi	:	B F M P V
Drani	:	D R S T Z
Dfini	:	N
Bnê zmên	:	C Ç Ş J
Arika devi	:	G K Y
Gewri	:	H Q X
Nivê zmanî	:	L
Dev û lêvi	:	W

RASNIVÎS NVÎSANDINA TÎPÊN GIR

16. A- Tipên serê hevokan.

B- Tipa serê bernavk û navên xweser. Jîbo balakêşanê carna bernav gişk bî tipên gir têne nvisandin.

C- Tipa serê sernivîsan, carna jî sernivîs gişk bî tipên gir têne nvisandin.

D- Tipên lewhe û reklaman carna gişk tipên grî

E- Tipa serê navê pirtûk, kovar û rojnaman, carna jî ev nav gişk tipên gir têne nvisandin.

F- Jîbo balakêşanê carna ew nav, peyv û hevokên grîng ku dî

nav metnekida dervaz dıbin gişk bı tipên gır têne nvisandin.

TİPÊN KELIJANDINÊ

17. Dı zmanê meda du dengdêr lı pê hev dı kitek û peyvekda nayên, lê hinde peyv bı dengdêrê dıqedın û hinde qertaf ji bı dengdêrê dest pê dıkn, dı vê tentêlêda tipa kelijandinê dıxwaze. Tipa kelijandinê "w, y" ye. Mina:

Dara Darayê Kurd,	hatıbûya,	hatıbûwa
Zana zanayên me,	çûbûya,	çûbûwa

Carna "h" ji dibe tipa kelijandinê. Mina:

zehfahi, hındıkahi dı şûna zehfayi, hındıkayida

Eger lêker bı dengdêrê destpê bıke, pêşdaçekên lêkervegir dıkarın dengdêrên xwe bavêjn û bédeng xwe lêkerve dayne. Mina: ajot bıajo bajo, avêtın avêt bıavêj bavêj, inandin inand dıine tıne.

Balakêş: Dı herikina rêzımênda dê ci û ci dabaş ji van bûyeran (tipên kelijandinê û tip avêtın) bête krın. Jıber vê yekê lı vir wekok pır ne hatıne dan.

DI SERÊ PEYVANDA BİKARANINA TİPA "I"

Heke peyv pır kite be pışti bédenga duwem dengdêrek hebit, lı navber herdu bédengên serê peyvê tipa "ı" nayê danin. Mina:

Dran, zman, krın, bıvır

Dıran, zıman, kırın, bıvır çewte

Herçıqa lêkera krın û yên mina wê, gava yek kite be tipa "ı" tê bıkarandin ji disa qayda me naherıfe. Mina:

Krın kır, bıvır bıvır, ktek kıt, kna delal kın

Pzo bédenga duwem ji bédenga yekem be, lı navbera her duwan danina tipa "ı" peywıste. Mina:

Çıçık, dıdan, zızê, sısê, jıjan, dıdo

Gava peyv yek kite be yan ji pışti bédenga duwem bédengek hebit lı pê bédenga pêşi tipa "ı" tê bıkarandin. Mina:

Dın, mı, jin, cın, çır, pır

sîst, xîst, cîrf, tîrs, pîrs, nîft
 tîftik, tîrpan, xîstîn, mîştîn
 Pzo çend peyvek jî vê qaydê cda hene. Mina:
 stran, strand, strik
 Balakêş: Dî hîlbeste û weznanda ev qayde pêkneyê jî dibe

KETINA TÎPAN

Hinde peyvên pîr kite ku bi bêdengek dîqedîn û dengdêra kita dawî jî "î" ye. Mina:

Tevîn, kavîr, remîl, reşîk, kevîn

Ev celebên peyvan gava bi serê xwe bêne bikaranîn, çawan li jorin dîxwîyê wîsan dimînin. Yanî tu tip jî wan nakevîn û gava qertafekê yan jî peyvekê bêdeng destpê kirî jî bi wanve girtî disa tu tip jî wan nakevîn. Mina:

Tevînkîr, kavîrkîr, remîldar, dî kevînda
 reşîksaz, kevînfîroş, gerîmxane, kavîrve

Gava qertafekê bi dengdêrê destpê kirî bi wan celebên peyvanve girtî, hînga "î" dîkeve. Mina:

Tevna Durê, kevrê diwêr, remla remîldar
 Reşka Reşo, kevneguhez, germa havînê

Dî rasnîvisa kurmancîda dubare tip tune, yanî dî peyvek Kurmancîda du tipên jî hev nayên ba hev. Pzo peyvên hevedudanî, tipa dawîya peyva pêşî û tipa pêşî ya qertaf û peyva dawî jî hev (dubare) dîbîn. Dema wlo be, tipa dawîya peyva pêşî dîkeve û paşî pêve dîgîrîn. Mina:

sîst-tîr	sîstîr,	paş-şîv	paşîv
tving-gîr	tvingîr,	find-dang	findang
Çav-vekîrî	çavekîrî,	dî gund-da	dî gunda
hev-ve	heve,	dî vîr-ra	dî vîra...

Tipên têvel yê jî cîhderkekê yan jî jî cîhderkên nîzîkên hev, dî peyvekda li cem hev nayên. Eger dî peyvên heyedudanîda li cem hev bîn tipa dawîya peyva pêşî dîkeve. Mina:

Dest-dîrêj	desdîrêj
tving-kîr	tvînkîr
blînd-tîr	Blîntîr

tnaz-saz
bab-pir

tnasaz
bapir

Heke tipa dubare, tipên cihderkek û tipên cihderkên nîzîkên hev dî du peyvên jî hev cda nvisandida rastê hev bîn, herçiqas neyne xwendin jî têne nvisandin. Tipa dawîya peyva pêşî nayê xwendin. Mina:

Nvisandin

xwendin

find dani

fin dani

jî serhîng kri

jî serhîn kri

ez jê hatim

e jê hatim

şêst dep

şêş dep

Ew peyvên pîr kite yê bî dengdêra "î, û" yê bîqedin û "y" ya kelîjandinê jî bigirin, herçîqa carna nayne xwendin jî lê têne nvisandin. Mina:

Peyv

Nvisandin

xwendin1

xwendin2

Serî

seriyan

seriyan

seryan

kerî

keriyan

keriyan

keryan

derî

deriyan

deriyan

deryan

mali

maliyan

maliyan

malyan

barî

bariye

bariye

barye

çarsû

çarsûya me

çarsûya me

çarsya me

xesû

xesûya te

xesûya te

xesya te

LI HEV CÎ GUHERTINA TÎPAN

V F carna cî dîdîn hev

Mrov mrof, hevt heft, hevsar hefsar

v b carna cî dîdîn hev

bav bab, xoşav xoşab, gulav gulab

z s carna cî dîdîn hev

gez gest, parast bîparêz, leyz leyist

j z carna cî dîdîn hev

jîrek zîrek, lîmêj lîmêz, zeng jeng

Ev cî guhertina tîpan ne pîr frehe. Yani heryek dî çend peyvanda têne hmatê.

CÎ GUHERTINA TÎPA KURT Û DRÊJ

CARNA DENGDEIRA kurt dikare ciyê xwe bide dengdêra drêj:

Gava lî nivhend yan jî lî dawiya hinde peyvan "h" hebe, ew "h" dikare bikeve û dengdêra kurt ciyê xwe bide dengdêra drêjê jî zayendê xwe. Yani "E" ciye xwe bide "A" yê, "î" ciyê xwe bide "Î" yê, "U" ciyê xwe bide "O" yan jî "Û" yê. Mina:

Çhv çav, sıh sı, Buhtan Botan, rih ri,
Cih ci, xwehr xwar, xwih xwi, trih tri
Cuh co cû, duht dot, sehkirin sakirin...

Bî awerteyî carna peyva duht tîpa "T" tavêje "H" dîmine û disa tîpa kurt ciyê xwe dide ya drêj. Dî vê tentêlêda duht dibe doh, duhtmam dibe dohmam.

Peyva "xwehr" û "guh" neyne guhertin çêtire, lewra têgihên din jî wan derdikevin. Yani çî peyva têgihêk din jê derkevit ne guhertin çêtire.

Balakêş: ev qaydê han ne devoke, herçîqa hinde herêm guherti û hinde jî neguherti bikartin jî.

CELEBÊN PEYVAN

18. Herwekî dî daneka hevokanda jî (lî mjara 8 an binêrîn) hatibû dabaş krîn ku em alaziyên xwe bî hevokan dîdîn diyar krîn. Hevok jî jî peyvan tene hmatê

Peyv gorê têgih û wezifên xwe heşt celebîn. Mina:

Têgihdar: Nav, cinavk, rengdêr, lêker, hoker

Wêzifedar: Daçek, grêk (ghanek), baneşan

Nav: Navê heyberanîn: Kurd, Kurdistan, Çiya, Reşo, Zerif, gel, pale.

Cinavk: Ciyê navan dîgîrîn: Ez, tu, ew, Em, hûn, ew, min, te, wî, wê, me, we, wan, ev vî, vê, hnek, hindek

Rengdêr: Çawani, çendani bî îşaret û êd. heyinan dînimîn:

Hespê reş, burjuvayên xêşim, karkerên zana

Ev tving, deh pêşmerge, keça şoreşker...

Lêker: Krın yan ji bûyinên heyinan dîdın diyar krın:

Dikene, dike, rabû, vezela, av da

Mêre, rinde, dewlemendbû, başım

Hoker: Hoker têne pêşiya lêkeran bzava wan dî nav dem, ciyan-da û bî çawani drûvên bzava lêkeran dîdın diyar krın: Duhu hatım, baş hatım...

Grêk: Peyvan û hevokan bî heve grê dîdın: Ez û tu, hım gel hım karker...

Baneşan: Kovan, şahî dîlxweşî û êd. Bî dangan dînimin:

Ax ew ne hat, ox ez sax bûm, xweş dlê mın rehet bû...

Daçek: Dikevine pêşî peyvan û nav hevokan rewş dîdın têgih û herikina wan: bî mınra, ez lî malê bûm, tu jî kû tê?

PARÇEK XWENDINÊ. NAME

Dêrsım

7.2.1978

19. Brayê hêjayê delal Dara!

Roja em jî hev qetane heta nha ez dî kovana dituna tedame. Ew peyivînên dîl germî, gumanên pêşverû û zelaliya birobaweriya te gava bira mın dikeve tu têy pêş çavên mın û nîkarım xwe ragırım lê dema şîreta te (rojên bê yên mene) tê bira mı dlê mın hênîk dibe.

Pîştî çûwina te mın jî xwera hinde heval û hogır û hevri peyda krın, heke ciyê te negırın jî lê gelek kêra mın tîn. Em bî hevra pirtûkên pêşverû seminer dîkın. Jî têkoşerê gelên bîndest daxêvın û dî bî ronahiya birobaweriya karkeranda bî alî gelê xweve dîçın. Gel jî wek xwe ne maye. Şiyar pır zêde bûne û jî berî zêdetır kêfa xwe jî mera tîn, bî weş bî alî meve tîn.

Çawan ku tu dîzani dî Dêrsımêda hejmara gurên rûnîştvanî hîndîkın. Hê jî ne guherîye û wsan dîzanım ku naguhêre jî. Her çiqas nokerên burjuwayî bî nîjadperestî dîxebîtın ku hinde hevalbendan jî xwera çêkın lê ew hêmana dî gelê meda heyi xwe dîparêze. Bî tenî hnek dede, axa, serekeşîr û burjuwayên şolyekvan hevalbendê wan. Ev beşa rengmîrov jî dî nav gelda bê rûmetın.

Dbistana me yek dane. Jiber vê yekê dana sbê ez dîçim xebatê û heta nivro xebatek gran dîkîm. Dana êvarê dîçim dbîstanê, şevê jî heta dreng dîgel hevalan em pirtûkên zanîstî dîxwîn.

Aboriya me disa ne başe. Çawa tu dîzani ku axê gişk zewiyên me vegirtû û me jî lî dadgê doz vekirû. Bervedarê me bî hemî hêza xwe lê dîxebite lê hê jî biryar ne standîye. Heke dadvan lî alî me biryar bide, dê tentêl û aboriya me qenc bibe.

Gelo tu çawani? Tu hewiya xwe bî çî tîni? Wane û xebatên te çawanî? Jî wan hevalên kevî qe name dîstîni? Hevalên te yê nû hene? Bersiv dana van pîrsan daxwaza mîne. Hêvidarîm ku dê tu tengasiyên te tunebî. Herçîqa dî sazîmana sermayedarîda, jî refa perçîqî û gelên bîndestra dîlxweşî, bê tengasî, jîna hêsanî û berxwîdari nayê hîrandî jî lê disa wan xwestînen jorî dîdîm dîyar krî.

Kîfletê mala me û we gişk başî. Jîbo xem krîne hêç bûyerên grîng tune. Bî tenî em dî keser û kovana tedane. Ez gumanîm ku dî demek nîzîkda ew jî pêkbê.

Slav û evînen xwe yêndîlgerîm jî tera pêşkêş dîkîm. Pîştî hîmbêz krîne çavên te radîmûsîm.

Serdar Çiya

WANE IV

NAV

Kovana egiteki

20. Dema ku rperîpa hespên Kurdên mêrxas lî ser gora minra dê bîborin û dengê tving û topan, bombe û balafîran dê bên, ezê bî çekên xweve jî gora xwe hlavêjim, jî bona serbest krîna welatê xwe, jî bona azadi krîna welatê xwe.

(Kamran Bedîrxan)

Ev nvisan kovana egiteki dîde diyar krîn.

Vekîrîn:

Nav û celebên navan: A- dî nvisîna jorînda hesp, gor, tving, bombe û balafîr dîborîn, heryek jî wan peyvan navên curekî. Dema hesp bête gotin curê hespan, tving û balafîr curê tving û balafîran tête hşê mrovan.

B- Peyva Kurd dibore, ev peyv navekî xwesere û taybetiyê neteweyekê ku jî wî neteweyera hatiye dan, dema navê Kurd yan jî navekî wekî wî Kurmanc, Reşo, Zerîf, Fêrîs, Tetwan, Diyarbekîr, Frît, Dîcle û êd. Bête dabaş krîn ew heyînên ku ew nav lê hati krîn tene hşê mro.

C- Peyva mêrxasî, serbestî û azadî jî dîborîn, belê ev peyv jî navîn lê ne jî navên wan heyînên bî dest tene girtin û bu çav tene dî-

tinêyin. Dî navber van navan û navên wan heyinên jorinda ferqên gring hene. Lewra herdemek ew heyinên jorin Kurd, top, tving, hesp, balafir, reşo û êd. bî çav têne ditin û bîdest têne girtin lê mêrxasi, serbesti û azadi pzo mro bî hiş û hdamê xwe dikare bî-nase.

Ew peyvê ku heyin pê têne nasin heke candar û heke bê can, heke heyberi û heke menewî, heke bî hiş û heke bê hiş, jî wanra NAV tê gotin.

Pêşi nav dîbin du bir

A- Navên heyberi

B- Navên meni

A- Navên heyberi

Mrov, mêt, jin, keç, kur, met

Heywan, hesp, mehin, canî, berx

dar, kevîr, çiya, deşt, zevî

Rojname, kovar, pirtûk, pel

B- Navên meni

Hiş, hdam, beng, rûmet, şahî

Xew, deng, can, azadi xem, kêf

Xweşi, nexweşi, zindeyi, êd.

Heke kurt jî be carek dîn jî emê bêne ser vekit û dane nasina hinde curê navan.

BRÊN NAVAN

21. Du rewşên navan hene:

1- Candar

2- Bê can

1- Candar: İnsan, heywan, pez, dewar, mel, kew, kevok, şêr

2- Bê can: Dinya, welat, çiya, zevî, dar, kevîr, ax, sêle

Gorê nav lê krînê nav dibe du bir

A- Navê curedar

B- Navê xweser

A- Navê curedar: Navê curedar ewin ku jî eyî curê pîr heyin hene. Mina:

Dar, kevır, şêr, pling, ga, çêlek, hesp, hêstır
Çawan dı benda 20 an da ji hatûbû gotin ku dema mro şêr bîbêje
curê şêran, pling bîbêje curê plingan tê ber çavan, jiber vê yekê ji
wanra navê cûredar tê gotin.

B- Navê xweser: Navê xweser ewe ku ji heyinekra bî taybetî
hatîye dan û gava ew nav bête gotin, ew heyin bî serê xwe tê ber
çavan. Mina:

Mirza, Xecê, Hîşyar, Dîjwar, Diyarbekır, Rha, Muş
Feqeyê Teyran, Ehmedê Xani, Melayê Czirî, Ehmedê Ba-
teyî

Navê mirovan xweserîn:

Fêris, Kerevan, Azad, Rojhat, Guldani, Gulrêz, Fatê

Bernavk xweserîn: Berzan, Xweşnav, Melekan, Dîlbırîn, Şevk-
ar, Pola

Navên corafî yê taybetî xweserîn:

Sipan, Nemrût, Agirî, Rehwa, Codi, Dicle, Gola Wanê

Navê bajar û gundan xweserîn:

Diyarbekır, Xwarpêt, Farqîn, Sêgıran, Axxis, Avetax

Navên pirtûk, kovar û rojname xweserîn:

Şerefname, Mem û Zîn, Hewar, Jin, Hetawê kurd, Rîzgari

Navê heywanan jî yê xwser hene:

Çavreş, Xezal, Gurzo, Ebleq, Şinboz, Rexşê belek

Navên netewan xweserîn:

Kurd, Tirk, Ereb, Îngilis, Urîs, Hûnan, Çerkez, Çîn

Bî kurtasi çî navekî taybetî lî çî heyinekî hatibe danîn gişk
xweserîn û tipa serê navê xweser jî greke (tipa gre).

MÊJER

Nav gorê hejmaran dîbîn du beş:

A- Yekani

B- prani

22. A- Yekani: Ew navên heyinekî û kesekî nişan dide yekanine
û jî wanra yekani tê gotin. Şxwe ew dabaşên jorîn gişk yekanînin û
hinde wekokên nû jî bîdîn: Suxte, qutabî, şagirt, karker, pêşmerge,

zaro, şvan.

23. Prani: Ew peyvên ji yeki zêde heyinan û kesan dînimine jêra prani tê gotin. Praniya tam li dawîya peyvanve (navdêranve) qertifandîna qertafa "an" pêktê. Mina: Suxtan, şagirtan, karkeran, pêşmergan, cotyaran.

Gava ji yek mêjerê gelek nav bîdî dî hev yê dawî bî tenî ji bête prani krîn dibe. Mina: Şagirt, karker, pêşmerge, suxte, û cotyaran.

Navên curedar gişk tên prani krîn lê navên xweser di van tentêlên jêrînda tên prani krîn:

Gava ew kes û yên mina wan bêne nişan dan:

Reşoyan, Azadan, Zerifan, Dilvinan şerê azadî krîn.

Diroka Kurdan bî ehmedê Xaniyan, bî Selahedinê Eyubîyan, bî rîstemê Zalan tê xemilandin (Kemal Badîllî).

Yanî bî van kesan û bî yên mina wan şerê azadî hate krîn û diroka Kurdan hate xemilandin.

Gava malbat (xanedan) bêne nişan dan:

Bedîrxanan, Berzaniyan, Eyubîyan, Merwaniyan.

Gava navên eşîran bêne nişan dan:

Hesenan, Heyderan, Bekîran, Alîkan, Cîbran, Sloqan.

Gava navên netewan bêne nişan dan:

Kurdan, Tîrkan, Ereban, Çerkezan, Gurciyan, Farîsan.

24. Di navanda Pêkhatîna yekani û prani:

Yekani: Yekani bê qaydene, şxwe heyin û kes di tentêlên xwe yên rûda gişk yekanine. Gava mro bîbêje keç, kur, hesp, mehin, dar, kevîr, dest, pê heryek ji van kesek, heyinek û heyberek dînimine. Bî tenî jibo xwerû îfade krîna yek li bî qertafa "ek" bî dawîya navanve tê qertifandin û têgîha yek li bî dîde. Wekok:

Di şûna yek hesp hespek, yek mehin mehinek

yek pirtûk pirtûkek, yek tving tvingek

Di daneka nekîfşîda qaydê qertafa "ek" dê bête danîn. Lewra ev qertaf qertafa nekîfşîye jî. (Lî mjara 28 an binêrîn) Jî ber vê yekê livîr zêde nayê drêj krîn.

Prani: Pênc celeb prani heye:

A- Bî qertafa "an" praniya tam û kifşe

B- B1 qertafa "na" praniya hındık û nekıfşe

C- B1 qertafa "ên, êd, êt" praniya tam û kıfşe ya qedinekê

Ç- B1 qertafa "ne, nê" praniya hındık û nekıfşe ya qedinekê

D- B1 lêkeran prani

Ey dıl lı qraxê çemê Amed rûne ser derdan

Rınd çavên xwe veke, temaşe ke welatê Kurdistan

Lı bajarê Amed çkandine çend sêpê

B1 wanve dalıqandine cındiyên Zazan

(Cigerxwin)

Praniya qedinekê dı daneka qedinekanda (lı mjara 37 an bınêrın), praniya b1 lêkeran dı daneka cinavk û lêkeranda (lı dane-ka 47 û 125 an bîrênın) dê bêne dabaş krın. Jı ber vê yekê lı vır nayêne vekıtandın.

25. A- PRANÎYA tam: Çawan dı mjara bistûsisêyanda hatıbu dabaş krın ku qertafa "an" b1 dawıya navên yekanive têne qertıfandın û yakaniyê dıke prani. Mina:

Mêr mêran, jin jnan, keç keçan, kur kuran, şêr şêran.

Navdêrên b1 dengdêran bıqedın "y"ya kelıjandınê dı navber navdêr û qertafa pranida tê danin. Mina:

xatıyan, brazıyan, cûyan, xesûyan, xwarziyan

Heke dengdêra navdêrê "a,e" bın ciyê xwe bıdine dengdêra qertafê çêtire, dı vê tentêlêda "y" ya kelıjandınê naxwazc. Mina:

Masan, zerdelan, melan, axan, palan, çran, lemban

Dı peyivınêda carna "n" ya qertafa prani têxın bı teni "a" dımıne û herweki prani tê kêşan. Mina:

Daran dara, hespan hespa, keçan keça, xortan xorta

Lê dı nvisandınêda gelek neyê êxıstın

B- PRANÎYA HINDIK

26. Praniya hındık: Qertefa "na" b1 dawıya navdêrên yekanive tê danin û praniya hındık tê hmatê. Jı praniya tam hındıktır yan jı beşek jı praniya tam (lı 38 an bınêrın). Mina:

Pêşmergena, mrovna, darnâ, tvingna, pezna

Dema bête gotin ku min nan da pêşmergena, min mrovna dit û
min darnâ ani yanî min nan da hinde pêşmergan, hinde mrov dit û
hinde dar ani, ne gişk ne ji lbek.

Dema gelek nav bîdîn pê hev, bî tenî yê dawî bête prani krîn
dibe û yê dîn jî pêra prani dibîn:

Hîrmî, gûz, gîndor, sêv û zebeşna bine

Mî, bîzîn, hesp, mehin, ga û çêlekna bîfiroş

Balakêş: Praniya hîndîk dî bînyata zmênda heye lê hinde ciyan
û lî hinde herêman hatîye jî bîr krîn. Jîber grîngiya wê dîvê jî nûve
bête vejandîn.

mala zêran xra dibe lê mala mêran xra nabe

Carna mro jî yarê diya xwera dîbê bavo

(gotîna mezînan)

WANE V

KIFŞI NEKIFŞIYA NAVAN KIFŞI

27. Dî zmanê meda heke navê yekani û heke navê praniya tam gişk kîşîne. Dema bête gotin hesp, hespan, hêsp bine, hespan bine, jî ali guhdar ve jî tê zanin ka kîja hespe û kîjan hespîn. Jiber vê yekê em li ser vi nasekînin.

NEKIFŞI

28. Nekîşî: Dîvê bête zanin ku dî nekîşîda zayend tune.

Nekîşîya yekani bî qertafa "ek" pêktê. Bî navanve danina qertafa "ek" nekîşîya yekaniya herdu zayendân (mê û nêr) tê hmatê. Mina:

Jîn jnek, mêr mêrek, qelem qelemek, mal malek
pîrûk pîrûkek, hesp hespek, mehin mehinek
Dar darek, kevîr kevîrek, tving tvingek, mar marek
Pencere pencerek, roj rojek, kovar kovarek

Dema bête gotin ku jnek, pîrûkek, tvingek û topek bine, yanî her kîjan jîn, pîrûk, tving û topek bine.

Navdêrên bî dengdêran biqedin "y" ya kelîjandîne li navbera

navdêr û qertafê tê danin. Mina:

Hirmi hirmiyek, deri deriyek, xani xaniyek

Masi masiyek, kursi kursiyek, sevi seviyek

Gava dengdêra navdêrê "a,e" bîn dengdêra qertafê "e" dîkare bî-
keve û bêdanga qertafê "k" xwe bî dengdêra navdêrêve dayne.

Mina:

Zerdelek, masek, sek gak, sobek, axak

Melak, çrak, lembek, kolek, rojnamek

Carna dengdêrên dîn ji bî vê qaydê pêktên. Mina:

Xesû xesûk, masi masik, zevi zevik, cû cûk

Kefî kefik, sêwi sêwik, bali balik, cani canik

Ev "ek" a qertafa nekîşî dî eynî gavêda qertafa yeklîbiye ji (lîd-
aneka 24 an bînerîn.) Mina:

Hespek, bzinêk, şêrek, darek

Yani yek hesp, yek bzin, yek şêr

Şxwe yek hesp, yek bzin, yek şêr hîndîk têne bîkaranîn.

Heke kîşî krîna zayendê peywîst be, bîqertafa "ek" ve qertafa
zayendê (jîbo zayenda mê "ê" jîbo Zayenda nêr "î") tê danin:

Hespek hespekî, mêrek, merêkî, kevîrek kevîrekî

Mehînek mehînekê, jnek jnekê, qelemek qelemekê

Nekîşîya prani: Nekîşîya prani bî qertafa "na" pêktê. Bî
navdêranve danîna vê qertafê praniya herdu zayendan tê hmatê:

Mêrnâ, jîna, qelemnâ, pirtûknâ, hespnâ, kevîrnâ.

Demâ bête gotin mêmna, jîna, qelemna, hespnâ, kevîrnâ bine.
Yani her kîjan mêmân, jînan, qeleman, pirtûkan tîni bine.

Ev "na" ya qertafa nekîşî dî eynî gavêda qertafa praniya hîndî-
kê ji.

ZAYEND

MÊ Û NÊR

Parçek ji hewarê

29. Hewar dengê zaninêye. Zanin xwe nasîne. Xwe nasîn, jî
mera rêya xebat, felat û xweşiyê vedîke. Herkesî ku xwe nas dîke,
dîkare xwe bîde nas krîn. Hewara me berî her dîştî heyîna zmanê

me dê bîde nas krîn. Lewma zman şertê heyinê ya pêşine.

(Celadet Bedîrxan)

Ev nîvisandîna jorîn; zanîn, xwe nasîn û grîngiya zmanê dîde diyar krîn.

Vekîrîn:

Zayend: Mê û nêr, di nîvisandîna jorînda "dengê zanîn, kesê ku, zmanê me, şertê heyinê"; yek ji "rêya xebat, Hewara me, heyîna zman, ya pêşîn" dervaz dîbîn. Qenc binêrîn ku di qedînekanda peyvan gîşk mîna hev qertaf ne girtine. Yani desta pêşî (dengê, kesê, zmanê, Şertê) "ê" û desta paşî ji (rêya, Hewara, heyîna) "a" yek girtine. Vaye ev "ê, a" qertafên veqetînekên zayendêne.

Dîvê neyê jî bir krîn ku zayend di yekaniya heye, dema bû prani radibe.

Di qedandîda veqetîneka zayendê jîbo yekaniya nêr "ê" jîbo yekaniya mê "a" ye. (L1 37 an binêrîn)

Hate zanîn ku di zmanê meda zayend (mê, nêr) heye, ew jî yan misoger zayendî. Mîna:

Nêr

Mêr, kur, law, hesp, ga, beran, nêrî, belındîr

Mê

Jîn, keç, duht, mehin, çêlek, mî, bîzîn, şîşek

yan jî Kurmancan wisan (zayend) pejîrandîne. Mîna:

Nêr

Derî, ban, xanî, kevîr, tevîr, tevşû, agir

Mê

Pencere, bermal, mal, ax, bêr, brek, av, qelem

LÎSTA HINDE ZAYENDAN

30. Nêr

Gîşk candarên nêr

Navên xweser yê candarên nêr

Navê rengdêrên hejmari yek ne têda

Reng, dema mîna nava bîne bîkaranî

Gîşk navên gewheran, hîlberiyên petrol û komîr ne têda

Gişk berkêşanên heywanan, hêk hri, lonk ne têda
Qût dexl û dgel hemi celeban û navên wan
Gişk navê meyweyên hışk
Navê celebên baqlan.

Ji bîl van ji gelek navên nêr hene. Ew ji yan mina vanên jorin
deste û destene. Yan ji lib û lib dî nav yê mêda peyda dibin.
Dî zmanê meda navên nêr ji yê mê hindiktir.

31. Mê:

Gişk candarên mê û navên wan yê xweser
Êwîrgê xani, seray, gund, bajar, axo, zozan ne têda
Av û navên wan çem, şet, delav, derya, Nil ne têda
Gişk navê pergalên neqliyê
Navên corafî, çiya geli, gîr, nîzar, beroj, glonte ne têda
Nexweşî û navên nexweşîyan, ta ne têda
Navên heyinên esmana û barinan, ba ne têda
Pergalên mîrbexê û navê xwerekên pehti, kevçî nan, goşt
ne têda
Pargalên goraniyê
Pût û celebên giyayên ku dibin pût jîbo heywanan ka,
giya, ceh ne têda
Navên pirtûk û pergalên nivisandî pêl, kaxîz ne têda
Gişk rader gava bî navani bîne bîkaranin
Nîft dgel berkêşanên xwe
Eşyayê navmal û bûroyan
Navê gulan
Navê tipan
Navên çekan gurz, şûr, metal, berik ne têda...

Bî kurtasi ew heyberên Kurmancan mê hejmartine mê û ewên
nêr hejmartine nêr.

32. Navdêrên wek hev: Navdêrên wek hev gorê zayendên xwe,
gava nêr be nêrane û gava mê be mêyane tene bîkaranin. Mina:

Mê

Mamosta min

Hostaya Reşo

Nêr

Mamostê min

Hostayê Reşo

Pêşmerga mî	Pêşmergê mî
Şêra kedi	Şêrê kedi
Kewa kûvi	kewê kûvi
Sereka êlê	Serekê êlê
Hevala mîn	Hevalê mîn
Pala jêhati	Palê jêhati
Karkera hêzdar	Karkerê hêzdar
Plinga kedi	Plingê kedi...

33. Karanina zayendê: Hinde candar gorê zayendê nav lê hatiye krîn. Mina ga, çêlek, mi, beran û hinde ji bî peyva "nêr, mê" zayend tê kîfş krîn. Mina berxê nêr, berxa mê, giskê nêr, giska mê. Peyva nêr û mê bêne pêşiya hinde navan ji dibe. Mina Maker, nêreker, mêkew, nêrekew.

Bî peyva dêl ji hinde mêyiti pêktên. Mina dêlese, dêlegur, dêleşêr.

Gava peyva mê, nêr, dêl bêne pêşiya navan divê nav bî wanve bêne danin û bibe wek peyvek...

34. Têgih guherin: Hinde nav gorê zayendan gava bête bîkaranin têgih (mena) dîguhere: Mala mîn, mal xani dgel navmalêye. Malê mîn, mal serwet hemiye. Kara mîn, kar, kar krîne yani dijê zîyanêye. Karê mîn, kar xebate. Rasta mîn, rast qade. Rastê mîn, rast rastê hev hatine (tîfîqin, tesadûf). Nava mîn, nav hundirîye. Navê mîn nav isme. Dengê mîn, deng pêjîne. Denga mîn, deng baliya eşyayêye yan ji pakêta mezîne...

VEQETANDEK (VEQETÎNEK)

35. Veqetandek: Veqetandek dîbêjine wan qertafên bî navdêranve tene danin û wan ji yên weki wan bî zayend û bî mêjer dîqetinin û dîdîn kîfş krîn. Mina a, ê, ên, êd, ne, nê... Divê bête zanin, dî gelek ciyanda ji veqetandekanra emê teni qertaf bîbêjin.

WANE VI

QEDINEK

36. Qedinek: Dema peyvek bî peyvek dîn hate kîfş, reng û terîf krîn, jêra qedinek, jî kîfşkîrîra qedandi, jî kîfşkera qedandek tê gotin.

Qedinekên me jî mîna qedinekên Hîndî-Avropa yê dîn, pêşî qedandi tê danîn. Mîna:

Zmanê me, deriyê xanî, pencera mezin, mêrê qenc
Havîna par, jîna hêsan, dara bî, zevîya çandî...

Qedinek, bî reng, terîf û kîfş krîna navdêrek bî navdêrek dîn pêktê. Mîna:

Pîrtûka Azad, tvinga Reşo, qelema mamoste, serê te
Barana payizê, danê êvarê, kuştîna koledar
Mrofê xwendinê, qelema nvisandinê, hespê reş...

QEDANDÎ

37. Qedandi: Gişk qedandi veqetandekarî dîgîrîn. Bî qedandive danîna veqetandekan qedandi xwe alî qedandekve dîtwînê.

Qertafên qedandiyê, jîbo yekaniya mê "a", jîbo yekaniya nêr "ê" jîbo praniya tam ya herdu zayendan yek jî "êd, ên, êt", jîbo praniya

hindik û nekîfîşi ya herdu zayendan yek ji "ne, nê" ye. Wekok:

Kurê Azad, keça Reşo, pirtûka mamoste, çqê darê

Kurêd Azad, keçên Reşo, pirtûkêt suxte, lûlên tvingê.

Keçne pêşmerge, karkerne şoreşker, kurne gemas

Tvingnê şoreşê, pêşmergnê Kurd, keçnê jêhati..

Veqetandeka "ne, nê" mina wanên din ji manendan tam kîfş nakin û naqetinin. Pzo xwar û jor kîfş dîke, yanî ji wan beşek û praniyê ji ji praniya tam kêmtir dînimine.

Dî peyivînêda carna bêdengên qertafa praniya tam yê qedandiyê (n, d, t) têxin, bî tenî "ê" dîmine. Dî vê tentêlêda kurên Fêris dibe kurê Fêris lê dî nvisandinêda dîvê neyê êxistin, lewma ji "ê" ya yekaniya nêr nayê nasin, yan ji zor tê nasin.

Dema peyvek bî gelek peyvan bête tarif, reng û kîfş krîn, her yek gorê zayenda xwe veqetandekên qedandiyê dîgîrîn. Mina:

Keça zeriya çavbelek

Keça Azadê Zerifa Reşo

Koledarê xwinmijê kedxwerê gelkuj

Dema gelek peyv bî peyvek bêne tarif, reng û kîfş krîn, gelege qertafa qedandiyê bî ya dawive tenî bêt danin. Dî vê tentêlêda mêjer yan ji zayenda peyva dawî çî be wê veqetandekê dîgîre. Wekok:

Kur û keçên şoreşker

Deri, pencere û banê dibistanê

Lûle, nişangeh, tetîk û sîrma tvingê

Dema qertafa qedandiyê cda hate danin him dibe cinavka peywendî û him ji têgihî dî guhere. Mina:

Kurê Reşoye. Kurê Reşoye

Keça Azade. Keça Azade

Tvinga mine. Tving ya mine

Pirtûkên Zerifêne. Pirtûk yê Zerifêne

Dema qedandî bî celebek navdêran hatibe kîfş, reng û tarif krîn û carek ji bî celebek navdêrên din tarif, reng û kîfş krînê bixwaze dî navber qedinek û navdêra nûda, gorê zayend û mêjerê yek ji cinavkên peywendî (a, ê, ên, ya, yê, yên) cda tê danin. Wekok:

Kurê min yê pçûk

Keça Reşo ya bedewa delal
 Diyarbekîra rengina mezîn ya Kurdan
 Gava navdêr bî dengdêrê bîqede "y" ya kelijandîne dîxwaze.
 Mina:
 Xwarziyê mîn, xatiya te
 Pêşmergeyên Kurdan
 Eger dengdêr "a, e" bîn ciyê xwe bîdîn dengdêra veqetîneka qedandiyê çêtûre. Mina:
 Pêşmergeⁿ Kurdan
 Masa melê, zerdela şêrin
 Hinde navdêr hene mîna mela, axa dengdêrên wan neyêne guhertin çêtûre.
 Cinavkên desta mîn nabîn qedandek. Mina:
 Mîna rînd, teya zer nabe
 Lê dîbîn qedandek, Mina:
 Rînda mîn, zera te
 Pirtûka wê, gîlka me
 Cinavkên desta ez nabîn qedandi. Mina:
 Reşoyê ez, hespê tu nabe
 Le bî hinde ewan dîbîn qedandi. Mina:
Eza rînd, tûyê qenc, ewa delal
 Cinavkên desta ez bî cinavkên peywendî jî têne bikaranîn. Mîna:
 Ez yê teme, tu ya Reşoyî

NEKİFŞIYA QEDÎNEKAN

Nekîfşîya qedînekan bî vê ewayê jêrîn pêktê
 38. Qendandi nekîfşî: Gava Nekîfşî ya qedandîya yekani bî "ek" a nekîfşî û yekani û gava nekîfşîya qedandîya prani bî "ne, nê" ya praniya hîndîk û nekîfşî bî dawîya qedandîve têne danîn.
 Mina:

Hespek şoreşê, tvingek gernasî
 Depek derî, pêşmergek fermonde
 Hespnê şoreşê, tvingnê gernasî

Depne deri. Pêşmergne fermonde

Dı van qedinekanda şoreş, deri, fermonde tam gernasani ji bî curê xwe kîşîne. Hesp, dep, tving û pêşmerge nekîşîne. Teni destê pêşî tê zanin ku jî hespan hespek, jî tvingan tvingek, jî depê depek û jî pêşmergan pêşmergekinin. Dêstê paşî jî tê zanin ku jî hespan çend hespek jî tvingan çend tvingek jî depê çend depek û jî pêşmergan çend pêşmergekinin. Dêstê pêşî kîjanin, dêstê paşî jî kîjanin û hejmar çendî naye zanin. Jî ber vê yekê qedandi nekîşî tê gotin.

Qedandek nekîşî: Gava nekîşî ya qedandeka yekani bî "ek" a yekani û nekîşî, gava ya qedandeka prani bî "na" ya praniya hîndîk û nekîşî bî dawîya qedandekve tene danin. Mina:

Hespê şoreşek, tvinga gernasek

Depê deriyek, pêşmergên fermondek

Hespê şoreşna, tvinga gernasna

Depên derina, pêşmerge fermondena

Dı van qedinekanda jî berevajîve, hesp, tving, dep û pêşmerge kîşînin. Şoreş, gernas, deri û fermonde nekîşînin. Bî kurtasi dî daneka pêşîda jîbo qedandi çî hatîbî vekîtandin, dî vê danekêda jîbo qedandekêve jî. Jîber vê yekê qedandek nekîşî tê gotin.

Qedinek nekîşî: Jî herdu peyvên kêjan yekani bî qertafa yekani û nekîşî, kêjan prani bî qertafê prani û nekîşî bî wanve tene danin. Yanî qedandi jî qedandek jî qertafên nekîşî dîgîrin. Mina:

Hespek şoreşkê, tvingek gernasekî

Depnê derina, pêşmergne fermondena

Dı van qedinekanda hemî peyv jî nekîşînin. Teni rêza pêşî yekîbîya wan û ya dawî jî praniya wan û curên herdu destan jî tene zanin, Lê kîjan hespe yê kêjan şoreşêve, kêja tvinge ya kîja gernasîve, çend depî kîjan depî yê çend deryanî yanî yê kîjan deryanî, çend pêşmergene kîjan pêşmergene, yê çend fermondanî yanî jî yê kîjan fermondanî nayên zanin. Jîber vê yekê jî vê celebê qedinek nekîşî tê gotin.

Balakêş: Her çqas ev danaka dawî (qedineka nekîşî) hîndîk jî tete bîkaranî lê gelege dî rêzimanêda cî bigîrî.

QEDANDEK

39. Qedandek: Qedandek bî vê ewayê tê vekitandin.

Navên prani çî nêr çî mê "an" a qertafa praniya tam yan jî "na" ya qertafa praniya hındîk dıgırın. Mina:

Tvinga şoreşkeran, kincê mêmna

Pora jnan, darê sêvna

Navên mê çî cûredar çî xweser "ê" ya qertafa mêyanîyê dıgırın. Mina:

Kincê Zerifê, şîrê çêlekê, hriya miyê

Tvinga keçîkê, tava havînê, hêka mrişkê

Heke nav bî dengdêra "a, e" bîqedın herdu dengdêr dıkevın û "ê" ya qertaf ciyê wan jî dıgire. Mina:

Rengê masê, dara zerdelê, bermala odê

Navên nêr yên xweser, cinavk û rengdêrên çawani veqetandekan nagırın. Mina:

Mala azad, xaniyê mın, serê te

Pora reş, qelemma zrav, benê drêj

Navên nêr yên cûredar dî devoka Buhtida "î" ya veqetandeka nêrîniye dıgırın. Mina:

Zinê hespi, Serê beranî, kevîrê diwarî

Nîrê gayî, hriya hogîjî, rengê kaxezi

Navên nêr jî bî devoka Boti ku zehfayi jî eve, çî navê cûredar çî navên xweser bî vê ewayê jêrîn pêktê:

Ew navên "a, e" têda tunebın, qertafan nagırın û naguherın jî yanî wek xwe dîminın, heke "a, e" hebın disa qertafan nagırın lê yek jî wan "a, e" yan dibe "ê" Heke yek jî wanbe ew lib, du "a" bın "a" ya dawî, du "e" bın "e" ya dawî, "a, e" bın ya dawî dibe "ê".

Mina:

Ba bê, aş êş, hesp hêsp, xani xêni, derî dêri

Bajar bajêr, axa axê, kerem kerêm, xulam xulêm

Dengê bê, kefirê êş, zinê hêsp, banê xêni, depê dêri

Çemê bajêr, mala axê, mêrga kerêm, tvinga xulêm...

Dî devuka botida ew navên "ek" a qertafa nekîfşî û yek libî gır-tıbın gorê zayenda xwe nêr "î" mê "ê" jî dıgırın. Mina:

Zinê hespekî, gema mehinkê, hriya beranekî

Şirê bzinêkê, golka çêlekekê, sma gayekî

Vê ewayê navdêrên qedinekê xwe ali heve dîtewinin.

Balakêş: Pîştî qaydê guhertina "a, e" bi "ê" yê di zmênda ci bû, divyabû ku di gişk herêmanda û gişk peyv li ser vê hêmanê pêkhatibana lê hinde peyv ne tipên wan hatine guhertin û ne ji min devoka Buhtî "î" ya veqetandek bi wanve hatine danin. Wekok:

Depê dara berû, mala xalo, nanê tarikan

Kêra apo, tvinga karker, hespê reş...

Di devoka Botida ji hinde peyvan qaydê xwe wînda krîne. Yani "î" ya veqetandekê ne girtine. Wekok:

Fermana mir, serayê xundekar, tûyê şîr

Tvinga sê agir, kincê wezir, arê hevîr

Ev qaydên jîbo qedandek hate danin, bê guhertin jîbo tewanga (kêşana) navane jî. Teni tewanga navan, gava navên nêryên xweser jî piştî rengdêra "vî, wî, kîj" bîn "î" ya nêrîniyê dîgîrin. Mina:

Vi Azadî, wi Dijwarî, wi Reşoyî

Wi Darayî, kîj Zirekî, kîj Serdarî

Di qedandek û tewanganda jî, navdêrên bi dengdêran biqedin "y" ya kelîjandinê gelege neyê jî bir krîn.

TÊGIHÊN CELEBÊN QEDINEKAN

40. Her destên qedinekan têgîhên curbêcur dîdî diyar krîn. Xwedîtî dîde diyar krîn:

Bavê mîn, diya te, pirtûka wê

Bavê keçîkê, diya zarokan

Kevaniya malê, serkarê banê

Curên qedandî dîde diyar krîn:

Dara sêv, gustîla zêr

Pertalê hîrî, nanê genim

Sewîla ax, deriyê hesin

Di navên xweserda ewladi dîde diyar krîn:

Rîstemê Zal, Leylîya Qasim

Mesudê mele Mustefa, Mehemedê Eli

Eliyê Ênîs, Qedriyê Cemilpaşa

D1 navber zmên û navek xweserda zmanê wi geli dîde diyar
krin:

Zmanê Kurdi, zmanê Erebi, zmanê Tırki
Zaravayê Kurmanci, zaravayê Sorani

D1 navber navek xweser û navek cida bûyina j1 wê ciyê dîde di-
yar krin:

Seyîd Rîzayê Dêrsîmî, Şêx Seidê paloyî
Melayê Czîrî, Fayîq Bucaqê Sêwerekî

D1 navber navek xweser û navê eşîrek, netewekda bûyina j1 wê
netewe û eşîrê dîde diyar krin:

Selahedinê Kurd, mele Seidê Kurdi
Ehmedê Xani, mele Mustefayê Berzani

Istîare dîde diyar krin:

Pencê mrînê, teyrê ecêlî
Destê gel, şewata dîl...

Hinde celebên daçek û hokeran (ber, wek, paş, pêş, pişt, qas,
hîng...) hene ku carna qertafên qedandi (a, ê) nagirin û têne bîkara-
nin:

Reşo beri Azad hat, Dîjwar qasî Şoreş şerkere
Wek te, wekî te, Hîngî mîn, paş xanî, pêş derî

Û hinde jî (dû, pê) hene ku hêç qertafên qedandi nagirin:
Dîlvîn lî dû mîn bû, ez lî pê dozê ketim...

WANE VII

TEWANG - KÊŞANA NAVAN

Parçek jî Şvanê Kurd:

41. Lî ber çiyayê Sipanê em gelek ne man. Pîştî çend rojan jî serfermandar emîr hate me ku em bî pêşve herin. Belê lî ser serdestiya ordiyên Êrîs eniya şer gelek çûbû pêş. Zabişî de çend kozak û ez jî bî xwera brîm û dî pêşiyêda derket. Dîvîyabû berî hatina esker, em jî qerargehêra ci, jî ordiyêra xwarin û jî dewaranra jî êm peyda bîkîn.

(Ereb Şemo)

Ev nvisandîna rabûna arteşî jî ciyekî û çûyîna ciyek dîna dîde diyar kirin.

Vekirin:

Tewang: Dî nvisandîna jorînda, navdêran û desta qedinekê navdêran, gişkî wek hev daçek û qertafî ne girtîne. Lî ber çiyayê Sipanê û lî ser serdestiya ordiyên Êrîs, daçeka "lî", jî serfermandar daçeka "jî", bî pêşve daçeka "bî" qertafa "ve", bî xwera daçeka "bî" qertafa "ra", dî pêşiyêda daçeka "dî" qertafa "da", jî qerargehêra, jî ordiyêra û jî dewaranra daçeka "jî" qertafa "ra" girtîne û xwe alî lêkeranve tewandîne. Nexu navdêran bî van daçek û qertafan mînasêbetên xwe bî lêkeranra pêkanîne.

Tewang: Navdêr û destên qedinekan gorê xebatên xwe, mnasêbetan rût bî serê xwe yan jî bî qertafan, bî daçekan û bî daçek û qertafanve xwe ali lêkaranve dî tewinî û jî heryek van mnasêbetan ra "tewang" tê gotin.

CELEBÊN TEWANGAN

42. Tewanga rût: Navdêr bê daçek û bê qertaf xwe ali lêkaranve ditewine:

Reşo hat, Fêris, Kerevan, û Zerif hatin
Şiyar nan xwar, Dijwar şer kîr, mîn tu dîtî
Tetwan ava bû, Diyarbekîr xemilî

Tewanga bî qertaf: Navdêr qertafan dîgîrî lê bê daçek xwe ali lêkerve ditewinî:

Ez Diyarbekîrê dîbinî, tu Tetwanê nabînî
Ez çûme Wanê, me Kerevanê Şevger şande dehlê
Mehinê giya xwar, Jîkê şer kîr, mêran dest hîldan

Tewanga têdayî: Daçeka "dî" cda lî pêşî, qertafa "da" lî paşî bî navdêrve tene danin. Gava daçek û qertaf bî serê xwe bêne bîkaranî, bî heve dîgîrî û dîbinî cinavka "têda". (lî mjara 56 an binêrî.)

Ez dî Tetwanêda rûdînî, tu têda rûdînî
Ez dî hatîna xweda gelek êşam, tu têda neqêşayî
Reşo dî zevî û parêzêda dîxebîte, tu têda xebîtî

Tewanga "lê"yî: Daçeka "lî" cda lî pêşî navdêran tê danin. Dema daçek bî serê xwe bête bîkaranî, dibe cinavka "lê":

Ez lî Tetwanê rûdînî, ez lê rûdînî
Ez lî ser kevîr radîzêm, ez lê radîzêm
Tu lî hêsp swar dîbî, tu lê swar dîbî
Tu lî mal xwarî dîxwî, tu lê xwarî dîxwî
Ew lî Kurdîstanê bû, ew lê bû
lî cem te, lî nîk wê, lî bal Ozmên

Tewanga "jê"yî: Daçeka "jî" cda lî pêşî navdêran tê danin. Dema daçek bî serê xwe bî dibe cinavka "jê":

Koledar jî mîn dîtîse lê ez jê natîrsîm
Ez jî Dêrsîmê têm, ez jê têm

Tu jî mala xwe rabûy çûy şer, tu jê rebûy çûy şer

Jbo mîn, jbo xwe û jbo wê bine

Tewanga "pêve" yi: Daçeka "bî" cda lî pêşi, qertafa "ve" lî paşi
bî navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf bî serê xwe bêne
bikaranin bî heve dîgîrîn û dibe cinavka "pêve":

Mîn ta bî derziye kîr, mîn ta pêve kîr

Te av bî cûyêve bîr, te av pêve bîr

Tewanga "jêra" yi: Daçeka "jî" cda lî pêşi, qertafa "ra" lî paşi
bî navdêranve têne danin û gava daçek û qertaf bî serê xwe bêne
bikaranin, peve dîgîrîn û dibe cinavka "jêra":

Mîn jî bendêra rêznamek çêkîr, mîn jêra çêkîr

Te jî dozêra tu ne kîr, te jêra tu ne kîr

Tewanga "pê" yi: Daçeka "bî" cda lî pêşi navdêran tête danin û
gava daçek bî serê xwe be dibe cinavka "pê":

Rêya mîn bî Diyarbekîrê ket, rêya mîn pê ket

Şolê mîn bî axê tune, şolê mî pê tune

Tewanga "Jêve" yi: Daçeka "jî" cda lî pêşi, Qertafa "ve" lî paşi
bî navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf bî serê xwe bêne
bikaranin bî heve dîgîrîn û dibe cinavka "jêve":

Ez jî Dêrsîmêve têm, ez jêve têm

Tu jî Sêrtêve têt? Belê ez jêve têm

Tewanga "pêra" yi: Daçeka "bî" cda lî pêşi, qertafa "ra" lî paşi
bî navdêranve têne danin. Eger daçek û qertaf bî serê xwe bêne bi-
karanin, bî heve dîgîrîn û dibe cinavka "pêra":

Ez bî Reşora hatim, ez pêra hatim

Tu bî mînra hati, ez bî tera çûm

Tewanga "pêda" yi: Daçeka "bî" cda lî pêşi, qertafa "da" lî paşi
bî navdêranve têne danin. Heke daçek û qertaf tenî bîn peve dîgîrîn
û dibe cinavka "pêda":

Ez bî ser koledarda ketim, ez pêda ketim

Tu bî mînda keti, çî jî mîn dîxwazi?

Tewanga "jêda" yi: Daçeka "jî" cda lî pêşi, qertafa "da" lî paşi
bî navdêranve têne danin û dema daçek û qertaf tenî bîn, bî heve
dîgîrîn û dibe cinavka "jêda":

Ez jî çiyêda têm, ez jêda têm

Kêmayi ji tedaye, gel ji xweda şiyar bûye

Tewanga "têra" yi: Daçeka "dî" cda lî pêşî, qertafa "ra" lî paşî
bî navdêranve têne danin. Heke daçek û qertaf tenî bêne bîkaranin,
bî heve dîgîrî û dibe cinavka "têra"

Ez dî nav şoreşêra dervaz bûm, ez têra dervaz bûm

Tu dî rêya Sipanêra hati? Belê ez têra hatim

Tewanga "têve" yi: Daçeka "dî" cda lî pêşî, qertafa "ve" lî paşî
bî navdêranve têne danin. Eger daçek û qertaf bî serê xwe bêne bî-
karanin, bî heve dîgîrî û dibe daçeka "têve":

Ez dî malve bûm, ez têve bûm

Pez dî govêveye, pez têveye

Hîrç dî gehêveye, hîrç têveye

Balakêş: Ev daçek tenî yan ji daçek û qertaf pevra ku dîbîn ci-
navk, tenî jîbo yekaniya kesê sîsêyane.

Yek ji: Ew navdêrî bî daçek û qertafan têne tewandî carna
hinde daçek dîkarî bîkevî. Mina:

Ez maldame, cîyî ez dî maldame

Serbazra çû, cîyî bî Serbazra çû

Tewanga "baneşani": Daçekek ji daçekên "baneşani" (gdi, hey,
lê, lo...) cda lî pêşî navdêran têne danin. Jîbo navdêrên mê "ê" ya
mêyanî bî dawîya navdêranve danin peywîste. Navdêrên nêrjî car-
na "o" ya nêrîni dîgîrî. Jîbo praniya herdu zayendan ji "no" ya
qertafa praniya baneşani dîxwaze. Jî daçekên baneşani; "lê" jîbo
mêyan, "lo" jîbo nêrane û yê dî jîbo herdu zayendane ji. Wekok:

Lê Fatê! lê Zerîfê! gdi Belçîmê! lê dotmamno!

Lo Xweşmêmo! lo Kerevano! lo Azad! lo kurmamq!

Tewangên baneşani carna bê daçekên baneşani ji pêktên. Dî vê
tentêlêda lî dawîya navdêranve danîna qertafan (ê, o, no, yê) pey-
wîstîye. Wekok:

Inmamê! xwişkê! delalê! keçxalê! keçno!

Pîsmamq! hevalq! brawq! kurnq! hevrinq!

Xelqo lî mîn kî şîretê

ew dîlbera zêrîn kemer

mîn dî dî halê xefletê

derket ji burcê wek qemer

(Melayê Cziri)

WANE VIII

NAV Û ÇÊBÛNA NAVAN

43. Nav: Rader navîn, mina navan dî qedinekanda cî dîgîrîn û
mina navan têne tewandîn:

Hatîna mîn, çûyîna te, ketîna koledar
Jîna mîn, vejîna te, mîrîna xwinmîj
Dî hatînêda, jî hatînêra, bî hatînêve
Jî hatînê, bî hatînê, lî hatînê
Bê hatîn, bê jîn, bê mîrîn

Rengdêr navîn, Mîna navan dî qedinekanda cîyê xwe dîgîrîn û
mina navan têne tewandîn:

Mezînê mîn, pçûkê te, Zeriya Reşo, reşê şevê
Dî mezînayêda, jî mezînayêra, bî mezînayêve
Jî mezînayê, lî mezînayê, bî mezînayê

Navên hevedudani: navên hevedudani jî du navan pêktê. Ew jî
yan rastbîrast herdu nav peve dîgîrîn yan jî dî navber herdu navan-
da "e" yan jî "bî" têne danîn û bî heve dîgîrîn:

Grav, serder, çrav, xwedipez, canbaz
Sergîr, berdest, serdest, malmezîn
Kalemêr, gregîr, şêrejîn, nêremûk
pîştêmêr, keremejî, kevneperest

Rast**ı**rast, dest**ı**dest, rojb**ı**roj
Kar**ı**dest, dest**ı**kêr, berb**ı**xêr

Navên hevedudaniyên nav û lêker: Ev celebê navan, bî heve da-
nina nav û qurmê lêkera fermanê pêktê û dibe navê wan kesên ku
wê meslekê, wi şoli dîkîn, yani kirdenavên taybeti:

Karker, zêrker, dranker, tevinker
Mêrkuj, pîrbêj, nanpêj, avkêş, serêş
Pezkır, darbır, şevger, pirtûkfiroş

Jî lêkeran çêbûna navan: Bî lêkeranve danina yek jî qertafa "ok,
ox, ek, er" pêktê û dibe navê wan kes û heyinên ku wê meslekê û
wi kari dîkîn, yani kirdenavên gelemperi. Qertafa "ek, er" hindik
ciyanda têne bikaranin lê "ok, ox" gelemperine û ev herdu qertaf di
ciyên hevda jî têne xebitandin. Qertafa "er" di hinde ciyanda dibe
"ar":

Pêjer, bêjer, nviser, cotar, didar
Kolek, brek, drek, vrek, zırtek, fortek
Krok, şandok, veşartok, xwestok, gezok
Gotox, ketox, kuştok, çandox, bezox,

Bî qertafa "van" çêbûna navên meslekan:

Şvan, gavan, berxvan, nçirvan, aşvan
Çirokvan, xwendevan, şoreşvan, dergevan

Bî qertafa "geh, stan, xane" çêbûna navê ciyan:

Seyrangeh, pêgeh, çandîgeh, çêrongeh
Barîgeh, êwirgeh, qerargeh, nêringeh
Kurdîstan, darîstan, Tirkîstan, hovîstan
Karxane, çlexane, girtixane, xebatxane

Haj: Jîbo svîkayî carna "h" ya "geh" tê êxistin, "ge" tenî dimîne.

Wekok:

Çandîgeh çandîge, t arîgeh barîge, pêgeh pêge

Bî lêkera "dan, dang" çêbûna navên fraxan:

Şekîrdang, xwêdang, xwelîdang, çaydan, kıldang
Derzîdang, êzîngdang, zêrdang, zivdang, morîdang

Bî qertafa "in" çêbûna navan. Ev qertaf têgîha jî wê heyberê û
xweritî dimîne.

Zêrin, zivin, darin, berfin, kurin, keçin

Hespin, marin, gayin, hırçin, gurin, kerin
Bı qertafa "ane" çêbûna navan. Manendi, wekiti dînimine:

Mêrane, şêrane, jnane, pêşmergane, mirane
Keçane, kurane, bûkane, şahane, karkerane

Bı qertafa "ani" Çêbûna navan. Ev ji herweki manendi, wekiti dînime:

Mêrani, keçani, kurani, jnani, mrovani
Xortani, cwanani, şahani, şêrani, mirani

Bı qertafa "i" çêbûna navan. Ew navên bı dengdêran qedabın yan "y" ya kelijandîne dîgırın yan ji qertafa "i" dibe "ti" û ew navên bı bêdengî ji bıqedîn, carna qertafa "ti, eti, iti" tên bıkarandin:

Karkeri, şvani, gavani, aşvani, xulami, maldari
Xeradi, axati, melati, miriti, xwarziti, brati
Camêri, avayi, paşayi, paleyi, petşayi, axayi
Merdi, kaliti, jniti, keçiti, piriti, keriti
Qenci, xulameti, endameti, hevaleti, şvaneti

Bı qertafa "ayi" ji hinde celebên rengdêran çêbûna navan. Qertafa "ayi" carna dibe "ahi, asi" ji. Ew navên bı dengdêran bıqedîn, "ayi" dibe "tayi":

Sorayi, zerayi, hşinayi, keskayi, reşayi
Gewrayi, pehnayi, drêjayi, stûrayi, belekayi
Kurtasi, sorahi, spitayi, mezinahi, reşahi

Bı qertafa "ık, ok, kok" nav tên pçûk krın û xweşkok krın. Ew "ık" a bı navê "mêrik, jnık, keçık, kurık, stûnık, darık..." ve girtine, herweki ku bûna hêmana navan, êdi ji wanra "ık" a pçûkayi neyê gotin çêtire. Gava ew nav bêne pçûk krın gelege "ok" a pçûkayi bı wanve bêne danin:

Malık, barık, merık, tevrik, bêrik, kevçık, tasık
Xanikok, derikok, sevikok, jnıkok, keçıkok, darıkok
Sewilok, lehêfok, merifok, dasok, bıvırok, kaxezok

Bı qertafa "i" ji lêkeran çêbûna navan, servenav, ismi meful. Heke lêker bı dengdêra "i" qedabe, ew "i" ya qertaf nayê danin. "i" ya lêkerê him wezifa xwe him ji wezifa "i" ya qertaf dîbine. Heke lêker bı dengê dîn qedabe "y" ya kelijandîne dîxwaze:

Mri, keti, hati, veketi, kuşti, hlati xwari
Hıldayi, razayi, vezelayi, rabûyi, çûyi drayi
Bri, bezi, keni, revî, xemîli, sekini, derizi

Jıbo baş têngihanê, nemaze jıbo lêkerên bî dengdêra "i" qedayi,
cinavkek peywendi gorê zayendan (ê, yê, a, ya) yan jî gorê mêjerê
(ên, yên) lî pêşî lêkeran cda têne danin.

Bî vê ewayê servenav çêtir tê zanin:

Yê keni, yê şemîti, yê sekîni, ê bri, ê revî
Ya xemîli, ya perçiqî, ya çîsî, a tewîzî
Yên tevîzî, yên gevîzî, yên fetîsî, yên derîkî

Bî qertafa "ende, mend" çêbûna navan:

Prende, goyende, frende, darende, sazende
Gerende, bêjende, kalende, jenende, binende
Eqilmend, hzîrmend, hîşmend, hnermend
Dewlemend, behremend, pişemend

Bî qertafa "baz" çêbûna navan:

Leyzbaz, canbaz, sêhrbaz, fêlbaz, kinbaz
Rîmbaz, şûrbaz, hîlebaz, helqebaz, heqlebaz

Rîstem û Cîmşîd û Xalîd Hemzeyan şêrê Elî

Aferîn ya şehswarê Tirk û rîmbazê Erebb (Melayê Czirî)

Bî qertafa "î" çêbûna navên zmanan:

Kurdi, Kurmancî, Sori, Lori - gelhori, Zazayî
Tirkî, Tirkmenî, İngilîsî, Elemanî, Hûnanî

Gava dabaş jî zmanan bête krîn, cda lî pêşî danîna daçekê "bî"
çêtir tê zanin. Wekok:

Bî Kurdi, bî Kurmancî, bî Tirkî, bî Erebi
Ez bî Kurdi dînvîsîm û bî Kurdi dîxwînim
Tu bî Kurmancî bînvîsî û bî Kurmancî bîxwîn
Ew bla bî Tirkî bînvîsî û bî Tirkî bîxwîne

Bî qertefa "î" kîşî krîna cî û menşeyên kes û heyînan

Kurdîstani, Diyarbekirî, Dêrsîmî, Çiyayî
Mûsilî, prûtî, xeradî, deştî, İngilîsî
Tirkîstani, bajari, gundî, Kumsî, Farqînî
Leyla Qasîmê Mûsilî Apoyê Kumsî, Reşoyê Dari

Seyîd Rîzayê Dêrsîmî, şêx Seidê Paloyî
 Şûrê Bîtlîsî, Tvinga Îngîlîsî, xencera Nêrgîzî
 B1 qertafa "î" kîşî krîna mensubîyeta jî malbat û eşîran:
 Merwanî, Şerefxanî, Bedîrxanî, Berzanî, Eyûbî
 Osmanî, Cîbrî, Hesenî, Bekîrî, Reşkotî, Alîkî
 Batukî, Bêrtî, Sloqî, Mamxwîrî, Heyderî, Sipkî
 B1 qertafa "kî" çêbûna navan:
 Kurdî, mrovkî, mêrkî, pehlîvankî, şvankî
 Şêrkî, hespkî, hırçkî, rûvîkî, kewkî, teyrkî
 B1 qertafa "dar" çêbûna navên xwedîtî:
 Maldar, koledar, deyndar, kridar, rezdar
 Çekdar, kindar, navdar, dkandar, zordar
 Zêrdar, mêhvandar, hêzdar, karxanedar
 B1 qertafa "ar, yar" çêbûna navan:
 Kîryar, bîryar, cotyar, salyar, pîrsyar
 Jengar, nvisar, gotar, krar, pûtar, kevnar
 B1 cinavka "hev" çêbûna navan. Carna cinavka hev dibe hem:
 Heval, hevri, hevzava, hevbend, hevvelat
 Hevderd, hevser, hevpa, hevdem, hemdem, hember
 B1 qertafa "anî" jî hejmaran çêbûna navan:
 Yekani, duwani, sêyani, çarani, pêncani, dehani
 Bîstani, siyani, çlani, pênciyani, sedani, hezarani
 B1 qertafa "ek, îk" jî hejmaran çêbûna hinde navan:
 Nehek, heftek, şeşek, çarek, çarik
 B1 çî ewayê dibe bla bibe, bî çî tevinek, qertaf û celebên heve-
 dudaniyan dîbîn bla bîbîn, gava nav pêkhatin, mina navên hêmanî,
 dî qedinekanda cî dîgîrîn û mina navan têne tewandin jî.

MARŞ

Xortên Kurdan tevda rabîn dîlşadoxweşî
 Em Kurên Kurdistanin her bêjîn bîjî
 Her bîjî Kurdistan her bêjîn bîjî
 Ev welatek pîr şêrine her bêjîn welat
 Rêberên xwînfiroşîn bo jîna welat

Her bijî Kurdistan her bêjin bijî
Ser blîndî kes nabîne bê rojên dijwar
Wek şêrên brîndarî bo tene xwînxwar
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî

(jî Hewarê Nami)

Parçek xwendinê
Daxwaznamek

Ber cahê qeymeqam

TETWAN

44. Dbîstana me gelek xweş, bê deng, bê qêr û bî esayîşbû. Bî kêmasiya mamoste, pirtûk û tuneya pergala ji disa qasî çarên di desda heya wanê me dihate dan. Suxte bî hevra li hev hati, bî aş û jî mamostanra berêzkar bûn. Dê, bavê me jî me razî û em jî di nav gelda bî rûmet bûn. Suxtên Kurd û Tirk wek bran bî hevra dixwendin û di navber meda doz û têkoşerek jî dil çênedibû. Gava hinde têkoşînên ne grîng hebûna ji gerîndên dibîstanê, heval û hogîran bî dadi dîqedandî û rojek jî jî hev psû ne dîman.

Dîlxweşî û rûgeşîya me heta hatîna mamostên nîjadperest domand.

Pîştî hatîna wan mamostan, sazîmana dbîstanê herîfî. Dî şûna bratîda dijîmîni, di ciyê wane û xwendîna nîjadperestî ghandî, li ciyê dadi bê dadi destpê kir û gîjîte gehînekek wîsan ku êdî çara xwendîna me ne ma û jîna me jî di bê ewleyêdaye. An waha:

Mamoste dgel wan nîjadperestên gahandî, li ber derê dbîstanê radiwestî. Gava em li ber wanra dervaz dibî, mîna guran li me dînerî û alaziya girtî û lêdana me dîkî. Dema em xwe dîparêzî, qêrî û hewar dîkî "qomûnîst pêşberî mamostan hatî" dibêjî û serde gliya me jî dîkî.

Dî snîfêda' bê sedem me di qutî û dîçî jî gelra "Îro qomûnîstan xwedê nîkurandî û me jî bî hêz û destûra xwedê li wan xîst" dibêjî. Gava em derdîkevin nav gel ango hingorê dîçî mal, jî mera "Lawo hûn têjîkê mîslmananî, jîbo çî bûne qomûnîst

û xwedê dînkurînin?" dî bêjin. Em jî lal, ker û gêj dîbîn û nîzanîn ka çî bersîva gel, dê û bavan bîdîn.

Carna jî bê sedem û bê doz jî gelra "Şevêdî flan û bêhvan kesan çra vekujtîn û gotîn, heke xwedê heye bla bêt vê çrayê vêxî ku em jî wek we bawer bîkîn, eger ne, hun dev jî van baweriyên kevnare berdîn" û disa jî gelra "Edî flan kes jî bavê xwe drav nastîne, lewra jî nav Êrîs drav jêra tê" dîbêjin û lî dane bawer krînê jî dîxebîtin.

Bî kurtasî ewanî, bêbextî û nemîrovaniyên ku dî dbîstana meda têne krîn, hşê mrovan radiwestîne. Eger pêşî lê neyê girtîn, dê bîbe brînek wsan ku êdî çara derman krînê û kewandîne nemîne.

Jîbo pêşî girtîna van bûyeran û dbîstana me zvirandîna drûva xwe ya pêşîn, em bî berêzkarî daxwazên xwe pêşkêş dikîn.
20.1.1978

Lî ser navê suxtên şoreşker
Dîlvîn Plîng Xweşmêr Serhîng

WANE IX

CINAVK

Keçikên tevîker yê mehfûrê

45. Gava vegeriyan hatin mal û rojaniya xwe dane dêya xwe, dê dit ku Zizê wê rojê ji xwiha xwe qemariyek û niv zêdetir anibû. Beri jê kêmtir tani. Dê ecêbmayi ma. Jî Zizê pîrsi. Zizê got:

- Dadê! heta nê min rind nizanibû em çra dixebitîn. Rindê bî min qenc da sehkirin û ketê serê min û iro min jî Rindê 150 grê bêtir grê dan.

- Rindê jî tera çî got?

- Jê bîpîrs dadê ez wek wê rind nizanîm bîbêjim.

Rindê û Gefo jî xwe ghandibûn wan. Rindê dest bî gotinê kîr lê nîkaribû bîqedine, çavên wê teji hîstir dibûn, dê jî dîgiriya.

(Celadet Bedîrxan)

Ev nvisandî jin û xebata malek xzan dîde diyar kîr

Vekîr:

Cinavk û celebên cinavkan: Dî nvisandîna jorinda Zizê, dî ciyê navê xweda "mîn, ez", dî ciyê navê Rindêda "wê, jê", dî ciyê navê xwe û Rindêda "em", dê jî dî ciyê navê Zizêda "te" bîkaranîne. Di- sa dî cinavê herdu keçikanda xwe û dî ciyê navê gişk kîfletda "wan" hatine xebitandin.

Vaye ev (mîn, ez, wê, jê, em, te, xwe, wan...) cinavkîn, yani bê kêmasî ciyên navan girtine.

Ew peyv, daçek, tevînek û qertafên ciyên navan dîgîrîn yan jî îşaret dîkîn jî wanra cinavk tê gotin.

CELEBÊN CÎNAVKAN

Cinavkên kesin:

46. Cinavkên kesin: Cinavkên kesin ewîn ku heyinan dî drûva sê kesanda dîdîn diyar krîn. Şxwe heyin gişk lî dorê sê kesan dîcevin. Kesê dipeyîve, kesê guhdar û kesê dabaş jê tê krîn. Jî vanra, yê dipeyîve kesê yekan, yê guhdar kesê dudan, yê dabaş jê tê krîn kesê sîsêyan tê gotin. Heke yekî tenî bide diyar krîn yekani. Yê dipeyîve yekaniya yekan, yê guhdar yekaniya dudan, yê dabaş jê tê krîn yekaniya sîsêyan û heke jî yekî zêdetir bide diyar krîn prani, yê dî peyivî praniya yekan, yê guhdar praniya dudan û yê dabaş jî wan tene krîn praniya sîsêyan tene gotin. Jî yekani û praniya sîsêyanra kes û kesên wînda jî bête gotin dibe.

Dî zmanê meda du destê cinavkên kesin hene, her yek jî wan xwedî mînasêbetên taybetîne.

Emê jî destekra destê ez, jî ya dînra destê mîna bîbêjin.

Destê ez		Destê mîna
Ez	(kesê dipeyîve)	mîn, mî
Tu	(kesê guhdar)	te
Ew	(kesê dabaş jê tê krîn)	wî- nêr, wê-mê
Em	(kesên dipeyivî)	me
Hûn	(kesên guhdar)	we
Ew	(kesên dabaş jî wan tene krîn)	wan

DESTA EZ

47. Destê ez: Dî peyivînda carna "z" ya cinavka "ez" dîkeve, "e" tenî dimîne. Dîciyê ez hatînda e hatîna tê bîkaranîna lê dî nîvîsandînda dîvê neyê êxistin.

Cinavka "ez" dıkare bibe "wez" û "hûn" ji dibe "wın"

Ji cinavkên desta "ez" yekani û praniya sîsêyan bî eyîni cinavkê têne bikaranîn. Herçiqas di hinde herêmanda "ewan, ewana" bikartînin ji lê ji "ew" zêdetir têgîha "wan" têda dixwiyê, şxwe ev bî çewti ketiye zmên, divê bête derêxistin. Jiber vê yekê divê yekani û praniya sîsêyan bî cinavka "ew" bête bikaranîn. Çawan di daneka ahengiya lêkeranda ji (125 ê binêrîn) tete diyar krin ku yekani û praniya cinavka "ew" bî lêkerane:

Yekani	Prani	Yekani	Prani
Ew hat	ew hatin	pêşmerge hat	pêşmerge hatin
Jin hat	jin hatin	Mêr dixwe	mêr dixwin
Ew rinde	ew rindin	keç nakene	keç nakenin

48. Cinavka "ew": Hate zanin ku cinavka "ew" him yekani û him ji prani dinimine. Diyar krîna yekani û prani ji bî lêkerane. Nexu ew ciyên ku (gişk dem û kêşanên lêkera bûn, gişk dem û raweyên lêkerên nedervazi, dema nha û bêya lêkerên dervazi) ev cinavk dibe kirde, heke nav pxwe ji bibe kirde, bêdro bî tu ewayê nayên prani krin. Çawan li jorin (pêşmerge hat, pişmerge hatin, mêr dixwe, mêr dixwin, keç nakene, keç nakenin, jin hat, jin hatin) ji dixwiyê mêjera kirdan bî lêkerane. Yani lêker yekani û praniya kirdan dinimine. (li 125, 254 an binêrîn)

Herçiqas hinde mrov di van tentêlanda navdêran prani dîkin (pêşmergan hatin, mêran dixwin, keçan nakenin) ji, lê ev çewte û gelege neyê bikaranîn.

49. Pzo ev celebên navan û cinavka wan "ew" gava di desta qedinekanda bîbin kirde tene prani krin. Ê lêker ji pêra ahengine, şxwe qaydê qedinekan ji eve. Wekok:

Yekani	Prani
Ewê rind hat	ewên rind hatin
Karkerê gernas hat	Karkerên gernas hatin
Ewa pçûk dixwe	ewên pçûk dixwin
hespê beza rinde	hespên beza rindin

Gava hevok bı lêkera bûn pêkbên disa kırde têne prani krın û şxwe ev ji ji celebek qedinekan têne hejmartin:

pêşmergên qencin	pêşmergne qencin
hespên şoreşêne	hespnê şoreşêne

Bı lêkera bûn bı vê ewayê ji tê bıkarandin

rınd ewe	rınd ewin
qenc ewe	qenc ewin

Yek ji jıbo agahdari bı vê ewayê çêdibin

Ewin hatin	hespin dıxwin
Karkerin dıxebitin	sermayedarın wan dımijin

Têgıha van hevokên rêzên dawî, yanî yên hatin ewin û yên dıxwin hespin, ne heyinek dınin û yên dıxebitin karker, yên wan karkeran dımijin ji sermayedarın û ne kesên dınin.

50. Cinavkên desta "ez" bı tu ewayi nabın qedandek û nayên tewandın ji. Ev cinavk qertaf lêkeran dıgırın û ev lêker, dem û raweyên jêrin bı wan têne kêşan:

Gişk dem û raweyên lêkera bûn:

Ezım, tuyi, ewe, emın, hûnın, ewin
Ezbûm, tubûy, ewbû, embûn, hûnbûn, ewbûn
Rındım, rındi, rınde, em rındın, hûn rındın
Rındbûm, rındbûy, rındbû, em rındbûn, ew rındbûn
Dê rındbım, dê rındbiy, dê rındbıt

Gişk dem û raweyên lêkerên nedervazi:

Çûm, çûy, çû, em çûn, hûn çûn ew çûn
Dıçım, dıçi, dıçe, em dıçın, hûn dıçın, ew dıçın
Dê bıçım, dê bıçi, dê bıçe, emê bıçın hûnê bıçın
Çûbûm, çûbûy, çûbû, em çûbûn, hûn çûbûn ew çûbûn
Dıçûm, dıçûy, dıçû, em dıçûn, hûn dıçûn ew dıçûn

Kêşana dema nha û bêya lêkerên dervazi:

Dıbırım, dıbiri, dıbire
Em dıbırın, hûn dıbırın, ew dıbırın
Dê bıbırım, dê bıbiri, dê bıbire
Emê bıbırın, hûnê bıbırın, ewê bıbırın
Vedıxwım, vedıxwi, vedıxwe
Em vedıxwin, hûn vedıxwin, ew vedıxwin

Dê vexwim, dê vexwi, dê vexwe
Emê vexwin, hûnê vexwin, ewê vexwin
Divê bête zanin ku gişk lêker bî vê qaydên jorin têne kêşan.

DESTA MIN

51. Desta min: Jî desta min carna "n" ya "mîn" dîkeve "mî" tenî dîmine. Dî hinde herêmanda jî "emîn" bîkartînin. Dî yekaniya sîsêyanda zayend heye. Cinavka mêyan "wê" û ya nêran "wî" ye. Dî praniya sîsêyanda jî dî demên kevînda zayend hebûye. Jîbo mêyan "wêyan" û jîbo nêran "wîyan" dîhate bîkaranîna lê nêro hatiye jî bîr krîna û êdî nayê bîkaranîna. Cinavka praniya dudana "we" dîkare bibe "ewe û hewe" jî.

Ev lêker, dem û raweyên jêrîn bî desta min têne kêşan:

Gişk dem û raweyên lêkera hebûn û vîn:

Mîn heye, te heye, wê heye, wî heye
Me heye, we heye, wan heye
Mîn hebû, te hebû, wê hebû, wî hebû
Me hebû, we hebû, wan hebû
Mîne hebe, teyê hebe, wêyê hebe, wîyê hebe
Meyê hebe, weyê hebe, wanê hebe
Mîn divê, te divê, wê divê, wî divê
Me divê, we divê, wan divê
Mîn vibû, te vibû, wê vibû, wî vibû
Me vibû, we vibû, wan vibû
Mîne bivê, teyê bivê, wêyê bivê, wîyê bivê
Meyê bivê, weyê bivê, wanê bivê

Balakêş: Kêşana dema bê: Mîn dê hebe, dê mîn hebe û mîn dê bivê, dê mîn bivê jî têne bîkaranîna.

Dem û raweyên bori yên lêkerên dervazî:

Mîn berda, te berda, wê berda, wî berda
Me berda, we berda, wan berda
Mîn berdaye, te berdaye, wê berdaye, wî berdaye
Me berdaye, we berdaye, wan berdaye
Mîn berdabû, te berdabû wê berdabû, wî berdabû
Me berdabû, we berdabû, wan berdabû

52. Peywestiya danina cinavkan: Gava destê "ez" bibe kîrde, dî devoka Botida, jî bîl lêkerên dengdêra "î" qedayî danina cinavka praniya dudan tenî peywîstiyê lê dî devokên dînda danin cinavka praniya yekani û dudan peywîstiyê. Gava destê "mîn" bibe kîrde, jî bîl yekani û praniya sîsêyan danina cinavkan gişk peywîstiyê

Dî hevokekda heke kîrde jî cinavkek destê "ez" be, cinavkek jî destê "mîn" dibê serve:

Reşo tvingê dîbine, ew wê dîbine

Azad Zerîfê dîşîne, ew wê dîşîne

Dî hevokekda heke kîrde jî cinavkek destê "mîn" be, cinavkek jî destê "ez" dibê serve:

Reşo tving dî, wî ew dî

Azad Zerîfê şand, wî ew şand

Mîn tu dî, wî ez dî, te ew dî

CÎNAVKA ZVIRANDÎ

53. Cinavka zvirandî: Jî vê cinavkêra cinavka hêzdar jî tê gotin. Lewra jî cinavkên dî bî hêztir û xwerûtir heyinan dîde diyar kîrî. Dî vê cinavkêda zayend tune. Jîbo herdu zayendan, gişk yekani û praniyan yek lîbe, ew jî "xwe" ye. "Xwe" dîkare bibe "xwî" jî.

Cinavka "xwe" minî cinavkên destê "mîn" dibê qedandek û dî-keve tewangan jî:

Nanê xwe xwar û tvinga xwe hîlda çû

Ez xwe dîşom, mîn xwe şuşt, ezê xwe bîşûm

Bala xwe bîde mîn, tu guh nadi xwe

Koledar jî xwe dîtirse, lewra stemkare

Ez bî xweme, tu bî xweyî, ew bî xweye

Em bî xwene, hûn bî xwene, ew bî xwene

Ez bî xwe hatim, tu bî xwe hati, ew bî xwe hat

Te jî xwera tvingek kî

Emê xwinmîjên xwe raqewîrînin...

Ev "bî"ya daçek dîkare dengdêra xwe bêxe û "b" jî bibe "p".

Mîna:

Ez pxwe, tu pxwe, ew pxwe...

CÎNAVKA HEVAYÎ

54. Cinavka hevayi: Jî vê cinavkêra cinavka pişkdarî (muşareket) jî tê gotin. Lewra du kes têda pişkdarin. Jîbo herdu zayendan, yekani û prariyan yek libe, ew jî "hev" yan jî "êk, yêk" e. Cinavk carna hev û dî, êk û du, yêk û du jî têne bîkaranin. Ev cinavk dibe qedandek û dîkeve tewangan jî:

Destê hev girtin, selam dane hev, çûne bal hev
Hev û du nasin, bî hevra rabûn, bî hev leyistin
Arikariya êk krîn, nan dane yêk, em jî yêk hîz dîkîn

Jî bîl hemd û selewatana

Çend kelime jî luxatan

Vêk xîstûn Ehmedê Xani

Navê nûbara pçûka lê dani

(Ehmedê Xani)

Daçeka "bî" dîkare bibe "p" û "h" ya hev bêxe û xwe lî ciyê wê dayne. Bî hevra bibe pevra, bî hev leyistûn bibe pev leyistûn...

CÎNAVKA KEVNÊ LÊKERÎ

55. Cinavka kevnê lêkerî: Ev cinavk "ê" ye. Dîvê cinavkêda zayend tune û jîbo herdu zayendan yekaniya sîsêyan tenî dînimine. Yani ciyê cinavka wê angî wi dîgire. Peyvên bî dengdêran qedayî "y" ya kelîjandî dîxwaze.

Cinavka kevnê lêkerî herwekî qertafekê edetî lî dawîya lêkeranve tê qertîfandî:

Mîn gotê

lî ciyê mîn gote wê angî wi

Mîn dayê

lî ciyê mîn da wê angî wi

Ez dîbêjimê

lî ciyê ez dîbêjimê wê yan jî wi

Mîn şandê

lî ciyê mîn şande wê angî wi

CÎNAVKA KEVNÊ DAÇEKÎ

56. Cinavka kevnê daçekî: Ev cinavk jî mîna cinavka kevnê lêkerî "ê" ye û bê zayende jî. Jîbo yekaniya sîsêyan dî ciyê "wê,

wi" da tê bıkaranin.

Ev "ê" ya cinavk, dengdêrên daçekan têxe û xwe lı ciyê wan datine. Heke bêdenga daçekê "b" be, dıbe "p" û "d" be, dıbe "t". Heke pêş daçek teni be, cinavk pêve dıgire û heke paş qertaf ji hebe, têne cem hev û peve dıgırın. (l1 42 an binêrın)

Pêşdaçekên ku cinavka "ê" b1 wanve dıgire evın: L1, b1, d1, j1 û paş qertaf ji evın: Da, ra, ve.

Cinavkê kevnê daçekî b1 ve ewayê têne bıkaranin:

L1 ciyê

Ez l1 koledar dıxım, ez lê dıxım

Ez b1 wira, ez b1 wêra çûm, ez pêra çûm

Mın j1 karkera ani, mın jêra ani

Tving b1 pêşmergera bû, tving pêra bû

Ez d1 Kurdistanêdame, ez têdame

Ez j1 şoreşê tēm, ez jê tēm,

Tu j1 xwinmij dûri? Belê ez jê dûrım

Gelo rêya bavê mın b1 Diyarbekirê ket? Erê pê ket

Mın ta b1 derzive kır, mın ta pêve kır

Ez j1 Diyarbekirve tēm, ez jêve tēm

Av b1 agırda kır, av pêda kır

J1 darda ket, jêda ket

D1 çiyêra çû, têra çû

Berik d1 lûlêve derket, berik têve derket

WANE X

CİNAVKÊN İŞARKİ

57. Cinavkên işarki: Cinavkên işarki dı cyni gavêda rengdêrên işarkine ji. Jı hev nasin wan: Eger ciyê navan bıgırın cinavkın. Eger bı navaıra bên û navan kıfş, reng bıkın rengdêrın: Ev hat, ev cinavke. Ev mrov hat, ev rengdêre. Lewra dı hevoka "ev hat" da "ev" ciyê navi gırtiye û dı hevoka "ev mrov hat" da mrov kıfş kırıye.

Cinavkên işarki mina cinavkên kesin du destene: Desta "ev", desta "vi". Desta "ev" mina desta "ez", desta "vi" mina deta "mın" dı kêşananda têne bıkaranın. (Lı mjara 47, 50, 51, 128 an binêrın.)

Zayenda desta "ev" bı qertafa qedandi pêktê. Mina: Evê han, eva han. Destu "vi" yêñ yekani bı cda cinavkên mê nêr hene: "vê, wê" mêne û "vi, wi" nêrın. Cinevkên işarki evın:

Desta ev

Jıbo heyinên nızık: ev

Jıbo heyinên dûr: ew

Desta vi

vê, vi, van

wê, wi, wan

Desta "ev" qertaflêkeran dıgırın û mêjera wan bı lêkerane, yani lêker yekanibın cinavk yekani, lêker pranibın cinavk ji pranın (47 an binêrın)

Yekani

Ev qence
Ew qence
Ev hat
Ew hat

Prani

ev qencin
ew qencin
ev hatin
ew hatin

Herçiqas "evan, ewan" bıkartinin ji lê disa têgîha "van, wan" dî-
dîn.

Jıbo zelal krın û hêzdariya cinavkên îşarki daçeka "ha, han" cda
lî dû cinavkan têne danin. Cinavk bî veqetandekan xwe ali wanve
dîdîn û ramanên îşaret krînê xwerûtir dîkîn:

Nêr

Evê ha, evê han
Ewê ha, ewê han

Mê

eva ha, eva han
ewa ha, ewa han

Dî drûva qedandida prani:

Evên ha, evên han ewên ha, ewên han

Ev daçeka "ha, han" dîde dû navan ji. Nav gorê zayend û
mêjerê veqetandekan dîgırin, xwe ali wanve dîdîn:

Maldarê ha, maldarê han Qumbera ha, qumbera han
Lawîkê ha, lawîkê han keçîka ha, keçîka han

Praniya qedandi ji:

Karkerên ha koledarên han

Desta "vi" qertaflêkeran nagırin, dîbîn qedandek û dîkevne te-
wangan ji:

Vi koledar kuşt van welêt rızgar kîr
Wi koledar raqewırand wan welêt flıtand
Vê şoreş saz kîr van çek peyîdandın
Wê gel şiyar kîr wan gel ghand
Vê xwe rınd xemilandıye van xwe amade kırıye

Dîvê bête zanin ku dî desta "vi" da ahengiya lêker bî serveraye.
(lî mjara 126 an bîncîn) Praniya kîrde bî tewangêye. Mina:

Vi karker şiyar krın, karker prın
Van karker şiyar kîr, karker yeke

CİNAVKÊN PİRSİYARÎ

58. Cinavkên pîrsiyarî: Ev cinavk, bî pîrsiyarî cîyên navan dîgîrîn. Cinavkên pîrsiyarî yê nîr tene bîkaranîn evîn:

Çî, çend, çqa, çqas, lî kû, kûve

Kî, kîjk, kîjan, kîjkan

Kê, kêjîk, kêjan, kêjkan?

Kî, kîjîk, kîjan, kîjkan jîbo nêrane. Kê, kêjîk, kêjan, kêjkan jîbo mêyane.

Cinavkê pîrsiyarî, dî qedinekanda cîyê xwe dîgîrîn û dîkevîne tewangan jî.

Hinde jî van cinavkan jî mîna cinavkên îşarkî (lî mîjara 57 an bînêrîn) heke cîyên navan bîgîrîn cinavk, heke navan reng û kîfîş bîkîrî rengdêrîn.

Bîkaranîna cinavkên pîrsiyarî:

Ev çîye?, te çî anî?, tu çî dîbêjî?

Ev kîye?, kê hat?, kêjanê arîkariya gel kîr?

Kî Kurdistan vegîrî?, kî nahewî?

Kîjî ne hîşt qutabî bîxwîrîn?

CİNAVKÊN GRÊKÎ

59. Cinavkên grêkî: Ev cinavk peyvêk bî peyvêk dîne, du hevokan bî hevê grê dîdîn. Jîber vê yekê jêra cinavka grêkî tê gotîn.

Ev cinavk dîbe qedandek lê nayê tewandîn û bê zayende jî.

Cinavka grêkî "ku" ye û bî cîda tê danîn.

Bîkaranîna cinavka grêkî:

Hespê ku te kîrî

Reşo got ku ezê stemkarîna jî welêt raqewîrînî

Xwînmîjên ku te dî stemkarîna

Cîyê ku tu neçîyê ne yê teye

Welatê ku te flîrand yê Kurdane

Ev cinavk bî cinavkên peywendî jî tê bîkaranîn:

Yê ku te anî, yê ku tu dîkî

Ya ku te dî, yê ku te şandî

Dı hinde herêmanda "ko" tê bıkarandin lê ya rasti "ku" ye.
Haj: "ku" şerti û daçekî ji tê bıkarandin. "ku" ya cinavkî, şerti û daçekî bî têngî û herikîna hevokan jî hev têne nasin.

CINAVKÊN PEYWENDÎ

60. Cinavkên peywendî: Cinavka han gorê têngî û ciyan, cda têne pêşî navdêran û peywendîtî dîdî diyar krî.

Ev cinavk jîbo yekaniya mê "a" ye, jîbo yekaniya nêr "ê" ye. Jîbo praniya herdu zeyendan yek jî "êd, êt, ên" e. Ev cinavk bî serê xwe jî têne bıkarandin lê bî "y" yêve bêne danin çêtir:

Nêr	Mê	Prani
Yê mîn	ya mîn	yên mîn
Yê Ferzende	ya Ferzende	yêd Ferzende
Yê pêşmergan	ya pêşmergan	yêt pêşmergan
Yê te	ya te	yên te
Yê Keleş	Ya Keleş	Yên Keleş
Ê gernasani	a gernasani	êt gernasani

Tvinga mîn pîr başe, ya te çawane?

Gundiyên me şiyar bûne yê nê we dî çî tentêlêdane?

CINAVKÊ NEKİFŞÎ

61. Cinavkên nekîfşî: Hinde cinavkên nekîfşî dî ey nî gavêda rengdêrê nekîfşîne jî. (lî mîjî 80 yan bî nêr.) Eger ciyê nawan bî gîrî cinavkî, heke nawan reng û kîfşî bî nî rengdêrî. Mîna: Hinde hatî. Hinde cinavke. Hinde karker hatî, hinde rengdêre. Lewra dî hevoka pêşîda hinde, ciyê navi gîrtîye, dî hevoka dawîda karker, reng û kîfşî krîye.

Ev cinavk, bî ewayek nê kîfşî ciyê nawan dî gîrî û gorê wan navên ku ciyê wan gîrtîne têne tewandî.

Hinde cinavkên nekîfşî yê nî pîr têne bıkarandin evî:

Yek, yekî, her, heryek, hne, hîndek
Hinde, hnek, gelek, pîr, heçî, kesek
Qet, flan, hemî, gî, gîşk, tev, bêhvani

Çend, çendek, zehf, zaf, tevda, hêç
 Tu, pçek, ê dîn, ê mayî, hew, hewqa
 Bîkaranîna cinavkên nekîfîşî:
 Yek hat, yekî got, her tê, heryekî tîştêk dîgot
 Hne dîbîn şoreşker û hne jî dîbîn cehş
 Hnek pêşmerge û hnek paşmerge
 Hindek xwe nanasîn û hindek jî bavê xwe
 Gelekan jîbo rîzgari xwe dane kuştin
 Heçî hez jî welêt nekîn, hez jî xwe jî nakîn
 Qet nanîvise, hêç xebatê nake
 Flan hat, hemî çûne gundan, gî hatin
 Gişk dîxebîtin, tev çûne dîbîstanê
 Bêhvan jî çû, çendekan gerdo û şêx raqewîrandîn
 Çendek hatin, zehf çûn, zaf hatin
 Tu nekîr, pîr xwar, pçek da mîn
 Ê dîn ne çû şerê serxwebûnê
 Ê mayî xwe ghande têkoşînê

 Hindek bî peyayî çûne baxan
 Hindek bî swarî çûne raxan
 Hindek bî tebayê wiye kîsret
 Hindek bî hevalê wiye wehdet
 (Ehmedê Xanî)

CINAVKÊN QERTAFÎ

62. Cinavkên qertafî: Jî cinavkên qertafîra qertaşcinavk jî tê gotin. Lewra min qertaşekî edetî bî dawîya peyvanve dîgîrîn.

Dî daneka (mjara) lêkeranda jî dê bête dabaş krîn ku dî zmanê meda qertaşcinavk û qertaşlêker cynîne. (Lî 95 an bînêrîn) Heke bî navaşve bêne danîn qertaşlêkerîn û cinavkan jî dînimîn. Eger bî lêkeranve bêne danîn qertaşcinavkîn.

Qertaşcinavk, jî bîl dema boriya têdayî ya yekaniya sîsêyan, bî gişk dem û raweyên lêkerên nedervazî û dema nho û bêya lêkerên dervazî dgel hinde lêkerên daxwazîve tene danîn.

Qertaſcinavk evn:

Yekani

1- im, yim, m, me, bûm, bûme

2- i, y, yi, bûy, bûyi

3- e, ye, bît, bûye

Prani

1- n, in, yin, yin, ne, bûn, bûne, in, nîn

2- n, yin, ne, nîn, in, bûn, bûne

3- n, in, yin, ne, nîn, bûn, bûne

Divê bête zanin ku "in, yin" dî devoka Buhtidanin, yê dîn ge-
lemperine.

Bıkaranina van cinavkan:

Yekani

Hatim, çûm, çûme

Hati, çûy, çûyi

Dıçe, çûye, çûbît

Prani

Em çûn, em çûyin, em hatn, çûyin, hatn

Hûn çûn, hûn hatn

Ew çûn, ew hatn

Balakêş: Herçiqas "bûn" lêkere jî lê lî vir bê ferq, qertaſ cinavke

Fezl û terîqa Neqşebend

Ger ew bî şorba germ bûya

Ew dizîka şorbe dî nêv

Dê şêxê Bestami bûya

Fezl û terîqa sofîyan

Ger ew bî rih bîhta vucût

Ew nêriya lîhye tewil

Dê bê guman sofî bûya

Fezl û terîqa alıman

Ger ew bî şaşî gır bûya

Cısmê kulindê sermezın

Dê qazî beyzawî bûya

Fezl û terîqa qadîrî

Ger teqteq û şeqşeq bûya

Ew şeqşeqa aşî yeqın

Dê qutbê gêlani bûya

(Axayokê Bêdari)

CİNAVKÊN XWEDÎTÎ

63. Cinavkên xwedîti: Ev cinavk, jî cinavka "xwe", jî cinavkên

kesin yê dest "mîn" û ji cinavkên îşarki yê dest "vî" pêktên.

Cinavk cda lî pê navdêran têne danin. Navdêr ji gorê zayend û mêjerê veqetandekan dîgîr û xwe alî cinavkanve didin û têgîha xwedîti (malîkiyet) dînimîn. Mina:

Mê	Nêr	Pranî
Tvinga mîn	şûrê te	karkerên wî
Şoreşa me	welatê wan	pêşmergên wan
Qelema xwe	hingivê vê	hespên te
Pirtûka we	xaniyê wan	pezên me

Gava nav di dabaşêda dervaz bîbîn, êdî carek jî jî wan axaftin nexwaze, hînga cinavkek jî cinavkên peywendî lî cîyên wan navan têne danin. Hemîne ku herdu cinavk jî hev cda têne danin.

Cinavkên peywendî jî mêjer û zayendê heyberan, cinavkên xwedîti jî mêjer û zayendê xwedîyan têne bjartin. Mina:

Mê	Nêr
Mehîna mîn, ya mîn	Beranê mîn, yê mîn
Deftêra te, ya te	kaxîzê te, ê te
Bzîna wê, a wê	hogîjê wî, yê wî
Breka vî, ya vî	xaniyê xwe, yê xwe
Dkana me, a me	kevîrê we, yê we
Rma wan, yawan	hespê wan, yê wan

Pranî

Çêlekên mîn, yê mîn. Gayên te, yê te
Keçên mîn, yê mîn. Kurên xwe, yê xwe

PARÇEK XWENDINÊ DI HAWÎRA ZMÊNDA

64. Roja mrovan dest bî jîna cvatî krînc, zman hatîye afirandîn, ketîye bîn fermana xwestin û hilberîya mrovan. Çawan dest, lîng, çav û gişk endamên bedena mrovan jî mrovan chê nabîn, wsan zmanê gelan jî jî gelan cda nabîn. Heta gelek di rûyê Dînyayîda bî-jî, zmanê wî gelî jî dê bîjî. Zmanek dewlemend, bî kotekî ne têtê afirandîn û ne jî winda krînc.

Di Gerdûnêda zmanê xzan û dewlemend hebûne. Zmanê xzan ne karîne jînê bîdomînî, pxwe mhane û gelên bî wan zmanan jî di

peyvîna ew ji mhane. Pzo em navê wan gel û zmanan dî rûpelên dirokêda dîbinin.

Zmanê dewlemend, dî nava herikina dirokêda şehrezayi, çand, pişe û gişk xwestinên cvaki afirandine û heta roja me jina xwe domandine û dîdominin ji. Jî vanra "zmanê nemîr" tê gotin û gelên bî wan zmanên nemîr dîpeyvîn, ew ji wek zmanên xwe nemîrîn.

Zmanê me jî yek jî wan zmanê dewlemend û nemîre. Pîştî serkevtina ola islami, karbîdestên Ereban bî gişk hêz û fînfonekên xwe yên çlûz û krêt, lê xebitin ku çawan Qiptî, Berberî û hinde qewmên din pşavtîn û dabelandîn, wsan Kurdan jî bîpîşêvîn û dabelîn.

Pîştî Ereban vêca Osmaniyan bî eynî gelşê destpê krîn û dî dema meda jî nokerên burjuwayên Tirk, Ereban û Farîsan bî eynî lêp, fêlbazî û gelşan têne zmanê Kurdi ku bîpîşêvîn û Kurdan jî dabelîn. Zmanê me heta iro pêşber van şeran berevaniya xwe krîye lê dîvê jî iro paş em jî dî vî şerê granda arikariya zmanê xwe bîkîn, lewra şer lî ser pîştî zmên pîr gran bûye, hetanî nho bî gurz, şûr û şeşperan êrîş dîdanê lê iro bî top, tang û frokan radîhîjnê.

Çara arikariya zmên, hin bûna nvisîn û xwendina Kurdiye. Heke rojek berî em hinê xwendîn û nvisandina zmanê xwe bîbîn, emê bîkarîbîn arikaya zmanê xwe bîkîn. Eger ne, qada şerî tenî jî zmênra dîmine û zman jî bî wan çekên xwe yên kevîn, bî wan çekên nûdemra dê çawan vî şerî gran bîke û ser bîkeve nîzanîm.

Dîvê bête zanîn ku roja zmên şergeh wînda kîr û bîn ket, em rojek jî nîkarîn xwe ragîrîn. Em jî mîna wan qewmên kevîn dê bête dabelandîn. Vaye ew zmanê me yê dewlemendê merêz ber bî wînda bûnêve dîçe.

Misoger şerme, fêdiye, fhête ku mîro bî salan lê bîxebite zmanê biyaniyan hin be û zmanê xwe jî bir bîke.

Em bî mafedari gazîndan jî bav û kalên xwe dîkîn û dîbêjin ku "wan jî mera tu karek qenc ne krîne". Belê raste, wsane lê em jî bir dîkîn ku ew zmanê wan parastî û heta roja me anî, em wî jî naparêzîn, wînda dîkîn û dîdîn guran.

Gumandarîm ku xortên pêşverû vê grîngiyê dê bîbin, bîzanî û xwedîtî lî zmên bîkîn.

WANE XI

RENGDÊR

Rewşa bavê dlovan

65. Gava ez birefchmê xwe bûm, min çavê xwe bi ditina bavê xwe yê dlovan vekir. Emrê wi dorê pênci salêra hebû. Bejneke zrav, ne kurt û ne drêj lê bû. Egala sor li seri, şal, şapikê spi liber, gorê saxdirêj û benê kesk nexişandi li pêyan, çara zer li piştê û xencerekê Nêrgızıya destisedef di ber çarêda bû. Gava tavê dîda xencer û çara zer, têriji ji wan diçûn û serê têrijiyan xwe digihandine egal û goran. Wê xemlê, dlê gelek mrovan dişewitand.

Çar bra û çendek ji pismam, hogir û lêzîmên wi hebûn. Bî vê rewşa xwe gava ji derda dihat, hinde bra, pismam û lêzîm ji berda radibûn lê hindekan rûmeta wi ne dîzanina û ranedibûn. Bavê dlovan, ji wan bêhteng ne dibû û digot "Dê roj bêt ku ew ji rûmeta min bîzanin".

Ev nvisandîna jorin xeml û rewşa mêreki Kurd dîde diyar krin.

Vekirin:

Rengdêr: Di nvisandîna jorinda "bavê dlovan, bejna zrav, egala sor, şal û şapikê spi, gorê saxdirêj, benê kesk, çara zer" dîborin. Dlovan, sor, spi, zrav, saxdirêj, kesk, û zer rengdêrên û çawaniya bav, bejin, egal, şal, şapik, gore, ben, û çarê dane diyar krin.

Disa "pênci sal, çar bra" dıborın. Pênci û çar rengdêrın, hejmara sal û bran dane kışş krın. Cardi "gelek mrov, çendek pısmam, hinde bra" dıborın, gelek çendek, hinde rengdêrın, van jî bî ewayek nekışşe hejmara pısmam, mrov û bran dane diyar krın.

Disa "wê xemlê, vê rewşê" dıborın, wê, vê rengdêrın, bî îşaret xeml û rewş kışş krine.

Rengdêr, ew peyvên dî qedinekanda têne pişt navan, dıbın qedandek, reng, cıns, mezınayi pçûkayi, rındayi, skayi bî kurtasi çawaniya heyinan dıdın diyar krın, yan jî bî navanra tên bî hejmar bî pırs, bî îşaret heyinan jî manendê wan dıqetın jî wanra rengdêr têne gotın.

Divê bête zanin ku gava rengdêr bî serê xwe bêne bıkaranın jî navên heyinan tên hejmartın (lî mjara 43 yan bınêrın) û gava bî heyinanra bêne bıkaranın rengdêrın. Rengdêr taybetiyên heyinan dıdın diyar krın û heyinan jî hev zelal dıkn. Wekok: Gava mro bîbêje ev pirtûk, pirtûka mezın, pirtûka pçûk, pirtûka zer, pirtûka pêncem, du pirtûk, kîj pirtûk, pirtûkê, curbicur jî manedê wê kışş dıke

Ne malê pır, ne gerdena stûr

Ne mal jî kurê qencra dane, ne jî yê xrabra

(gotinên mezınan)

BRÊN RENGDÊRAN

66. Brên rengdêran: Rengdêr dıbın du bîr: Regdêrên çawani, rengdêrên kışşkeri.

Rengdêrên çawani, bî bersiv dana pırsina "çawan?" tê nasin. Wekok:

Çawan	bav?	bavê dlovan
çawan	egal?	egalâ sor
çawan	dar?	dara hışk
çawan	keç?	keça bedew
çawan	kur?	kurê jir

Rengdêrên kışşkeri, bersiv dana pırsa "çend, kijan?" têne nasin:

çend	bra?	çar bra
çend	pısmam?	çendek pısmam
çend	heval?	hinde heval
kij	mrov?	ew mrov
kijan	pirtûk	ev pirtûk

RENGDÊRÊN ÇAWANÎ

67. Rengdêrên çawani: ji vanra rengdêrên binyati (hêmani) û rengdêrên rengin (wesfin) ji tê gotin. Ev rengdêr di hêmana zmênda hene û hin bûna wan bi bihistinêne. Mina kesk, sor, zer, gewr, reş, spi, kurt, drej, mezın, pçûk û êd.

Ev rengdêr di qedinekanda bi qedandeki ci dıgırin û têne tewan-dın ji. Yanî cda danina wan lı pışt navan, dıbin qedandek û çawani û tentêla navan dıdın diyar krın:

Qelesa sor, deftera spi, hubra kesk, simbilê zer stûnıka drêj, xaniyê mezın, welatê freh, kêfa xweş.

Qedinekên rengdêri: Gava qedandek rengdêr bin qedinekên rengdêri te gotin.

Qedandi veqetandekên zayendan, ango qertafên prani dıgırin û xwe ali qedandeka rengdêrve dıdın:

Lawê delal, keçıka çeleng, karkerên jêhati, çekên gran, çiyayê blind, koledarên zengin, kêfa xweş

Tewanga qedinekên rengdêri ji wlo pêkten:

Dikê reş, ji dikê reş, bi dikê reşve, lı dikê reş

Xana mezın, di xana mezında, xana mezınve

Dı ciyê rengdêranda nav ji bi rengdêri carna têne bıkarandin û bi ewayek çawaniyên heyinan dıdın diyar krın:

Masa dep, deryê hesın, gustila zêr, diyarê kevır

Palasa hri, banê ax, dara spindar, xencera pola

RENGDÊREN MESLEKÎ

68. Rengdêrên mesleki: Ev rengdêr du celebın: Hinde lı pêşi û hinde ji lı dû navan cda, nav ji bê qertaf têne danin û celebek

rengdêrên çawani dînimîn:

Serok Berzani, werger Noredin Zaza, hozan Cigerxwin
Rêzan Seit Elçi, parêzer Faiq Bucak
Fermonde Îhsan Nuri, nvisvan Îsmail Beşikçi, Eli axa
Mir Şeref, mfirdi Yekan, xan Dîmdîm, xazi Muhemmed
Doqtor Şvan, Şêx Mehmûdê Berzenci, Bedîrxan paşa

RENGDÊRÊN ZÊDEDARÎ

69. Rengdêrên zêdedari: Ev rengdêr bî qertafa "tîr, tîrtîr, trin" û bî daçekê "tewri, hê" têne bîkaranîn.

Lî dawîya rengdêranve danîne qertafa "tîr" zêdedari tê hmatê:

Mezîn mezîntîr, pçûk pçûktîr, sor sortîr, zer zertîr

Lî ciyê qertafa "tîr, tîrtîr" tê danîn, zêdedari dibe du qasî xwe

Mezîntîrtîr, pçûktîrtîr, drêjtîrtîr, qencîrtîr

Lî ciyê "tîr", "trin" dê danîn, zêdedari dîgîhîje hedê dawî:

Mezîntîrîn, reştîrîn, zertîrîn, qencîrîn, başîrîn

Jîbo hedê dawîya zêdedari, daçekê "tewri" jî cda lî pêşî rengdêran tê danîn. Nav jî gorê mêjer û zayendan qertafan dîgîrîn û lî pêşî daçekê cda ci dîgîrîn:

Kurê tewri mezîn, keça tewri bedew, mêrên tewri qenc

Lî ciyê "tewri" danîna daçekê "hê" peyvan zêdedar, zêdedar kî-riyan jî zêdedartîr dîke:

Kurê hê mezîn, kurê hê mezîntîr, keça hê bedew keça hê bedewtîr, hespên hê beza, hespên hê bezatîr

RENGDÊRÊN WEKHEVÎ

70. Rengdêrên wekhevi: Ev rengdêr bî daçekên "qasî, hîngî" pêktên. Cda danîna van daçekan lî pêşî navan, rengdêrên wekhevi têne hmatê:

Qasî mîn, qasî te, hîngî me, hîngî we, qasî Reşo

Şêx qasî axan xwinmîjîn, tu hîngî mamoste nîzani

Refa karkeran qasî gelê bîndest dîperçîqîn

Rengdêrên wekhevi û rengdêrên zêdedar, bî cinavkên peywendî

ji têne bıkaranin. Cinavk gorê mêjer û zayenden cda lı pêşi navan
ci dıgırın:

Ya mezıntır, ya mezıntırtır, ya mezıntırın
Yê hê mezin, yê hê mezıntır, yê tewrî mezin
Yên qasi gelê bîndest dıperçiqın, karkerın

Em bı ser dijmindê wek pêt û brûskan bırıjın
Ger çı em dê bêne kuştın wi dgel xwe bıkujın
Rê û derbendan lı ber bıgırın wek hewr û mjın
Em kurên kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanibe bawer bıke mlet jı dijmin meztire
Wer bıkın lê bıbne leşker dar û ber lat û devi
Çare nine serşıkeşti rev bı dest wi nakevi
Mletê Kurd dê jı para mêr û jın tev pey kevi
Em kurên kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanibe bawer bıke mlet jı dijmin meztire
Sûnd û peyman bı lı ser me em jı vê rê nagerın
Canfidane em dı vê rê nayê bira me mrın
Ala rengin wek plıngan pêşve rakın hılgırın
Em kurên Kurd ser blındın pêşve êriş ey bra
Zanibe bawer bıke mlet jı dijmin meztire

(Cigerxwin)

WANE XII

RENGDÊRÊN KİFŞKERİ

71. Rengdêrên kîfşkeri: Ev rengdêr bî çend ewayên têvel heyinan kîfş dîkîn: Bî hejmar, bî îşaret, bî pîrsiyari heyinan kîfş dîkîn û bî ewayek nekîfşî jî heyinan dîdîn diyar krîn.

72. Rengdêrên hejmari: Ev rengdêr gava bî serê xwe bêne bîkaranin, navên hejmaranin û gava bî heyinanra bêne bîkaranin, dîbîn rengdêr û heyinan kîfş dîkîn. Rengdêrên hejmari dî nav xweda dîbîn çar beş: Hejmarên hêmani, hejmarên rêzdari, hejmarên kesri û hejmarên beşdari.

73. Rengdêrên hejmariyên hêmani: Rengdêr cda lî pêşî heyinan têne danin û heyinanan bî hejmar jî wanên din kîfş dîkîn:

Du hesp, sê mehin, çar mom. çarde mom, yek camêr
Deh pêşmerge, sêzde karker, heft qutabi pênc mamoste

Hejmar

O- sîfîr

1- Yek

2- du, dîdo

3- Sê, sîsê

4- Çar

5- pênc

6- şeş

7- heft

8- heşt

9- neh

10- deh	20- bist
11- yanzde, yanzdeh	30- sıh, si
12- danzde, danzdeh	40- çıl
13- sêzde, sêzdeh	50- pênci
14- çarde, çardeh	60- şêst
15- Panzde, panzdeh	70- heftê
16- şanzde, şanzdeh	80- heştê
17- hıvde, hıvdeh	90- nehwêd, not
18- hijde, hijdeh	100- sed, sîd
19- nozde, nozdeh	1000- hezar

Gava jî bistan jor bêst hejmartin gelege dî navbera du hejmaran-
da "û" ya grêk bête danin. Mina: 21 bistûyek, 22 bistûdu, 35,
siyûpênc, 1978 hezarûnehsedûheftêûheşt.

Rengdêrên hejmariyên hêmani dî qedinekanda ci dıgırın. Him
dîbîn qedandi him jî dîbîn qedandek û têne tewandin jî. Mina:
pêncê mehê, meha pêncan, dî pêncanda, jî pêncanra, pêncan bine...

Gava dî hevokên navdêrida hejmar bî qertaf lêkerê bêne bıkar-
nin, cda lî dû navan têne danin:

Dî gundê meda mamoste dîdone
Demijmêr çende? çar kême dehe
Hesp çendî? hesp heftin

RENGDÊRÊN HEJMARIYÊN RÊZDARÎ

74. Rengdêrên hejmariyên rêzdari: hejmarên rêzdari cda lî dû
navan têne danin û navan bî hejmariyên rêzdari kîfş dîkîn. Ev
rengdêr bî çar celebên pêktên lê têgîha wan yeke:

Bî qertafa "em", bî qertafa "emin", bî qertafa "an" û bî qertafa
"î":

Yekem, duwem, sêyem, çarem, pêncem, dehem, bistem
Çeremin, pêncemin, şeşemin, heftemin, heştemin
Demijmêra yekem, dana duwem, bedila sêyem, şeva nehi
Rojê pêncemin, heftêya şeşemin, meha heftemin
Pêşmerge çaran, karkerên bistûşeşan, mirê heştan
Suxtê dehi, şagirtê siyûsisêyî, xaniyê heştî

Rengdêrên hejmariyên rêzdari bî serê xwe kê m ji bî têne bîkaranin lê yê bî qertafa "an, i" pêkbên hêç nayêne bîkaranin. pzo ev rengdêr pîştî navan, gava nav tunebîn, gorê mêjer zayendan cinav-kek peywendî gelege bêne danin:

Hespê yekan, ê yekan, yê yekan, keça dudan, a dudan
Tvinga çaran, a çaran, ya çaran, kurê sisêyan
Mehinên pêncan yê pêncan, ên pêncan, ên bistan
Xaniyê şeşan, yê şeşan, ê şeşan, pencera dehan
Pencera heftî, a heftî, ya heftî, gundê panzdehî
Ramaxa sêzdehî, a sêzdehî, ya sêzdehî

75. Rengdêrên hejmariyên kesrî: Ev rengdêr heyinan bî hejmariyên kesrî kîfş dîkîn. Yanî jî tamê parçek dîdîn diyar krîn. Lî pêşî tamê cda daçeka "jî" û bî dawîya tamêve jî qertafa "an" yan jî "î" têne danin. Bî vê ewayê tam xwe alî parçêve dîtewine. Herdem tama tewandî lî pêşî, parçe jî rût lî dû tamê cda têne danin:

jî sedan bîst, jî sedî bîst 20 / 100
jî heftan çar, jî heftî çar 4 / 7
jî bistan şeş, jî bîstî şeş 6 / 20

Hinde herê m tamê bê daçek, bîkartinî

Sedî pênc, sed yek, deh yek, pênc yek

Heke kesîr bî navanra bête bîkaranin, qertafa "an, i" navanve têne danin:

Jî sed mrovan sê mrov, jî pênc hespan du hesp
jî bîst beranî çar beran, jî çar masê masek

Heke heyin yekani ya mê bî t yekanîti bêt bîkaranin qertafa "ê" dîkare bigînt:

Jî heşt jnê du jîn, jî bîst mehinê neh mehin

Heke parçe yek lî be, tam rût jî bête danin dîbe, çawan ku lî jorin jî hatûbû dabaş krîn:

çar yek, deh yek, sed yek

Jî sed axan axak jî qenc dernakeve (gotinê mezînan)

RENGDÊRÊN HEJMARIYÊN BEŞDARÎ

76. Rengdêrên hejmariyên beşdari: Rengdêra han bî hejmaran

yan ji bî beş krînê heyinan kîfş dîkîn. Ev rengdêr bî dubare krîna
hejmarekê pêktê:

Yek yek, dîdo dîdo, sîsê sîsê, çar çar,

Pirtûkan dîdo dîdo belav bike

Tvingan yek yek, berikan sed sed bîde hevalan

Jîbo têngîhana qenc, daçaka "û" yan ji "bî" lî navber herduwan
têne danin:

Çar û çar, pênc û pênc, dîdo û dîdo, neh û neh

Yek bî yek, sîsê bî sîsê, deh bî deh, şeş bî şeş

Sêvan panzdeh û panzdeh bîdîn qutabiyan

Koledarên xwinmij bist bî bist qewîrîn

Carna bî hejmara pêşîve "e" yek tê danin û wlo dibe:

Çare çar, hefte heft, dehe deh, sede sed

Pêşmerge dehe deh çûne şerê serxwebûnê

Lê bî mîn be ev "e" dê neyê xebitandin, lewra jî "e" ya ebadê
heyberan nayê nasîn. Mina ku dibêjin ev xani dehe deh, ev pirtûk
bistûyeke şanzdeh.

77. Lî hev xîstîn: Gava du hejmar lî hev bîne xîstîn lî nav ber
her du hejmaran hokera "car" cda tê danin:

çar car çar, heft car pênc, şeş car heşt

"r" ya car dîkare bikeve "ca" tenî bîmine: Sê ca şeş bête xebî-
tandin

Balakêş: Ev mjar geleke ne jî rengdêrên hejmariyên beşdaribîn
lê jiber ku hîndekan jê pejirandine, me jî lî vîr nvisand.

Bî ser çîyan ketim ez, karê mîn bez û rev

Cî nine têda rûnîm, ne bî roj û ne bî şev

Chê bav û kalê mîn, bî xwîna mîn bûye sor

Dijmîn iro têdaye, dibêje mîn tu derkev

Bûye sî sal dînalim, brîndar û perişan

Hê jî nûve brînê qemişk, girt û gha hev

Berî bîbîm brîndar, xwedî dost û mrovbûm

Lê iro mame tenha, bê zman û bêdev

Zvîstane nîkarîm, bî dijminra bîkîm şer

Pûk û berfê dagirtin, gelî derbend û bandev

Vaye bahar bı xêr tê, xwe kar bıkın jıbo şer
Êriş bıkın neyaran, weki mêr hemi tev
(Cigerxwin)

WANE XIII

RENGDÊRÊN ÎŞARKÎ

78. Rengdêrên îşarki: Ev rengdêr lî pêşî nava nê cda tene danin û bî îşaret heyinan jî hev kîşş dîkîn.

Dî daneka cinavkên îşarkîda hatibû dabas krîn ku cinavkên îşarki û rengdêrên îşarki yekî (lî daneka 57 an binêrîn). Gava ciyê nava bîgîrîn cinavk û gava heyinan kîşş bîkîn rengdêrîn. Vaye lî vir rengdêrîn. lewra heyberan kîşş dîkîn.

Jîbo yekaniyê nêr "vi, wi" û jîbo yekaniya mê "vê, wê" tene bîkaranin.

Rengdêrên îşarki evin:

Desta ev **Desta vi**

Jîbo heyinên nîzîk: ev vi, vê, van

Jîbo heyinên dûr : ew wi, wê, wan

Bîkaranîna van rengdêran:

Ev axa stemkare, ew karker emekdare

Vê qelemê name nvisand, vi çovî serê zorker şkand

Wê mamostê ders da, wi şvânî pez çêrand

Van mjokeran gel û karker şewitandin

Wan emekdaran gelê bîndest parastin

Praniya desta "ev bî lêkerane:

Yekani

Prani

ev mrov qence

ev mrov qencin

Ew suxte çû dbîstanê ew suxte çûn dbîstanê

Ew hat

ew hatin

Gava rengdêrek ji desta "vi" bî navê nêrên xwesera ji bêne bîkarin, nav "i" ya qertafa nêrêni dîgire. Mina:

Vi Şoreşi, wi Mirzayi, vi Azadi, wi Reşoyi

Vi Şoreşi pirtûk da min, wi Mirzayi gel şiyar kir

Jibo xwerû û zelal krîna rengdêrên îşarki, lî pîştî navan cda daçek a "ha, han" têne danin:

Ev mrovê ha, ev mrovê han, ev mrovên han

Vê keçîka ha, vê jna han, van stemkarên ha

Wê xatiya han, wi xali han, wan axayên han

Çi hate serê gelê Kurd ji van şêxê han hat

Dî hevokekda gava navek bî desta "ev" îşaret krî bibe kirde, serve ji yê desta "vi" îşaret krî dibe û gava navek bî desta "vi" îşaret krî bibe kirde, serve ji yê desta "ev" îşaret krî dibe:

Ev karker vi kari dîke, vi camêri ev mjoker quta

Ew xweşmêr vi xwinmîji dajo, wi xwinmîji ev gel mêt.

RENGDÊRÊN PÎRSIYARÎ

79. Rengdêrên pîrsiyari: Ev rengdêr navan bî pîrsiyari kîfş dîkîn. Rengdêrên pîrsiyari evin:

Bê zayend: çend, çî

Mê: kêj, kêjan, kêjkan

Nêr: kij, kijan, kijkan

Dî mjara cinavkên pîrsiyarida hatibû dabaş krîn ku hinde cinavkên pîrsiyari, dî eyni gavêda rengdêrên pîrsiyarine ji (lî 57 an binêrîn). Guhertîna wan ewe ku, cinavk ciyê navan dîgîrîn, Rengdêr ji navan kîfş dîkîn. Vaye ev rengdêr bî pîrsiyari navan kîfş dîkîn.

Rengdêrên pîrsiyari, bê daçek û qertaf hema wsan rût cda lî pîştî navan têne danin. Wekok:

Çend karker hatin? çî xebat krîn?
 Dî karxanêda çend şagirt dixebitin?
 Kij mrovê nan xwar? kêj keçik hat, kêjan keçe?
 Kêjan pirtûkê jibo te binim?
 Tu dabaşa çî şeri diki? te çî kes dit?
 Kêjkan keç rinde? kijkan gerdo pîr xwinmije?
 Gava jî rengdêrên pîrsiyari "kij" bî navên nêrên xwesera jî bên
 "î" ya nêrîni yê tewangê dîgîrîn
 Kija Azadi pirtûk da te? kijan Reşoyî tu şandî
 Kijan Mirzayî dijminê vegirtox raqewîrand

RENGDÊRÊN NEKÎFŞÎ

80. Rengdêrên nekîfşî: Ev rengdêr ewayek ne kîfşî, heyin û kesen didin terîf krîn.

Hinde jî rengdêrên nekîfşî yê nî pîr têne bikaranîn evîn:

Pîr, tu, her, flan, zehf, gelek tev, hemî, hewqas

Hêç, qet, hne, hinde, gî, gîşk, çendek, bêhvan, çend

Rengdêrên nekîfşî cda lî pêşî navan têne danîn û herîyek ewayê xwe heyinan didin terîf krîn.

Bikaranîna rengdêrên nekîfşî:

Pîr mrov hatin, tu kes ne hat, tu merîf nayê

Her jî nîkare xwarinê bîpêje, zaf keç nacewîtin

Flan keçê name nvisand, bêhvan kurî ne nvisand

Zehf pêşmerge çûn gelek xwinmij telîfandî

Tev leşkerê gel hat, hemî mrov çûne mala xwe

Hewqas karker hene, hêç şêx û axayên qenc tune

Qet kes raneket, hne mrov xwe nanasîn

Hinde cotyar hêj şiyar nebûne, gî karker başîn

Gîşk cotyar dê şiyar bîbîn, qet kes arî ne kîr

Çendek qutabî lî danoşka dirokê gelek qenc dixwinîn

PÊKHATINA RENGDÊRÂN

81. Pêkhatîna rengdêran: Bihîrîyariya hinde rengdêran, bî tîpa

serê rengdêranve zeliqandana tevineka "ip" û zeliqandana wan lî pêşiya rengdêranve bihtiryari pêktê. Wekok:

Sipsor, sipsîpi, zîpzer, kîpkesk, hîphîşin
Rîpreş, qîpqemer, qîpqîç, dîpdîrêj, tîpteng
Şîpşîl, gîpgerm, sîpsar, cîpcemîdî, tîptarî
Rîpronahî, şîpşîrin, tîptelh, tîptîj, kîpkîn

Bîqertafa "îk, ok, kok" pçûk krîna rengdêran:

Sorîk, zerîk, reşîk, keskok, hşînok, reşkok
Drêjok, knîk, zerkok, pçûkok, xweşîk, gewrîk
Şêrinok, tehîk, gîvrok, belemekok, qemerok

jîbo rengdêrên dengdêr qedayî "lok" tê bikaranîn:

Spîlok, narîncîlok, ronahîlok

Bî qertafa "ve" reng hîndîk krîna rengdêran

Sorve, zerve, keskve, hşînve, reşve, qemerve

Pçûk krîna rengdêran bî têgîhana kêf jêra hatinêye jî.

RENGDÊRÊN HEVEDUDANÎ

82. Rengdêrên hevedudani: Bî heve danîna du navan, nav û rengdêrek, nav û lêkerek, daçek û navek, nav û qertafek, hejmar û qertafekve pêktên. Wekok:

Dranpola, desthesîn, lîngdar, serzêr, pozberan
Sermezîn, devnerîm, pîştîşk, malmezîn, çavpehn
Dîlmîrî, dîlşkestî, çavtîrsay, lêvdeqandî, guhbîrî
Bêkes, bêkar, bêmal, bêmejî, bêwar, bêkêr, bêwec
Bîdar, bîçek, bîdîl, bîkêr, bîken, bîweş, bîderd
Dewlemend, hnermend, serbest, kemerbest
Nekar, nexweş, nemêr, neqenc, nebaş netu
Çargurçîk, şeştîlî, çarçav, duserî, yekdîl

Bîkaranîna rengdêrên hevedudani:

Reşoyê Sermezîn, koledarê çavpehn, mênîkê dest vala
Soroyê bêkes, Axayê bêmejî, Azadê bîçek
Mirên neqenc, şêxê netu, burjuwayê dewlemend
Karkerên hnermend, gelê serbest, girtiyê pêbend
Pêşmergê dranpola, karkerê desthesîn, keça serzêr

xortê pozberan, mjokerê lingdar raqewırand
Salarê dılmırı, Şêrina dılşkesti, Mirzayê guhbırı
İboyê lêvdeqandi şerê axayê çavtırsayi dıkın
Azadê Serbılınd, Zerifa Çargurçık, Znarê şeştılı

Singê sêçiq naçe erdê

(gotına mezınan)

PARÇEK XWEDINÊ

Dabaşa gelê bındest û xwinmıjan.

83. Bındesti û serdesti: Lı navber kesên nivekarê jinê, dı vê Cêhanêda dabaşek pır mezıne. Mjokerên Dnê tevê hinde zorkerên welatan, dıvên bındesti her hebe û bındest ji tım hebın; da parçek xwına wan bımıjın, wan bıfiroşın, malê wan bıxwın û bıhıncırın. Van rengmırovan qe navên ku gelên bındest şıyar, xwedınav, xwedışan, xwedi mafe û xwedızıman û dirok bı.

Lê belê pêşberê van zordestan kesên mrovin, azadihebin, aştıxwaz û komalı ji henın ku wekhevi û jına mrovani dıxwazın. Dı navber van herdu bendanda tımotım têkoşerek mezın heye.

Zordestên her welati hergav ji mjokerên Dnê ferman dıgırın; taktik, lêp, gelş û fêlbaziyan ji wan hin dıbın û lı ser rêça wan dıçıne van gelên reben. Ev xwinxwarên çepelên mrar û kapûsa gelên belengaz, mest û jar navên ku bındest, zana û şıyarbın, belê dıxwazın xwedıneyar, perçiqi, bêkêr, bêkar, nezan û bêyarbın.

Refa serdest yê gelê Kurd, destık û hestikojê dıjmin, şêx, beg û axane. Wan revda gurên devbıxwın, dûvê dıjmin, stemkarê bê wıjdan, çendi û çend salın ku ev koma dılpaqıj û bê xwedi dotıne, xwin ji wan mêtıne, perçiqandi û bê mafe hıştıne. Bı hevra dıjmini, dıl nexwazi, dexesi û nezani berê çandına lêpê wane.

Kurd û Kurdıstan ji mêjdaye, bı arikariya refa serdest dı bı destê dıjminıda maye. Ev refa serdest, pzo jıbo dıjmin maşe, ariker û dest û pêne. Çı sodretek mezıne ku xwin û goştê van nemerdan, text, rext, kêf û jına wan ji jı Kurdane. Belê dıjmini û ziyana mezın disa ji destê wane. Ew şahın, perlementerın û paşane. Em ji dı welatê xweda bırcı, gede, bendewar û bê warın.

Brano! pîsmamno! hevalno! ma ne bese? Divê em ji êdi şiyar, têgîhişti, jir û zanabîn, da ku bîşên dost û dijminê xwe bînasîn. Geli xwişk û bran! maqey hûn nîzanîn ku gel û netewe bî zman, çand, dirok, pişe û bî berkêşanê lî pêyan dîmine?

Lî ser me peymanbe jî vir paş jî hevra qenc, dîlsoj, mîhrivan, dlovan, bî zman û bî dirok xwe bîdîn diyar krîn. Jîbo azadî û serbestiya gelê xwe, bî çek û karobar van dijminên qerêj raqewirînin. Eger em dî vê rêya handa bêne kuştin jî ne xeme. Lewra jî berida "rêya azadî bî xwîna şehîdan ronî dibe" dîbêjin.

WANE XIV

LÊKER

Gringiya zmên:

84. Gringiya zmên: Bra ew siyaseta ku çi hundır çî ji derveyê welatda, gelek caran bî fortan têtê krîn, jê çu eqilê min nabire. Jî-ber hingê ji dibe ku ditîna gelek mrovanda pçûk xwiya dibe lê min wek karek bîngihin berî her tîştî hin bûyîna Kurdi girtîye ber çavên xwe.

(Dr. Seid Şvan)

Nvisandîna jorin gringiya zmên dînimine.

Vekirîn:

Lêker: Dî nvisandîna jorinda "têtê krîn, girtîye, dibe" diborîn, ew peyv lêkern. Yek ji "nabire" heye, ev peyv ji dî drûva neyinida lêkere. Lewra ev peyv bzavê dîdîn diyar krîn.

Ew peyvê ku heta nha hatîne ditîn (nav, cinavk, rengdêr) heke têra axaftîne bîkîra, lêker ne dîxwestîn. Ew peyv tenî heyinan dîdîn diyar krîn. Bî heyin diyar krîne hevok pêknayên. Hevok pêkneyê, hev serwext krîn çênabe. Jîbo pêkhatîna hevokan, krîn û bûyin ji dîxweze. Vaye lêker, krîn û bûyinê dîdîn diyar krîn.

Ew peyvên bûyin yan jî krînen heyinan bî tîklaya kesane dînav

deman da yan ji bî xwestinê bîdîn diyar krîn, jî wanra lêker têne gotin.

Lêker jî qurmê raderanin û gorê dem û kesan têne kêşan:

Ez	dîxwim	dema nho
Mîn	xwar	dema bori
Ezê	bîxwim	dema bê
Ez	bîxwim	xwestin
Tu	bîxwe	ferman

Dî hevokanda peywîra lêkeran pêxistîye.

CELEBÊN LÊKERAN

85. Gorê çêbûnên xwe lêker dîbîn çar bîr:

- A- Lêkerên bînyatî
- B- Lêkerên çêkirî
- C- Lêkerên qertaf
- D- Lêkerên hevedudanî

A- LÊKERÊN BINYATÎ

86. Lêkerên bînyatî: Ev lêker dî nav xweda dîbîn du beş: a- Lêkerên xwerû. b- Lêkerên kêr.

87. a- Lêkerên xwerû: Ev lêker jî qurmê raderên bhîstî çêdîbîn û şxwe çêkîrîne jî. Jîbo hêsanî fehm krînê, emê qertafa rader jî bî wanve danin. Qertaf "în, n" ye

Kolan, hîzîrîn, ketîn, dan-dayîn, çînîn, bjartîn

Danîn, ponîjîn, xwarîn, şûştîn, dotîn, pehtîn

88. b- Lêkerên kêr: Ev lêker bê raderîn.

Demên bori jî lêkerên kêr nayên kêşan. Pêxwe lêkerên fermanîne. Ewên jî qurmê lêkera fermanî têne kêşan, ew tenî jî lêkerên kêr têne kêşan. Qasî hatîne tesbît krîn heft lîbîn, ew jî evî:

wer	her	ê	bêj	vê	în	bin	
wer	her	bê	bîbêj	bîvê	bin	bîbin=	ferman
were	here	bê	bîbêje	bîvê	bîne	bîbine=	ferman
hat	çû	hat	got	vi	anî	dit=	dema bori

Ev herdu celebên lêkeran (xwerû, kêr) bê qaydene, hin bûn bi bhistinêye

Hinde herêm lêkera "in" tam dipejirinin, radera wê "inan, inandin" dibe û jê gişk raweyan ji dîkêşin: ina, inand, inaye, inandiye, inandibû..

B- LÊKERÊN ÇÊKIRÎ

89. Lêkerên çêkiri: Lêkerên çêkiri di hêmanê xweda ne lêkerin. Bî qaydan ji peyvên curê navan tene çêkirin û dibin lêker. Hinde lêkerên kurdi yê çêkiri ji peyvên biyani ji hatine çêkirin. Ew peyvên biyani yan navin yan ji lêkerin lê bi navki ketine zmanê me.

Jiber ku ev beşa lêkeran tene çêkirin, bi destûra we emê hinde zêde li ser rawestin.

Gelek celebên lêkerên çêkiri hene, Qasi heta nha me kariye bi-senifinin, dîkarin di sê celebenda vekitinin:

- a- yekite û li pê dengdêrê bêdeng
- b- yekite û li pê dengdêrê du bêdeng
- c- pirkite

90. a- Yekite li pê dengdêrê bêdeng: Di hundirê vê celebêda tu guhertin çênabin û di tentêla xwe yê rûda him nav û him ji lêkerin. teni "bî" ya daçeka fermani li pêşi, jibo nermayi û domandina fermani ji "e" yeki li dawiya yekaniyanve tene danin. Mina:

Nas binas binase
kel bikel bikele

Li dawiya van peyvanve danina dengdêrek him qurmê lêkerê û him ji kêşana yekaniya sîsêyan ya boriya têdayi tê hmatê? Ew dengdêr ji ya hinde peyvan "a" ye. Mina: Teq teqa, deq deqa, dax daxa û ya hindekan ji "i" ye. Mina: Bez bezi, rev revi, bir biri... Hinbûna van tipan (yani kêjan peyv kêjan dengdêrê digre) bi bhistinêye. Hinde peyv ji hene ku hinde herêm bi "a" yê, hinde herêm ji bi "i" yê bikartinin. Mina:

Kel kela keli, rik rika rki, hûr hûra hûri

91. b- Yekite û li pê dengdêrê du bêdeng: Ev celebên peyvan bi

hnek guhertınan lêker pêktên. Guhertın ji ewe ku lı navber herdu bédengan dengdêra "ı" tê danin. Vi ewayi lêkera fermani tê hmatê:

Bırq bırq bıbırq, xeml xemıl bıxemıl

Pışti pêkhatına lêkera fermani, lı dawiya peyvanve danina qerta-fa "i" qurmê lêkerê tê hmatê: Bırqı, xemılı, tewızı, kevílı...

Awerteyi "ı" ya lı pêşi ılım dıbe "e" ılm elım, elımı, dıelıme...

92. c- Pırkite: ev celebên peyvan, hnek jê dıguherın û hnek ji wek xwe diminın. Heke dengdêra kita dawı "ı" be, bê guhertın hım nav û hım ji lêkera fermaniye: Rcıf, fetıl, feşıl û heke dengdêra kita dawı ne "ı" be, çı dıbe bla bıbe, dıbe "ı" hınga nav dıbe lêkera fermani. Weki: Cemed cemıd, bzav bzıv, lepat lepıt...

Balakêş: Peyvên ku bı du bédengan destpê dıkın û gava kitek bıkeve pêşi wan, eger navber herdu bédengan dengdêra "ı" bıgırın ji pır kitan têne hejmartın. Weki: Rcıf dırcıfe bırcıf, bzav bzıv dı-bızıve bıbızıv

Pışkdariya yekita lı pê dengdêrê du bédeng û pırkitan:

93. Dı van herdu celebada ji danina "bı" ya daçeka fermani kêfiye lê danin çêtıre. Jıbo domandın û nermaya fermanê lı dawiya yekaniyanve danina "e" yê peywıstiye. Weki

Fetıl bıfetıl, fetile bıfetılê, bzıv bzıvê, bıbızıv bıbızıvê, xemıl bıxemıl, xemılê bıxemılê...

Jıbo pêkhatına qurmê lêkerê û lêkera bori, qurmê fermana herdu celebave ji "i" yek tê zeliqandın. Mina: Fetılı, xemılı, bzıvı, betılı...

Pışkdariya gelemperi:

94. Bı çı ewayê dıbe bla bıbe û kijan celeb ji dıbın bla bıbın gava ji lêkerên çêkırı qurmê lêkera fermani pêkhat, weki lêkerên edeti rê dıdın gişk kêşan, rawe û raderan, heke nedervazi bıın rê dıdın dervazi krınê ji (lı 107, 110 an bıınêrın). Lı van tabloyan ji bıınêrın:

TABLO 1.

Balakêş: Dı lêkerên fermanida lı tabloyê, emê "bı" û "e" ya fermani bıınvısın.

Nav	Ferman	F. dervazi kri	D. bori	B.D kri
Deq	bıdeqe	bıdeqine	deqa	deqand
Nas	bınase		nasi	
Kel	bıkele	bıkeline	kela, keli	keland
Êş	bêşe	bêşine	êşa	êşand
Dız	bıdıze		dzi	
Şop	bışope	bışopine	şopa, şopi	şopand
Ken	bıkene	bıkenine	keni	kenand
Dema nho		N.dervazi kri	Rader	R. dervazi kri
Dıdeqe		dıdeqine	deqan	deqandın
Dınase			nasin	
Dıkele		dıkeline	kelan, kelin	kelandın
Dêşe, têşe		têşine	êşan	êşandın
Dıdıze			dzin	
Dıkene		dıkenine	kenin	kenandın
Dışope		dışopine	şopan, şopin	şopandın

TABLO 2.

Nav	Ferman	Fermana dervazi kri	Dema bori	Boriya dervazi kri
Xeml	bıxemile	bexemiline	xemili	xemiland
Bırq	bıbırıqe	bıbırıqine	brıqi	brıqand
Peyv	bıpeyive	bıpeyivine	peyivi	peyivand
Tewz	bitewize	bitewızine	tewizi	tewızand
Derz	bıderize	bıderızine	derizi	derızand
İlm	bıelime	bıelimine	elimi	elımand
	Nhoya		Radera	
Dema nho	dervazi kri	Rader	dervazi kri	
Dıxemile	dıxemiline	xemilin	xemilandın	
Dıbırıqe	dıbırıqine	brıqin	brıqandın	
Dıpeyive	dıpeyivine	peyivin	peyivandın	
Dıtewize	dıtewızine	tewızin	tewızandın	
Dıderize	dıderızine	derızin	derızandın	
Dıelime	dıelimine	elimin	elımandın	

TABLO 3.

Nav	Ferman	Fermana dervazi kri	Dema bori	Boriya der- vazi kri
Rcîf	bîrcîfe	bîrcîfine	rcîfi	rcîfand
Fetîl	bîfetîle	bîfetîline	fetîli	fetîland
Bzav	bîbîzîve	bîbîzîvine	bîzîvi	bîzîvand
Cemed	bîcemîde	bîcemîdine	cemîdi	cemîdand
Lepat	bîlepîte	bîlepîtine	lepîti	lepîtand
Kevel	bîkevîle	bîkevîline	kevîli	kevîland
Nhoya				Radera
Dema nho	dervazi kri	Rader		dervazi kri
Dîrcîfe	dîrcîfine	rcîfin		rcîfandîn
Dîfetîle	dîfetîline	fetîlin		fetîlandîn
Dîbîzîve	dîbîzîvine	bîzîvin		bîzîvandîn
Dîcemîde	dîcemîdine	cemîdin		cemîdandîn
Dîlepîte	dîlepîtine	lepîtin		lepîtandîn
Dîkevîle	dîkevîline	kevîlin		kevîlandîn

Hinde nav ji hene ku bêdengêk bi wanve girtîye û bûne lêker.
Ew ji di tentêla xwe yê rûtda him navîn û him ji lêkera fermanine.
Paşî bêdeng wanve girtîne û bûne qurmê lêkerê û rê dîdîn gişk
kêşanan ji. Weki

Gez gezt, geztîye, geztîbû, dîgeze, dê bigeze

Leyiz leyizt, leyizîye, dîleyize, dê bileyize

Ev cura lêkeran herçiqas ji lêkerên xwerû dixwiyên ji lê bê gu-
man lêkerên çêkîrine.

Balakêş: Zmanê meda hindîk nav hebûne ku di demên kevînda
lêker ne bûne. Ew lêker berebere helane û bûne nav. Vaye ew na-
vîn ku bûne lêkerên çêkîrî û dîbîn ji. Lewra tê gotin; Di zmanê me-
da hindîk nav hene ku bi qaydên lêkerên çêkîrî nebîn lêker.

C- LÊKERÊN QERTAF **Qertaflêker**

95. Qertaflêker: Ev lêker her weki qertafekê edatî li dawîya
navdêranve dîgîrîn, dîbîn lêker û cinavkan ji dînimîn. Gava li da-
wîya lêkeranve bîgîrîn tenî cinavkîn. Nexu ji vanra qertaflêker û

qertaſcinavk bête gotin çêtire. Dîvê neyê jî bir krîn ku qertaflêker qertaſin û qertaſ jî bî tu ewayî jî peyvân (navdêr û lêkeran) cda nayên danîn. Şxwe navên wan jî lî sere: Qertaflêker. Belê lêker pxwe jî navên cda têne danîn.

Curên qertaflêkeran

Yekani

Kes 1. im, m, yim, me, bûm, bûme

Kes 2. i, y, bûy, bûyi

Kes 3. e, ye, bît, bûye

Prani

Kes 1. n, in, yin, in, yin, bûn, bûne, ne, nîn

Kes 2. n, in, yin, ne, nîn, bûn, bûne

Kes 3. n, in, yin, ne, nîn, bûn, bûne

Ew "y" ya tenî hati danîn ne tîpa kelîjandînêye. Ew qertaſcinavka yekaniya duweme û jî lêkerên dengdêr qedayîra, mîna çûy, bûy, beziy têne bikaranîn. "y" yê dîn tîpên kelîjandînêne û "in, yin" dî devoka Buhtidane.

Qertaflêker dî hevokên navdêrî (lêkera bûn) da ciyê lêkeran dîgîrîn, dîbîn pêxîstî û cinavkan jî nişan dîdîn. (lî 62 an bînêrîn) Dî hevokên lêkerîda ciyê cinavkan tenî dîgîrîn

Ev qertaſên han lî hemî dem û raweyên lêkera bûn, lî hemî dem û raweyên lêkerên ne dervazî jî bîl yekaniya boriya sîsêyan û dema nho û bêya lêkerên dervazîve têne danîn. Wekî:

Navdêra dengdêr qedayî: pêşmergeyîm, pêşmergeyî

Navdêra bêdeng qedayî: şoreşîm, şoreşgîrî, Kurde

Lêkera dengdêr qedayî: Jîm, qerîmîy, razayî

Lêkera bêdeng qedayî: hatîm, ketî, dîkîrî

Danîna cinavka praniya dudan peywîstîye. Lewra qertaſcinavka dudan û sîsêyan (in, in) yekî û bê cinavk jî hev nayên nasîn. Wekî: Hûn hatî, hatî. Jî bîl devoka Botî danîna cinavka praniya yekî jî peywîstîye. Dî lêkerên borîda qertaſcinavka yekaniya sîsêyan tune. Şxwe qurmê lêkeran raweya yekaniya sîsêyane.

Heke lêker bî dengdêra "î" bîqede, dî devoka Buhtîda jî, dîvê cinavka praniya yekî jî bête danîn. Wekî: Em bezî, em revî, em kenî

WANE XV

D- LÊKERÊN HEVEDUDANÎ

96. lêkerên hevedudani: Ev lêker dî nav xweda dîbîn heşt beş:

- | | |
|----------------------------|------------------------|
| a- Daçekî, paşdaçek | : <u>R</u> akırîn |
| b- Arikêr (navdêrî) paşnav | : Ava krîn |
| c- Karinî, paşlêker | : Karin krîn |
| ç- Qat dervazî, paşlêker | : Dan krîn |
| d- Tebatî kri, paşlêker | : Hatûn krîn |
| e- Raweyî, paşlêker | : Kribûn |
| ê- Zvîrî, paşcinavk | : Lî xwe krîn |
| f- Hevayî, pêş û paşcinavk | : Ketûn hev, hev ketûn |

Bî vê ewayê û tê bête vekitandin ji, lêker lî paşî daçek, nav, lêker, hinde cinavkan û lî pêşî û paşî hinde cinavkan têne danin û lêkerên curbecur pêktên

97. a- Lêkerên hevedudaniyên daçekî: Ev lêker bî daçekan pêktên û lêker bî daçekanve têne danin. Neyinî ji dîkev navber daçek û lêkeran gişk pêve dîgîrî. Wekî:

Rabûn, hlanîn, vekîrîn, wergirtîn, derketîn, dadan

Ranêbûn, hîlnedan, venekîrîn, wernegirtîn, derneketîn

Hinde nav hene carna wekî daçekan, dî lêkerên hevedudaniyên daçekîda têne bîkaranîn. (Lî mjara 219 an bînêrîn) Wekî:

Hin hinkırın, ber berketın, ser serketın, der derdan

98. b- Lêkerên hevedudaniyên ariker (navdêri): Ev lêker ji navek û ji lêkera "kır, da bû tê hmatê. Lêker cda lı dû navan têne danin. Nav mina xwe dîminin. Lêker gorê dem û kesan têne kêşan. Weki:

Dar kır, dar dıke, dar dıkım, hin bû, hin dıbe, dê hin bıbe
av da, av dıde, av dıdı

99. c- Lêkerên hevedudaniyên karini: Ev lêker bı lêkara karin, kanin û şeyinê pêktên. Dıvê bête zanin ku karin, kanin û şeyin devokên herêmanin. Yani jibo karinê çı bête danin, jibo kanin û şeyinêye ji

Karin, gorê dem û kesan tê kêşan û dıkeve pêşi lêkerekê gorê dem û kesan kêşandi. Vê awayê lêkerên curbicur têne hmatê. Herdu lêker ji hev cda têne danin. Weki:

Karin kırın, kari kır. Dıkare bıke, dê bıkare bıke
Karin ne kırın, kari ne kır, dıkare neke, dê bıkare neke
Ne karin kırın, ne kari bıke, nıkare bıke
Bıkare meke, mekare bıke, mekare meke

Balakêş: Dıtın zanin, xwestın, wêrin û vên ji mina lêkera "karinê" cda têne pêşi lêkeran, heryek têgiha xwe dıgırın. Xwe zayi ev ji mina lêkera karinê têne kêşan û dıkevıne pêşi lêkerên kêşandi. Mina:

Zani bri, dızane bıbire, dê bızane bıbire
Xwest şand, dıxwaze bışine, dê bıxwaze bışine
Wêri çû, dıwêre bıçe, dê bıwêre bıçe
Vi çêkır, dıvê çêke dê bıvê çêke
Ne zani bri, nızane bıbire, dê nezane bıbire

100. ç- Lêkerên hevedudaniyên dervazi, qat dervazi, dubare dervazi: Ev lêker ewın ku, kırde pxwe nake, bı yekê dın dıde kırın. Kırde pxwe dıke, yani dervazi, mın kır, te bri, wê frot, wi şand. Kırde bı yekê dın dıde kırın, yani qat dervazi, dubare dervazi: Mın da kırın, te da frotın, wê da şandın. Ev pêkhatın bı arikariya lêkera "dan, da" dıbe. Lêkera "dan" gorê dem û kesan tê kêşan, lı pêşi raderên dervazi yan ji dervazi kır cda tê danin û lêkerên hevedudaniyên dervazi têne hmatê. weki:

Dane xwarın, Mın da xwarın, ez dıdım xwarın

Dane kenandın, mın da kenandın, ez dıdım kenandın
 Ne dane kuştın, mın ne da kuştın, ez nadım kuştın
 Dê bide xwarın, dê bide kenandın, dê nede kuştın
 Dê nede xwarın, dê nede kenandın, dê nede şandın
 Bide xwarın, bide kenandın, bide şandın
 Mede kuştın, mede xwarın, mede şandın

Lepat (aktif) iya lêkeran: Cur û drûvên lêkeran çı dıbin bla bı-
 bın gişk lepatinin, jıber vê yekê le ser rawestan naxwaze. Tebatiya
 lêkeran bı vê ewayê jêrin pêktê.

101. d- Lêkerên hevdudaniyên tebatî (pasîf): Ev lêker bı arikari-
 ya lêkera "hatın, hat" pêktê. Lêkera "hat" gorê dem û kesan tê
 kêşan, lı pêşi raderên dervazî yan jî dervazî kri, cda tê danin. Bı vê
 tentêlê lêkerên hevdudaniyên tebatî têne hmatê. Mina:

Hatın kuştın, hate kuştın, hatiye kuştın, tê kuştın
 Hatın brin, hata brin, hatiye brin, tê brin
 Hatın revandın, hate revandın, tê revandın
 Ne hatın dotın, ne hate dotın, nayê dotın

Dema bê

Blani

Dê bête kuştın

bla bête kuştın

dê bête krın

bla bête krın

dê bête revandın

bla bête revandın

dê bête bezandın

bla bête bezandın

Dê neyê dotın

bla neyê dotın

Gava bı hevokan bête bıkarandin, bı vî ewayî jêrin dıbe

Lepati

tebatî

Reşo xebiti

Reşo hate xebitandın

Bêrivan revî

Bêrivan hate revandın

Zerifê xemiland

Zerifê hate xemilandın

Koledar kuştın

Koledar hate kuştın

Jıbo hınbûna refa perçiqî û gelê bındest Azad hate şandın

 Ez tême kuştın lê nayême tewandın

(Gotina mezinan)

Dı lêkerên tebatida kırde ne kıfşene. Lewra jî wanra "kırde nay-
 nas" jî tê gotin. Eger bîvênevê kıfşkirina kırdan bıxwaze "jî alî, bı

desti" têne danin lê disa ji nabîn kirde. Mina:

Lepati:

Pêşmergan koledar kuşt

Şoreşvanan gel rîzgar kîr

Tebati

Jî alî pêşmerganve koledar hate kuştin

Bî destî şoreşvanan gel hate rîzgar krîn

102. e- Lêkerên hevedudaniyên raweyî: Ev lêker, bî dawîya lêkeranve danîna lêkera "bû, be" pêktên. Lêkera "bû, be" lî dawîya lêkerên kêşandîve tê danîn, çirokiyên pêşkerî, çirokiyên daxwazî û hinde raweyên daxwazî çêdibin. Wekî:

Hatîbû, hatîbûye, dîvê hatîbûya, bla hatîbûya

Hatîbe, ku hatîbe, dîvê, hatîbe, bla hatîbe

Dîzanîbû, dîzanîbûye eger dîzanîbû

103. ê- Lêkerên hevedudaniyên zvirandî: Ev lêker, cda danîna lêkerê kêşandî lî dawîya cinavka "xwe" pêktê. Jîber ku bîzav dîzîvîre lî ser kirde, yanî kirde pîxwe dîkeve tesîra lêker, lema jî wanra lêkerên hevedudaniyên zvirandî tê gotîn. Carna, yanî di hinde kêşananda daçekî "lî" lî pêşî cinavka "xwe cda tê danîn. Mina lî xwe

Lî xwe krîn, lî xwe kîr, lî xwe kriye, lî xwe dîke

Xwe hejandîn, xwe hejand, xwe hejandîye, xwe dîhejîne

Xwe ne hejandîn, xwe ne hejand, xwe nahejîne

Dê lî xwe bîke, dê xwe bîxemîline, dê xwe bîşû

Dê xwe nehejîne, dê xwe nexemîline, dê xwe neşû

Bla xwe bîhejîne, bla xwe nehejîne, bla xwe neşû

Xwe bîxemîline, xwe bîhejîne, xwe mehejîne

Çawan lî jorîn jî dîxwîyê ku daçekî fermanî, daçekî dema nîha û daçekî neyênî dîkeyîne berî lêkeran.

104. f- Lêkerên hevedudaniyên hevayî: Hev, cinavka du kesane. Yanî yek digeri, yek êdîn, hevî a bûnê îfade dîke. Lewra jî wanra lêkerên hevedudaniyên hevayî tê gotîn.

Di hinde celebên kêşananda lêkera kêşandî cda lî paşî cinavka "hev" û di hindekanda jî lî pêşî disa cda tê danîn û carna daçekî "bî" lê tê zêde krîn. Mina:

Bî hevî çûn, lî hevî hatîn, destê hevî girtîn

Kêf xweşi dane hev, lî hev ketin, ketin hev
"Bî" dîkare dengdêra xwe bêxe û bibe "p", "h" ya hev jî bibe
"p" xwe lî cîyê wê dayne. Mina:

Pevra çûn, pevra hatin, pevra leyistin, pevra xwarin

Destê xwe dane hev bî hevra rabûn

Mîzgin lî dewlet rênçer şiyar bûn

(Cigerxwin)

WANE XVI

LÊKERÊN DERVAZI Û NEDERVAZI

105. Lêker gorê xebatên xwe dîbin du bîr: A- Dervazi B- Nedervazi.

106. A- Lêkerên dervazi: Lêkerên dervazi ewin ku bzav dervê kîrdêye. Yani bzav jî kîrdê dervazê servê dibe. Ev krînê lî ser servê ifade dîkin. Lewra kîrde tesîrek lî serve dîke. Wekok:

Kîrde	Serve	pêxîstî
Reşo	çek	çekîr
Zerîfê	çêlek	dot

Mîna dixwiyê Reşo lî çekê û Zerîfê jî lî çêlekê tesîrek krîne. Çêlek û çek ketîne bin tesîra bzava Zerîfê û Çeko.

Lêkerên dervazi yan dî hêmana xweda dervazine yan jî bî qaydan jî lêkerên nedervazi têne çekîrîn. Lêkerên dervazi:

Xwar, peht, kuşt, kri, frot, şand, bjart, çand, çnî
Vexwar, vekuşt, bri, şûşt, dot, mêt, rêt, xwend

107. Lêkerên dervazi kri: Ev lêker jî lêkerên nedervazi pêktên. Beşek hîndîk jî lêkerên nedervazi hene ku dervaziyên wan cîdanin. Jîber vê yekê ew nayêne dervazi krîn. Qasî ku me senîfandîye hejmarê wan lêkerên ku dervaziyên wan henîn (jî bîl lêkerên daçekî) şeş lîbîn. Xwezayî çend lîbek jî yêne daçekî hene. Jîbo wekokî du

lib lêkerên daçeki (rabû, vebû) me lı vır nvisandın, yêñ dın ji gişk min a wanın:

Nedervazi	Dervaziya wan	Nedervazi	Dervaziya wan
Çûn	şandın	ketin	xıstın, êxıst
Bûn	krın	mrın	kuştın
şkestın	şkinandın	hatın	anin
Rabûn	rakırın	vebûn	vekırın

Balakêş: Her çiqas lêkera dervazi "kuştın" heye ji carna mrın tê dervazi krın. Mina

Mrandın, mrand, mrandiye, dımırine, dê bımırine

Her çiqas lêkera "mrın" vi ewayi têtê dervazi krın ji disa qaydên me naherîfîne. Lewra dervaziya wê (kuştın) heye.

Beşa dın (graniya lêkeran ji evın) ji lêkerên nedervazi, vi ewayi têtê dervazi krın:

Heke lêker bı dengdêrê bîqede, ji bıl lêkera "grın" dengdêr jê dı-keve, bı bêdengê bîqede, wek xwe dımîne û qertafa "and" bı dawîya wanve têtê danin. Mina:

Bezi bezand, raza razand, slıki slıkand, revı revand

Rûnişt rûniştand, nvist nvistand, mır mrand

Dı lêkerên dervazi krida, qertafa raderê "ın" bı qertafa "and" ve têtê danin, bı vi ewayi radera dervazi kri têtê hmatê. Mina:

Bezand bezandın, razand razandın, slıkand slıkandın

Rûniştand rûniştandın, nvistand nvistandın

Hinde lêkerên dervazi hene ku bı qaydê lêkerên dervazi kri hatî-ne dervazi krın:

Dervazi	D. kri	Dervazi	D. kri
Bri	brand	kêşa	kêşand
Nvisi	nvisand	kola	koland
dzi	dzand	pêça	pêçand

Ev celeb dervazi krın hêç têtêgîhê naguherîne. Lewra ev celeba lêkeran şxwe dervazine. Dıxwazi bîbêje: Mın rêzıman nvisi û dıxwazi bîbêje mın rêzıman nvisand, cxare pêça, cxare pêçand, destê mjoker bri, destê mjoker brand. Herdu ji dı têtêgîh, dem û dervaziya xweda yekın û bıkaranina herduyan ji drıste.

108. B- Lêkerên nedervazi: Ev lêker ewın ku bzavê ji kirdê der-

vaz nake, serve kîrde pxweye, krînê dî kîrdeda ifade dîkîn. Jîber ku
bzav dî hawîr kîrde daye jî wanra lêkerên nedervazî têne gotin. we-
kok:

Çêra, çêrî, hewîsî, şemîrî, ket, raket, şemîti
Vezela, ponîjî, hîzîrî, bezi, şkest, xeyidî
Nalî, kalî, perçîqî, pelîxî, şewîti, vecenîqî
Lepîti, lewîti, peyîvî, xemîlî, gevîzî, tewîzî
Ga çêra, şagîrt hewîsî, çra vemîrî, Fêrîs bezi
Soro vezela, koledar şkest, zozanê me şemîrî

Çawan lî jorîn dîxwîyê ku kîrde yanî ga, şagîrt, çra, Fêrîs û So-
ro pxwe çêra, hewîsî, vemîrî, bezi û vezela. Hate zanîn ku tesîra
lêker jî kîrdê ne boriye. Bî ewayek dîn bîbêjîn serve dî nefsa
kîrdêda tê hmatê, yanî serve kîrde pxweye, bzav dî kîrdêda dîmine.

Em çend wekokek jî lêkerên dervazî binîn ku hûn dî navber
wanda kemperandî çêkîn:

Soro rê çêkîr, mamoste dbîstan xemîland, Temo dar brî
Şoreşvanan gel rîzgar kîr, qutabî pîrtûk xwend
Rewşenên welat karker û cotar şîyar krîn, dijmin
nişa wan dan û bî hevra berî xwe dane zorker û koledaran

Dî van hevokanda jî wsan xwîya ku bzav jî kîrde dervaz bûye û
tesîr ne lî kîrde Soro, mamoste, şoreşvan, Temo û rewşenaye. Tesîr
serve (rê, dbîstan, gel, pîrtûk, karker, dijmin, zorker û koledara) ye

Bî vî ewayî lêkerên dervazî, nedervazî jî hev têne nasîn.

Em hînde jî dabaş jî lêkera bûn bîkîn.

Lêkera bûn: Me got dî lêkerên nedervazîda bzav dî kîrdeda dî-
mine lê dî lêkera bûnda bûn kîrde pxweye. jîber vê yekê jêra lêkera
bûn tê gotîn:

Keçîk rînde, hîngîv şîrîne, axa welat pîroze
Karker bî hêze, koledar stemkare, gel stembare

Dema se bezi gur, gur mîr (Gotîna mezînan)
Çêlekek rêxotî garanê gişk dilewîtîne (Gotîna mezînan)

RADER

109. Rader: Çqas rader hene jî du pişkan pêktên: Qurmê lêkerê

û qertafa raderê

Eger lêker bî tîpek dengdêr bîqede, qertafa raderê "n" ye û heke bî tîpek bêdeng bîqede, qertafa raderê "in" e

Dî zmanê Kurmancida rader, Lêkera raweya prani ya dema boriya sîsêyane û qurmê lêkerê jî lêkera raweya yekani ya dema boriya sîsêyane.

Nasin û danenasina raderan:

Rader	qurmê lêkerê	qertafa raderê
Bezin	bezi	n
Revin	revi	n
Dan	da	n
Hatın	hat	in
Çêkırın	çêkır	in
Avêtın	avêt	in

Qurmê lêkerê, kêşana hemî demên bori pêktine. Mina:

Revi, revîye, revibû, revibûya, heke revibûya

Dakır, dakırîye, dakırîbû, dakırîbûye, ku dakırîbû

Pîştî zanina van, vêca em lî ser qurmê lêkeran dîkarin rawestî

QURMÊ LÊKERAN

Dî zmanê meda du celeb qurmê lêkeran hene:

A- Qurmê lêkerê

B- Qurmê lêkera fermanî

110. A- Qurmê lêkerê: çawan lî jorin jî dîxwîyê bî avêtîna qertafa raderê (n, in) qurmê lêkerê derdikeve hmatê. wekokên wê lî jorin hatine dan, êdî lî vîr naxwaze.

Qurmê lêkerê wha bî hêsanî tê nasin. Jîber vê yekê, drêj lî ser rawestan ne grînge, ya grîng nasina qurmê lêkera fermanîye.

Balakêş: Jî qurmê lêkerêra lêker, jî qurmê lêkera fermanîra lêkera fermanî jî tê gotin

Herkesê xwe wînda ne kîrî, jîbo zmanê xwe yê maderî
(zîkmakî) şer kîrîye û dîke

(Kamran Bedîrxan)

WANE XVII

PÊKHATINA QURMÊ LÊKERA FERMANÎ

111. B- Lêkera fermani: Çawan lî mjara 110 anda ji hatûbû da-baş krîn ku nasina lêkera fermani min nasina lêkerê ne hêsane.

Bî ketîna tîpek ji dawîya hinde lêkeran, qurmê lêkera fermani pêktên û hnek jê guhertinên curbecur dixwaze û lêkerên ne sazi hindik ji bin hene

Çawan demên bori ji qurmê lêkeran tene kêşan wsa dema nho û bê ji ji qurmê lêkera fermani tê kêşan. Bî çî ewayê qurmê lêkera fermani pêktê bla bê, rê dide kêşanên dema nho û bê

Lêkerên xwerûda danina "bî" ya daçeka fermani lî pêşî bî lêkerê dixwaze. Jîbo nerîmiya fermanê yê kesên yekani (jî bîl çend lêkerê) "e" yek lî dawî hemî curên lêkeranve têde danin. (lî 159 an binêrîn)

Gorê lêkera fermani, lêker dîbîn du bîr

A- Lêkerên sazi

B- Lêkerên nesazi

LÊKERÊN SAZÎ

A- Lêkerên sazi: Ev lêker ewîn ku bî ewayek sazi ji qurmê lêkerê bî qaydan qurmê lêkera fermani çêdibe

Lêkerên sazi ji dî nav xweda dîbîn çar bîr.

112. a- Bra yekem ji lêkerên sazi:

Lêker bi tipek dengdêr diqede û bi ketina wê dengdêrê qurmê lêkera fermanî dîname.

Balakêş: Jibo têgiha qenc, emê lêkerên çêkiri ji dî van tabloyan-da vekitînin. Hinga ji berevajive em dîçine lêkerên çêkiri. Yani ji lêkerê em alî lêkera fermanîve dîçin. Halkubû dî lêkerên çêkiri-da, ji lêkera fermanî alî lêkerêve rê dîçe.

a- Tablo:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerîm
Arhan	arha	arh		barhe
Barin	bari	bar	bîbar	bîbare
Betûlin	betûli	betûl	bîbetûl	bîbetûle
Bezin	bezi	bez	bîbez	bîbeze
Borin	bori	bor	bîbor	bîbore
Brin	bri	bîr	bîbîr	bîbîre
Bzîvin	bzîvi	bzîv	bîbzîv	bîbzîve
Cemîdin	cemîdi	cemîd	bîcemîd	bîcemîde
Çêran	çêra	çêr	bîçêr	bîçêre
Çîrsin	çîrsi	çîrs	bîçîrs	bîçîrise
Dan	da	d	bîd	bîde
Derîkin	derîki	derîk	bîderîk	bîderîke
Derîzin	derîzi	derîz	bîderîz	bîderîze
Dzin	dzi	dîz	bîdîz	bîdîze
Ecîbin	ecîbi	ecîb	bîecîb	bîecîbe
Elîmin	elîmi	elîm	bîelîm	bîelîme
Enîrin	enîri	enîr	bîenîr	bîenîre
Fetûlin	fetûli	fetûl	bîfetûl	bîfetûle
Geran	gera	ger	bîger	bîgere
Ghan	gha	gîh	bîgîh	bîgîhe
Herîkin	herîki	herîk	bîherîk	bîherîke
Heyîrin	heyîri	heyîr	bîheyîr	bîheyîre
Jenin	jeni	jen	bîjen	bîjene
Kalin	kali	kal	bîkal	bîkale
Kelan	kela	kel	bîkel	bîkele
Kesîpin	kesîpi	kesîp	bîkesîp	bîkesîpe

Rader	Lêker	Lêkera	Ferman	Fermana
Kêşan	kêşa	kêş	bıkêş	bıkêşe
Kezıxin	kezıxi	kezıx	bıkezıx	bıkezıxe
Kolan	kola	kol	bıkol	bıkole
Krin	kri	kır	bıkır	bıkıre
Kzırin	kzırı	kzır	bıkızır	bıkızıre
Kutan	kuta	kut	bıkut	bıkute
Lepitin	lepiti	lepit	bılepit	bılepite
Lewitin	lewiti	lewit	bılewit	bılewite
Lvin	lvi	liv	bıliv	bılive
Meşan	meşa	meş	bımeş	bımeşe
Mezıxin	mezıxi	mezıx	bımezıx	bımezıxe
Nalin	nali	nal	bınal	bınale
Nêrin	nêri	nêr	bınêr	bınêre
Nvisin	nvisi	nvis	bınıvis	bınıvise
Peyivin	peyivi	peyiv	bıpeyiv	bıpeyive
Pêçan	pêça	pêç	bıpêç	bıpêçe
Pjan	pja	pıj	bıpıj	bıpıje
Pırsin	pırsi	pırs	bıpırs	bıpırse
Rcıfin	rcıfi	rcıf	bırıcıf	bırıcife
Qefilin	qefili	qefil	bıqefil	bıqefile
Qehırin	qehırı	qehır	bıqehır	bıqehire
Revin	revi	rev	bırev	bıreve
Rjan	rja	rij	bırıj	bırıje
Rqin	rqi	rıq	bırıq	bırıqe
Şewitin	şewiti	şewit	bışewit	bışewite
Şemırin	şemırı	şemır	bışemır	bışemıre
Şeqitin	şeqiti	şeqit	bışeqit	bışeqite
Telıfin	telıfi	telıf	bıtelıf	bıtelife
Telişin	telişi	teliş	bıteliş	bıtelişe
Temırin	temırı	temır	bıtemır	bıtemıre
Terıkin	terıki	terık	bıterık	bıterıke
Teyısın	teyısı	teyıs	bıteyıs	bıteyıse
Tırsan	tırsa	tırs	bıtırs	bıtırse

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Weşan	weşa	weş	bıweş	bıweşe
Wêran	wêra	wêr	bıwêr	bıwêre
Xezıbin	xezıbi	xezıb	bıxezıb	bıxezıbe
Xerıqın	xerıqi	xerıq	bıxerıq	bıxerıqe
Zanin	zani	zan	bızan	bızane
Zelıqın	zelıqi	zelıq	bızelıq	bızelıqe
Zvırin	zvırı	zvır	bızıvır	bızıvıre

Haj: Fermaniya prani wloye: Bızıvırın, bımeşın, bıkelıjın, bıbe-
zın.

113. b-Bra duwem ji lêkerên sazi: Lêker bı tipek bêdeng dıqede
û dengdêra kita dawî ji ne "a" ye, bı ketına bêdenga dawî lêkera
fermani çêdibe:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Bıhistın	bıhist	bıhis	bıbıhis	bıbıhise
Cûtın	cût	cû	bıcû	
Geztın	gezt	gez	bıgez	bıgeze
Jendın	jend	jen	bıjen	bıjene
Girtın	girt	gır	bıgır	bıgire
Guhertın	guhert	guher	bıguher	bıguhere
Leyıstın	leyıst	leyıs	bıleyız	bıleyize
Mızın	mızt	mız	bımız	bımize
Nhêrtın	nhêrt	nhêr	bınihêr	bınihêre
Kevtın	kevt	kev	bıkev	bıkeve

114. c. Bra sêyem ji lêkerên sazi: Lêker bı tipek bêdeng dıqede
lê ew tip ne "d" ye. Dengdêra kita dawî ji "a" ye "a" dıbe "ê" û
bêdenga dawî ji dikeve:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Bhartın	bhart	bhêr	bıbıhêr	bıbıhêre
Bjartın	bjart	bjêr	bıbjêr	bıbjêre
Braştın	braşt	brêş	bıbırêş	bıbırêşe
Bvaştın	bvaşt	bvêş	bıbıvêş	bıgıvêşe

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Gvaştın	gvaşt	gvêş	bıgıvêş	bıgıvêşe
Guhaztın	guhazt	guhêz	bıguhêz	bıguhêze
Hejmartın	hejmart	hejmêr	bıhejmêr	bıhejmêre
Hnartın	hnart	hnêr	bıhınêr	bıhınêre
Kezaxtı	kezaxt	kezêx	bıkezêx	bıkezêxe
Paraxtı	paraxt	parêz	bıparêz	bıparêze
Pelaxtı	pelaxt	pelêx	bıpelêx	bıpelêxe
Qelaştın	qelaşt	qelêş	bıqelêş	bıqelêşe
Qeşartın	qeşart	qeşêr	bıqeşêr	bıqeşêre
Qewartın	qewart	qewêr	bıqewêr	bıqewêre
Quraştın	quraşt	qurêf	bıqurêf	bıqurêfe
Spartın	spart	spêr	bıspêr	bıspêre
Telaştın	telaşt	telêş	bıtelêş	bıtelêşe
Traştın	traşt	trêş	bıtırêş	bıtırêşe

115. ç-Bra çarem ji lêkerên sazi: Lêker bı tıpek bêdeng dıqede û ew tip "d" ye. Dengdêra kita dawî ji "a" ye. "a" dibe "i" û bêdenga dawî ji dıkev. Vi ewayî lêkera fermanî pêktê:

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Arhandın	arhand	arhin	barhin	barhine
Betılandın	betıland	betulin	bıbetulin	bıbetuline
Bıqandın	bıqand	bıqin	bıbırqin	bıbırqine
Cerıbandın	cerıband	cerıbin	bıcerıbin	bıcerıbine
Çandın	çand	çin	bıçin	bıçine
Çêrandın	çêrand	çêrin	bıçêrin	bıçêrine
Drandın	drand	drin	bıdrin	bıdrine
Ecıbandın	ecıband	ecıbin	bıecıbin	bıecıbine
Elımandın	elımand	elımin	bıelımin	bıelımine
Fetılandın	fetıland	fetulin	bıfetulin	bıfetuline
Guherandın	guherand	guherin	bıguherin	bıguherine
Hejandın	hejand	hejin	bıhejin	bıhejine
Helandın	heland	helin	bıhelin	bıheline
Hûnandın	hûnand	hûnin	bıhûnin	bıhûnine

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerim
Jiyandin	jiyand	jiyin	bıjiyin	bıjiyine
Kelandin	keland	kelin	bıkelin	bıkeline
Kenandin	kenand	kenin	bıkenin	bıkenine
Kşandin	kşand	kşin	bıkışin	bıkışine
Lerizandin	lerizand	lerizin	bılerizin	bılenzine
Lewitandin	lewitand	lewitin	bılewitin	bılewitine
Meyızandin	meyızand	meyızin	bımeyızin	bımeyızine
Mrandin	mrand	mrin	bımırin	bımırine
Neqandin	neqand	neqin	bıneqin	bıneqine
Nvisandin	nvisand	nvisin	bınıvisin	bınıvisine
Pejirandin	pejirand	pejirin	bıpejirin	bıpejirine
Pelıxandin	pelıxand	pelıxin	bıpelıxin	bıpelıxine
Pjandin	pjand	pjin	bıpjın	bıpjine
Qedandin	qedand	qedin	bıqedin	bıqedine
Qehirandin	qehirand	qehirin	bıqehirin	bıqehirine
Qelişandin	qelişand	qelişin	bıqelişin	bıqelişine
Qelandin	qeland	qelin	bıqelin	bıqeline
Revandin	revand	revin	bırevin	bırevine
Rjanidin	rjand	rjin	bırjın	bırjine
Rqandin	rqand	rqin	bırqın	bırqine
Strandin	strand	strin	bıstırin	bıstırine
Şewitandin	şewitan	şewitin	bışewitin	bışewitine
Şemirandin	şemirand	şemirin	bışemirin	bışemirine
Tefandin	tefand	tefin	bıtefin	bıtefine
Telıfandin	telıfand	telıfin	bıtelıfin	bıtelıfine
Temirandin	temirand	temirin	bıtemirin	bıtemirine
Teqandin	teqand	teqin	bıteqin	bıteqine
Teyısandın	teyısand	teyısın	bıteyısın	bıteyısine
Tırsandin	tırsand	tırsin	bıtırsin	bıtırsine
Werandin	werand	werin	bıwerin	bıwerine
Weşandin	weşand	weşin	bıweşin	bıweşine
Xemilandın	xemiland	xemilın	bıxemilın	bıxemiline
Xesandin	xesand	xesin	bıxesin	bıxesine

Rader	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Xaşandin	xaşand	xaşin	bıxaşin	bıxaşine
Xeniqandin	xeniqand	xeniqin	bıxeniqin	bıxeniqine
Xerandı ı	xerand	xerin	bıxerin	bıxerine
Xwişancın	xwişand	xwişin	bıxwişin	bıxwişine
Zeliqandin	zeliqand	zeliqin	bızeliqin	bızlıqine
Zewicandin	zewicand	zewicin	bızewicin	bızewicine
Zvirandin	zvirand	zvirin	bızivirin	bızivirine

Haj: Lêkerên sazi ne ev qasın. Jiber ku hecma pirtûka me hılnde û ji bo wekok ev çend lbên han hatın nvisandin. Çqas lêkerên sazi henın bı van herçar ewayan pêktên. Lêkerên nesazi heta hêza me bıgihê emê bısanîfîn.

LÊKERÊN NESAZÎ

116. B- Lêkerên nesazi: Ev lêker ewın ku ji lêkerê bı ewayek sazi lêkera fermani pêknayê. Lê bê guhertın weki lêkerên sazi, dema nha û bê ji lêkera fermani bı ewayek sazi pêktên. Lêkerên kê m ji ji vê beşê tene hejmartın. Beşek ji lêkerên nesazi xwedı du raderanın. Herweki radera dudan, dı hinde lêkeranda sazi dıxwiyên ji lê hêman ya yekane. Radera dudan ji em dınvısın:

1.	2.	Lêker	Lêkera fermanê	Ferman	Fermana nerım
Rader	Rader				
Ajotın		ajot	ajo	bajo	
Anın	inandın	ani	in	bin	bine
Avêtın		avêt	avêj	bavêj	bavêje
Axaftın		axaft	axêv	baxêv	baxêve
Brın		bır	b		bıbe
Çûn	çûyin	çû	ç	bıç	bıçe
Çûn	çûyin	çû		her	here
Ditın	binandin	dit	bin	bıbin	bıbine
Dotın	doşan	dot	doş	bıdoş	bıdoşe
Drûn		drû	drû	bıdırû	
Êxıstın	xıstın	êxıst	êx	bêx	bêxe
Frotın	froşan	frot	froş	bıfroş	bıfroşe
Grın		gri	gri	bıgırı	
Gotın		got	bêj	bıbêj	bıbêje

1.	2.		Lêkera		Fermana
Rader	Rader	Lêker	fermanê	Ferman	nerım
Hatın		hat	ê	bê	
Hatın		hat		wer	were
Hıştın	hêlan	hışt	hêl	bîhêl	bîhêle
Jin	jiyan	ji	ji	bîji	
Ketın	kevtın	ket	kev	bîkev	bîkeve
Kuştın	kujan	kuşt	kuj	bîkuj	bîkuje
Man	mayin	ma	min	bîmin	bîmine
Mêtın	mjan	mêt	mîj	bîmîj	bîmije
Mrın		mır	mır	bîmır	bîmire
Mıştın	malıştın	mışt	mal	bîmal	bîmale
Nvistın	nvin	nvist	niv	bîniv	bînive
Pehtın	pjan	peht	pêj	bîpêj	bîpêje
Pan		pa	pê	bîpê	
Razan		raza	razê	razê	
Reyin		reyi	rey	bîrey	
Rêtın	rjan	rêt	rêj	bîrêj	bîrêje
Rûnıştın		rûnışt	rûn	rûn	rûne
Sotın	sojan	sot	soj	bîsoj	bîsoje
Şkestın	şkinandın	şkest	şkê	bîşkê	
Şûştın		şûşt	şo	bîşo	
Xwarın		xwar	xwe	bîx	bîxwe
Xwendın		xwend	xwin	bîxwin	bîxwine
Xwiyan		xwiya	xwiye	bîxwiye	
Zan	zayin	za	zê	bîzê	

117. Rasnıvisa fermani: Çı lêkerên sazi çı nesazi, lêkera bı dengdêrê destpê bıke daçeka "bı, me" ya fermani dıkarın dengdêra xwe bêxın û xwe bı dengdêra lêkeranve bıgırın. Weki:

Alastın balês malês, avêtın bavêj mavêj

Axaftın baxêv maxêv, ajotın bajo majo

Lêkerên hevedudaniyên deçeki, heke hêmana wan sazi bın sazi, heke hêmana wan nesazi bın nesazine. Mina:

Sazi

Rader	Lêker	ferman	fermana nerım
Veşartın	veşart	veşêr	veşêre
Hılbıjartın	hılbıjart	hılbijêr	hılbijêre
Wergirtın	wergirt	wergır	wergıre
Raweşandın	raweşand	raweşın	raweşine
Vemırandın	vemırand	vemırın	vemırine

Nesazi

Razan	raza	razê	
Vexwarın	vexwar		vexwe
Rakırın	rakır	rak	rake
Hılketın	hılket	hılkev	hılkeve
Hılavêtın	hılavêt	hılavêj	hılavêje

Daçekên lêkeran daçek a fermani radıke. Daçekên neyini, daçek a neyini ya fermani û daçek a dema nho dıkevıne navbera daçekên lêkeran û lêkeran da, gış peve dızeliqın:

Raketın radıkeve, ranakeve, ranekeve, ramckeve

Vexwarın vedıxwe, venaxwe, venexwe, vemexwe

WANE XVIII

DI LÊKERANDA NEYİNİ

118. Dı lêkeranda neyini: Neyini bı daçekan pêktê. Daçekên neyini yê ev herpêncın:

A- Bê, B- Nı, C- Na, Ç- Me, D- Ne

119. A- Jı daçekên neyini "bê": "bê" jıbo raderane û lı pêşi raderan cda tê danin:

Rakırın bê rakırın, şandın bê şandın

Çandın bê çandın, av dan bê av dan

Bê av dan sıl k çênabe, bê kuştın gel nızgar nabe

120. B- Jı daçekên neyini "nı": "Nı" jıbo dema nho ya lêkera dızane û dıkareye. Daçekka dema nho "dı" dıkeve, lıciyê wê "nı" tê danin û têtîha demê ji neyini dınımîne

Dızane nızane

dıkare nıkare

Nızane rehetiya cane, nıkare bê pare (Gotina mezınan)

Axa rêyan tev dızane lê rêya qenciya gel nızane

121. C- Jı daçekên neyini "na": Ev daçek ji bı lêkera dızane, dıkare, dıwêre û lêkera bûn jıbo dema nhoye. Ev daçek ji "dı" ya daçekka dema nho têtîxe û xwe lı ciyê wê datine. Mina daçekka "nı"

têgîha demê bî neyini dînimine:

Dîxwine naxwine, dîperçîqe naperçîqe, dîke nake

Dîfetîsine nafetîsine, dîpelîxine napelîxine

Dîgire nagîre, dîşewîte naşewîte, dîçîne naçîne

Dîtirse natirse, dîkene nakene, dîpeyîve napeyîve

Bî awerteyî daçekka dema nho jîbo lêkera "wêrî" "ne" ye:
Dîwêre newêre dîwêre biçe, newêre biçe. Herçîqa hinde herêmê
Kurdîstanê "nawêre" bîkartinî ji lê graniya Kurdîstanê "Newêre"
dîxebîtinî.

Dî lêkerên hevedudaniyên daçekida, daçekka neyiniyê (na) mina
daçekka erênîyê (dî) dîkeve navber pêşlêker û lêker, gişk pêve dîze-
lîqîn:

Vedîxwe-venaxwe-vedîşêre-venaşêre, vedîke-venake

Hîldîkîşe-hîlnakîşe, hîldîgire-hîlnagîre,

Radîbe-ranabe, radîhejîne-ranahejîne, radîde-ranade

Dadîgire-danagîre, dadîkeve-danakeve, dadîçe-danaçe

Derdîde-dernade, derdîkeve-dernakeve, dertê-dernayê

Dî lêkerên hevedudaniyên arikerda, daçekka neyini mina daçekka
erênî lî pêşî bî lêkerve, nav jî cda têne danîn:

Dar dîke-dar nake, kevîr dîke-kevîr nake

Av dîde-av nade, can dîde-can nade

Hîn dîbe-hîn nabe, xweş dîbe-xweş nabe

Şxwe bê guher "na" bî cwayê neyini daçekka dema nhoye.

Heke lêker bî dengdêra "a" destpê bike, jî daçekka neyini
dengdêr dîkev û bêdenga daçekê xwe bî dengdêra lêkerve datîne:

Avêtûn diavêje = tavêje navêje

Ajotûn diajo = tajo najo

Arhan diarhe = tarhe narhe

Axaftûn diaxêve = taxêve naxêve

Agîrê dlê dilan û dlê tengezar û bêzaran bî tîf û pîfan ve-
namîre

Gel şîyar bû, êdî jî koledarên xwinmîj natirse

Serdestî û stema zorker û koledaran pîr najo

122. Ç- Jî daçekên neyini "me": Ev daçek jîbo fermanêye. Hîn-

de herêm daçeka "ne" bikartinin ji lê ya rast "me" ye. Evdaçek ji mina daçeka "na" di lêkerên hevedudaniyên daçekida li navber pêş lêker û lêker tê danin. Heke lêker bi dengdêra "a" destpê bike, ji daçekê dengdêr dikeve û bêdenga daçekê xwe bi dengdêra lêkerve datine û di hemi curên lêkeranda, heke "bi" ya daçeka fermanê hebit têxe, dikeve chê wê:

Erêni	Neyini
Bike	meke
Bîşine	meşine
Bîkêş	mekêş
Vede	vemede
Rabe	ramebe
Dar ke	dar meke
Ava bike	ava meke
Kevir bike	kevîr meke
Bavêj	mavêj
Balisês	malês

 Meçe şerê xal û xwarziyan, wê tu bikevi hewar û gaziyan
 Rastiyê vemeşêr û mebeşêr ezim şêr
 Kasan malês bi alastînê zik têr nabe (Gotinên mezîna)

123. D- Ji daçekên neyini "ne": Ev daçek jibo hemi demên lêkera "bûn" jibo dema bê, demên bori, kêşanên çiroki û raweyên daxwaziye. Ev daçek ji mina daçeka "na, me", di lêkerên hevedudaniyên daçekida dikeve navber pêşlêker û lêker, lêkerên bi dengdêra "a" destpê kri, dengdêr ji daçek dikeve û bêdang xwe dengdêra lêkerve datine. Di lêkeranda heke "bi" ya daçek hebe têxe û dikeve ciyê wê. Ev daçek heke dengdêra xwe neyêxe, yan ji ji lêkeran daçek neyêxe cda têtê danin:

Erêni	Neyini	Erêni	Neyini
Ewe	ne ewe	Kurde	ne Kurde
Dê bîşine	dê neşine	dê bîbeze	dê nebeze
Şand	ne şand	bezi	ne bezi
Bîşanda	neşanda	bîbeziya	nebeziya
Divê bîşine	divê neşine	divê bîbeze	divê nebeze

Erêni	Neyini	Erêni	Neyini
Bla bışine	bla neşine	bla bıbeze	bla nebeze
Rabû	ranebû	av da	av ne da
Ajot	Najot	axaft	naxaft
Dıxwar	ne dıxwar	radıkır	ranedıkır

Dı lêkerên hevedudaniyên dında "ne" ya daçeka neyini cda lı pêşi lêkeran tê danin:

Ne hate şandin, ne da brin
Ava ne kır, xwe ne girt
Jı hev ne hewan, lı hev ne xıstın

Balakêş: Daçekên neyini, heke dengdêrên xwe bêxın, ango ji lêkeran "dı" ya daçeka dema nho û "bı" ya daçeka fermani bêxın bı lêkeranve, eger ne, cda têne danin

Dê axa ji mınra xwerek neşine, ku ne şand, ezê bı darê zorê bistinim.
Heke mın emeka xwe ne daya zorkeran, nho ez ne dı bezima serê çıyan.
Dıvê êdi keda xwe nedım yêne ne ji me, bla neji ji
Wi najote ser mın, mın ajote ser wi.
Dıvê nehêlım koledar bijı, bla lı erda xwe ji neji.
Bav û kalên me vegırtox ji axa welat demexistın, emê derxın.

DI LÊKERANDA AHENGÎ

124. Dı lêkeranda ahengi: Ahengi du celebın:

A- Ahangiya lêker bı kırdara

B- Ahangiya lêker bı servera

125. A- Ahangiya lêker bı kırdara: Hemi demên lêkera bûn (lı mjara 247 an bınêrın), hemi demên lêkerên nedervazi û dema nho û bêya lêkerên dervazi, lêker bı kırdara ahengın. Heke kırde yekane, lêker yekani, eger kırde pranibe, lêker prani dıbe û praniya serve bı tewangêye (bı kêşanêye):

Lêkera bûn:

Yekani

Ez rındım

Tu Kurdi

Ew Tırke

Ez şoreşvanım

Ew pêşmergeye

prani

em rındın

hûn Kurdın

ew Tırkın

em şoreşvanın

ew pêşmergene

Lêkerên nedervazi:

Keç bezi

Xort rabû

Bûk xemîli

Karker şiyar bû

keç bezin

xort rabûn

bûk xemîlin

karker şiyar bûn

Dema nhoya lêkerên dervazi:

Keç çek hıldıde

Keç çekan hıldıde

Qutabi pirtûk dıxwine

Qutabi pirtûkan dıxwine

keç çek hıldıdın

keç çekan hıldıdın

qutabi pirtûk dıxwinın

qutabi pirtûkan dıxwinın

Dema bêya lêkerên dervazi:

Karker dê tving çêke

Karker dê tvingan çêke

Xort dê berık bine

Xort dê berıkan bine

Keç dê şer bıke

Keç dê şeran bıke

karker dê tving çêkın

karker dê tvingan çêkın

xort dê berık binın

xort dê berıkan binın

keç dê şer bıkın

keç dê şeran bıkın

Raweya blani:

Bla pêşmerge deri veke bla pêşmerge deri vekın

Bla bano kinc bıkıre bla bano kinc bıkıırın

Bla bano kincan bıkıre bla bano kincan bıkıırın

Gelek paqijım şoreşım (Cigerxwin)

Ew têre, ew têrın êşa zıkê birçıyan nızanın.

Qutabi pirtûkan dıxwinın ku kêra gel û karkeran bân

Çqas bextreş pêşi bıgırın ji, dê gel şoreşa xwe bıkın û rızgar bıbın.

126. B- Ahengiya lêker bı servera: Hemi demên lêkera hebûn û

demên bori yên lêkerên dervazi, lêker bı servera ahenginin. Eger serve yekani be, lêker yekani, eger serve prani be, lêker prani dibe. Praniya kirdê bı tewangêye (bı kêşanêye):

Lêkera hebûn:

Yekani

Mın heye

Te heye

Wi heye

Me heye

We heye

Wan heye

Mın keç heye

Me tving dê hebe

Kurdan welat heye

Pêşmergan dê çek hebe

Leşker heye

Arteşen heye

Jin heye

Prani

mın hene

te hene

wê hene

me hene

we hene

wan hene

te kur hene

we berik dê hebın

Kurdan pêşmerge hene

pêşmergan dê çek hebın

leşker hene

arteşen hene

jın dê hebın

Mın hebın sêsed hezar ezman û dev

Yek demê xafil meminin roj û şev. (Melayê Bateyi)

Mın sê keç hebûn yek jı yadi çêtır û kurên mın ji.

Dema bori yên lêkera dervazi:

Mın kri

Te frot

Wi şand

Me razand

We xwar

Wan çêkır

Mın zorker kuşt

Te koledar qewırand

Wê mjoker dit

Me dar bri

We xani çêkır

Wan çek ani

mın krin

te frotın

wê şandın

me razandın

we xwarın

wan çêkırın

mın zorker kuştın

te koledar qewırandın

wi mjoker ditın

me dar brin

we xani çêkırın

wan çek anin

Qutabi pirtûk xwendîye	qutabi pirtûk xwendîne
Pêşmergan tving teqand	pêşmergan tving taqandîn
Qotabiyan karker şiyar kîr	qutabiyan karker şiyar kîrîn

Şah bî qesta kuştina mîrîm hejandîn bê sebeb
Dame çeşmê qehr û xeşmê rîm lî dîl da go edeb.

(Melayê Czirî)

WANE XIX

DI LÊKERANDA DEM

127. Dî lêkeranda dem: Her bûyin, her krîn dî nav demekda dî-bore û tê krîn. Bzav yan hatiye krîn û qedaye, yan destpê kriye û dîdomine, yan jî hê ne hatiye krîn, dê nû destpê bête krîn. Nexu hate zanin ku dî zmanê Kurdida sê demên hêmani hene:

Dema bori : bzav qedaye

Dema nho : bzav dîdomine

Dema bê : bzav hê destpê ne kriye

Dema bori dî nav xweda dibe du bîr:

Boriya têdayi (nîzîk). Boriya dûdar

Boriya têdayi:

Mîn çêkîr, te perçiqand, wê veşart, wî xwar

Me kri, we frot, wan şand, vezela, derket, rabi

Boriya dûdar:

Mîn çêkîriye, te perçiqandiye, wî veşartîye

Me kriye, we frotîye, wan şandiye, vezelaye

Mîn jîbo qutabiyên şoreşker êwîrgahêk çêkîr.

Te çra arikariya qutabiyên şoreşker nekîr.

Dema nho:

Ez dıbezım, tu direvi, ew dıxwine

Em dıbırın, hûn dıkêşın, ew dıçının

Ez dengek pır tehl dıbıhızım, gelo tu dızani çı denge?

Ne dıçım nwalên kûr, ne dıbinım xewnên hûr

(G. Mezinan)

Dema bê

Ezê razêm, tuyê vegeri ewê şemırine

Emê vekın, hûnê bıxwinın, ewê bıkenın

Ezê bıçime mala hevalan

Tuyê ji biyaniyanra heta kengi bıxebıtı?

Bı kurtasi vekıtandına van deman:

Boriya têdayi : mın çêkır û frot

Boriya dudar : mın çêkırıye û frotiye

Dema nho : ez çêdıkım û dıfıroşım

Dema bê : ezê çêkım û bıfıroşım

Dı zmanê meda dema nho û dema freh bı kêşanek pêktên (l1 mjara 136 an bınêrın), Yani dema nho dema frehe ji.

Jı bıł van demên hêmani, raweyên çiroki ji henın lê bı van demanve peywendine. Dı raweyê daxwazida dem ne pır gringe. Her-yek ji van, dı danekên xweda dabaş dê bêne kırıın.

DI LÊKERANDA KES Ê HEYİN

128. Dı lêkeranda kes ê heyin: Çqas kırın û bûyin hene, ji ali kesek ê heyinekve dıbe yan ji tê kırın. Ew ji yan candarın yan bê can. Ku candarbin yan mrove yan ji heywan. Wekok:

Kevır hışke

kevır serê koledar dışkine

Hesp kumête

hesp giya dıxwe

Pêşmerge gernasın

pêşmergan şer kır

Dı van hevokên jorında kevır, hesp û pêşmerge kırdene û dı ey-ni gavêda heyin û kesên lêkeranın ji. Kes ê heyin yan yekani yan ji prani dıbin. Wekok:

Yekani

Kevır

Hesp

Pêşmerge

Prani

kevıran

hespan

pêşmergan

Yekani kesck, heyinek, prani ji yeki zêde kes û heyinan nişan dıdın. Heyin û kesên lêkeran, çawan ku bî navan pêktên, wsan bî cinavkan ji pêktên. Dî mjarî cinavkanda ji hatîbû dabaş krîn (lî danka 47 an binêrîn) ku dî zaravayê kurmancida du deste cinavk he-ne û heryek ji wan xwedî yekani û pranîne:

Yekani

Ez mın

Tu te

Ew wi, wê

Prani

em me ewê dipeyive

hûn we yên guhdar

ew wan yên dabaş ji wan

tê krîn

Desta ez, hemî demên lêkera "bûn", hemî demên lêkerên neder-vazî û dema nho û bêya lêkerên dervazî pê tîne kêşan. Desta mın, jî hemî demên lêkera "hebûn, vên", dema bori yên lêkerên dervazî-ra dibîrînde.

Desta "ez" lî cîyê desta "mın" û desta "mın" jî lî cîyê desta "ez" nayên bîkaranîn. Yani çewte dîcîyê hev da nabîrînde:

Rast

Ez rındım

Ez bezım

Hûn qencın

Mın kuşt

Wan xwar

Me şand

Çewt

mın rındım, mın rinde

mın bezım, mın bezi

we qencın, we qence

ez kuştım, ez kuşt

ew xwar, ew xwarın

em şand, em şandın

Jî bîl ez kuştım, ew xwarın û em şandın, jî wanên çewt tu nayê fehm krîn. Ez kuştım, ew xwarın û em şandın jî, ez ,ew, em ne kîr-dene, dibîrî serve. Yani kesek dîn ez kuştım, ew xwarın û em şandın.

DI LÊKERANDA RAWE

129. Dî lêkeranda rawe: Lêker gorê kes, dem û têgihên xwe dî-kevîne drûvên curbecur, jî her yek van drûvanra "rawe" tê gotin.

Jî pêşkerî (agahdari) krîna bûyeranra "raweyên pêşkerî" û jî bî daxwazî ifade krîna bûyeranra "raweyên daxwazî" têne gotin.

Du celeb rawe hene: Raweyên daxwazî û raweyên pêşkerî. Raweyên daxwazî, dê lî daneka daxwazîda bêne dabaş krîn. Êdî lî vîr ser sekînin naxwaze

RAWEYÊN PÊŞKERÎ

130. Raweyên pêşkerî: Ev rawe krînê yan jî bûyinê dî nav demanda bî tevlaya kes û heyinan dîdî diyar krîn. Jîber van taybetîyan, jî wanra raweyên pêşkerî têne gotin.

Dî raweyên pêşkerîda çar celeb kêşanên lêkeran hene:

Dema boriya têdayî

Dema boriya dûdar

Dema nho û freh

Dema bê

Heryek jî van kêşanan xwedî çirokî û şertiyên pêşkerîne jî

Jî xew şiyar bûm, qêrîn û halan

Gurmin û nalin, kuştin û talan

Mîn go çî bûye? Çiye bazdan?

Dengek hate mîn dengêk perîşan

Kete ber lîngan ket ber destan

Dijmîn, dijmîn...

Dijmîn kete Kurdistan (Cigerxwin)

PARÇEK XWENDINÊ NEVROZ

131. Nevroz cejna Kurdane. Bî teqwîma Zayînî (Miladî) bîstûyek, teqwîma Romî heşt û bî teqwîma Kurdî Nevroz roja yekê Adarêye. Îsal bî teqwîma Kurdî Nevroz, roja Sêşem yekê Adarê û

sala duhezarûşehsedûheftêûheştane. Yani Nevroza isal bî teqwima Kurdi wha tê nvisandin. 1.1.2678. Lewra roja yekê Adarê sersale. (1)

Berî danîna împaratoriya Medan Nevroz, cejna Kurdan ya olî bû. Piştî mezîrandîna împaratoriye (700 hefsed sal berî zayînê) vêca bû cejna neteweyî jî. Jî wê rojê vîrda hîm olî, hîm jî netewî, bî şahîne (govend, dehol, zîrne, blûr) û bî gişk pergâlên goranî, bî agir krîna çîyan û banîyan mrêzdarane tê pîroz krîn.

Nevroz mîzginvanê baharêye û dawerê serkeftîna rojên gerîm lî ser yê sar, frehî lî ser tengasî, xweşî lî ser nexweşî, xebat lî ser betalî, têrî lî ser birçîtî, mafî lî ser bêmafî, dadî lî ser stemkarî û serkeftîna dil, xzan, birçî, cotkar û karkeran lî ser kedxwer, xwinmîj û koledarane. Nevroz, bî van taybetiyên xwe yê cvakî û aborî, jî alî gelek gelên dinve jî hatîye pîroz krîn.

Pîroz krîna Nevrozê:

Bî kurtasî jî alî Kurdanve Nevroz, wha tê pîroz krîn:

Dusê meh berî, amadiya Nevrozê tê krîn. Malxwiyên malan jî kîfletra kînc, pêlav û navmal dîkîrîn. Xort jî êzîngan dîkîn xetîle û dî ber arikên xaniyanra dîkîn. Ew êzîng heta roja Nevrozê qenc hîş kolek dîbîn.

Roja Nevrozê çî jî kî bê xwe dî tewîzînin, kîncên nû werdîgîrîn, xwarînen xweş dîpêjî û dîçî malên hev bî hevra xwarîne dîxwî û jî hevra "cejna we û ya malîyan pîroz be" dîbêjî. Kîfletê malê jî wan kîncên berîda amade grî werdîgîrîn, xwe dîxemîlînin û bî kêfxweşî dî fermana mêhvananda radîwestî. Piştî xwarî û vexwarîne, ew mêyweyên jîbo roja Nevrozê amade krî jî mêhvanara pêşkêşdîkî.

Keç û xort, Hevalek xwe bî kîncên sodret bîkartînin, dî drûva ecêbloskekda dîxemîlînin, destek rî û sîmbîlê kalan jêra çêdîkî, tîzbiyek drêjê lîbgîr dîdî destan û bî dehol û zîrne dî taxanda dîgerî. Bî qêrî û halan dîçî ber derê malan. Piştî hînde dehol û zîrne

(1) Dîvê bête zanî ku hînde herêmên Kurdistanê teqwima Kurdi jî fetha Ninuwayê (612 sal berî zayînê) dîhesîbînin. Ev teqwîm jî gelek hatîye xebîtandin.

jendın û govend krînê, jî malvananra "Serê salê bnê salê, xwedê bîhêle pçûkê malê çî jî we tê bîdın vi kali" dîbêjin. Kevani bî kêfek xweş û dlek freh hêk, rûn, savar, kartol, brînc, berparêz û meywan dîdın wan. Bî vi ewayi gelek xwerekan berhev dîkîn û derdikevîn quntarên çîyan, curbicur xwarînan dîpêjin û gazi mezînan jî dîkîn, bî hevra dîxwîn û kêfxweş dîbîn.

Hingora şeva Nevrozê xort lî serê çiyayên bîlînd agirê gur hîldîkîn. Pîştî agir hîlkırîna çîyan, tîn û dîbîn du deste. Destek jê gel lî dorê xwe kom dîkîn û piyesa Kawayê hesînger dîleyzîn û canê wî xweşmêrî vedîjinîn. Desta dîn jî, wan xetilê amade kri vêdîxîn, destê xwe dîgırîn, dî taxanda bî merşên netewî, stran û bêrite dîgerîn. Çekan dîteqînîn û zompa hesîngeran dawerîya Kawayê hesînger dîhejinîn. Bî vi ewayi Nevrozê pêşkêş dîkîn û canê şehîdên Kurdan vedîjinîn.

Dî demên kevînda şahîna Nevrozê lî gîşk herêmên Kurdistanê heftêyek dîdomand. Lê nho hinde herêm sê roj û hindejî mîxabîn rojek tenî pîroz dîkîn.

Roja Çarşema berî Nevrozê heta roja çarşema pîştî Nevrozê, yanî dî nav ber herdu Çarşemanda Nevroz dîhate pîroz krîn. Heke Nevroz rasti roja Çarşemê bîhata, cejna mezîn dîhate pejîrandîn û şahîne jî Çarşema pêşî destpê dîkır, heta roja Nevrozê dîdomand lê ev Nevroz ne wek wanên dîn, bî eweyek mrêz, şahînek pîr mezîn dîhate pîroz krîn. Dîvê îro jî wîsan bît.

Dî demên dewletên Botanda Nevroz bî dewletî dîhate pîroz krîn. Bînerîn mamostê mezîn Ehmedê Xanî dî Mem û Zînedî çî dîbêje?

Zanayê muemmerê kuhensal
Ev rengehe go jîbo me ehwal
Go adetê pêşiyê zemanan
Ev bû lî hemî cî û mekanan
Wextê weku şahsîwarê xawer
Tehmîlî dîkır dî mahê azer
Yanî ku dîhate bîrcê sersal
Qet kes ne dîma lî mesken û mal

Bîlcîmle dîçûn der jî malan
Hetta dîgîhişte pir û kalan
 Rojâ ku dîbûye id û Nevroz
 Tazîm jîbo dema dîlefroz
Sêhra û çîmen dîkîrne mesken
Beyda û dimen dîkîrne gulşen
 Xasîma ezeb û keçê dî bakîr
 El qîsse cwahîrê dî nadîr
Têkda dî mîzeyyen û mîlebes
Vêkra lî teferrîcê mrexkes

Gelî duht û xortan! Qenc bala xwe bîdînê, hnek jî ruhbanên olî
û dîgel nokerên burjuwa û xwinmîjan lê dîxebûn ku vê rojâ gran-
baha jî mîna hêjanên me yê cvakî û dîroki bîdîn wînda krîn.

Gumandarîm ku jî îro paş her Kurdek lî vê rojâ hêjayî û dîgel
hêjanên xwe yê dîn dê xwedîtî bike.

WANE XX

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA BORİYA TÊDAYÎ

Boriya nîzîk, boriya dîtî, boriya vebîr.

132. Dema boriya nîzîk: Krîn qedaye, qedana wê nîzîke, dîx-wîyê û vebîre jî. Jîber vê yekê jêra lêkera dema boriya têdayî tê gotin.

Ev kêşan bê daçêke, rastbîrast jî qurmê lêkaran pêktê. Jîbo kşandîna vê lêkerê: Jî bîl yekaniya sîsêyan qertaftcinavk bî dawîya lêkerên nedervazîve, cinavk çda lî pêşî lêkerên dervazî têne danîn.

Balakêş: Dî hemî kêşananda, jîbo baş têgîhanê û bî hêsanî kşandîna lêkeran çî peywîst be çî ne be, emê cinavkan jî binîvîsîn:

Nedervazî

Ez ketim ez bezim
Tu ketî tu baziy
Ew ket ew bezi
Em ketin em bezin
Hûn ketin hûn bezin
Ew ketin ew bezin

Neyînî

Ez ne ketim, ez ne bezim, mîn ne çand, mîn çênêkîr

Dervazî

mîn çand mîn çêkîr
te çand te çêkîr
wê çand wî çêkîr
me çand me çêkîr
we çand we çêkîr
wan çand wan çêkîr

Ez ketim newala, kort û kendala. (Cigerxwin)
Ez bezime koledar, koledar kîr hewar.

RAWEYA PÊŞKERÎ ÇIROKIYA DEME BORİYA TÊDAYÎ.

133. Çirokiya têdayî: Jiber ku dema boriya têdayî bî çiroki tê dabaş krîn. Çirokiya dema boriya têdayî tê gotin.

Ev kêşan xwedi du demane. Demek jê krîn têda hatîye hmatê û demek jî dabaş jê tê krîn. Herdu dem jî di boridanin.

Ev kêşan jî du lêkeran pêktê. Yek jê lêkera "bû" ye, ya din jî lêkerek kêşandiye. Lêkera "bû" mina qertafekê lî dawî bî lêkera boriya têdayîve tê danin û heke lêker bî bêdengê bîqede, dengdêra "î" lî navber herdu lêkera tê danin. Weki: Şand şandîbû, frot fro-
tîbû, bezand bezandîbû. Lêkerên nedervazî qertafcinavkan dixwaze û bî lêkera "bû" ve tene danin:.

Nedervazî

Ez ketîbûm ez bezîbûm
Tu ketîbûy tu bezîbûy
Ew ketîbû ew bezîbû
Em ketîbûn em bezîbûn
Hûn ketîbûn hûn bezîbûn
Ew ketîbûn ew bezîbûn

Dervazî

mîn çandîbû, mîn çêkîrîbû
te çandîbû te çêkîrîbû
wî çandîbû wê çêkîrîbû
me çandîbû me çêkîrîbû
we çandîbû we çêkîrîbû
wan çandîbû wan çêkîrîbû

Neyînî

Tu ne ketîbûy, tu ne bezîbûy, te ne çandîbû, te çênekîrî bû

Ya çepî danîbû têda Zimrete (Ehmedê Bateyî)
Sbetîrê Dînya hê sartîr bû. Rîndê û Zîzê çûbûn xebata
xwe heta hîngorê jî xebîtibûn (C. Bedîrxan)
Xecicê pîrtûkek xwendîbû û rînd tê gîhabû.
Xemrevî hatîbû mal lê ez derketîbûm
Baran barîbû lê hê berf ne helabû

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA BORİYA DÛDAR

Boriya dûr, boriya bîhisti.

134. Dema boriya dûdar: Krîn qedaye, qedana wê him naxwiyê û him ji ji dema têdayi dûrtire, yan ji hatiye bîhistin. Jiber vê yekê jêra dema boriya dûdar tê gotin. Qertafa vê demê "e" ye. Teni kêşana yekaniya kesê dudan yên lêkerên nedervazi "i" ye.

Dî lêkerên nedervazida danina van "e, i" yan pîştî qertaftcinavkane. Yani pêşî qertaftcinavk bi qurmê lêkeranve, paşî qertaftên demê "e,i" ji bi qertaftcinavkanve têne danin.

Eger lêker bi dengdêrê bîqede û gava bixwaze "y" ya kelijandinê û heke bi bédengê bîqede "î" ya kelijandinê têne danin. Pîştî van tevgeran vêca tablo tê bîkaranin:

Nedervazi

Ez ketîme ez bezîme

Tu ketîyi tu beziyi

Ew ketîye ew beziye

Em ketîne em bezîne

Hûn ketîne hûn bezîne

Ew ketîne ew bezîne

Neyîni

Tu ne ketîyi, tu ne beziyi, te ne çandîye, te çênekîriye

Dervazi

mîn çandîye mîn çêkîriye

te çandîye te çêkîriye

wî çandîye wê çêkîriye

me çandîye me çêkîriye

we çandîye we çêkîriye

wan çandîye wan çêkîriye

Qutabî pirtûk xwendîye û têgîhayê.

Mîn dest avêtîye doza xwe, êdî zorker bî mîn nîkare.

Mamoste pirtûka xwendîne aniye

Ew çûye hê ji ne hatiye

RAWEYA PÊŞKERÎ. ÇIROKÎYA DEMA BORİYA DÛDAR

135. Çirokiya dûdar: Jiber dema boriya dûdar, bî çiroki dabaş jê tê krîn, çirokiya dema boriya dûdar tê gotin.

Çawan ku boriya dûdar, ji dema boriya têdayi dûrtir û ne vebir-

tire. Wsan çirokiya dûdar ji jî çirokiya têdayi durtir û ne vebirtire.

Dî çirokiya dûdarda du dem hene: Yek jê krîn têda hatiye hmatê û demek ji dema dabaşa jêye. Yani dabaş ji dema boriya dûdare dî demek boriyê dînda.

Ev çiroki ji mina çirokiya boriya têdayi jî du lêkeran pêktê. Yek jê lêkera "bû" ye. Ya dîn lêkerek kêşandiye.

Qertafa çirokiya dûdar ji mina qertafa dema dûdar "e" ye. Teni jibo yekaniya kesê dudan yê lêkerên nedervazi "i" ye. Ev qertaf bî lêkera "bû" ve tene danin û lêkera "bû" ji mina qertafek edeti bî lêkerve tê qertifandin. Lêkerên nedervazi gava bixwaze qertafci-navk, gava lêker bî bêdengê bîqede "î" û gava du dengdêr rastê hev bîn "y" a kelijandanê neyên jî bir krîn:

Nedervazi

Ez ketîbûme

Tu ketîbûyi

Ew ketîbûye

Em ketîbûne

Hûn ketîbûne

Ew ketîbûne

ez bezibûme

tu bezibûyi

ew bezibûye

em bezibûne

hûn bezibûne

ew bezibûne

Dervazi

Mî çandîbûye

Te çandîbûye

Wi çandîbûye

Me çandîbûye

We çandîbûye

Wan çandîbûye

mî çêkîrbûye

te çêkîrbûye

wê çêkîrbûye

me çêkîrbûye

we çêkîrbûye

wan çêkîrbûye

Neyini

Ez ne ketîbûme

Te ne çandîbûye

ez ne bezibûme

te çênekîrbûye

Balakêş: Bîkaranîna vê kêşanê hîdîke. Graniya xebata wê dî hevokên serve dawidane:

Ez çûbûme Diyarbekîrê

Tu çûbûyi şerê azadi
Wê çekên şoreşê dabûne serok.

Dibêjin ku tu di van çend salên dawida jiber ku jî chê
xwe hatûbûyi dûr xistin gelekî lî ber xwe ketîyi
(Rabûn hejmar 1.)

WANE XXI

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA NHO Û FREH

Lêkera dema nho dî cyni gavêda lêkera dema frahe ji.

136. Dema nho: Krînê destpê kriye û dîdomine. Dema freh krîn dî hersê demandaye. Yani herdeme. Ev herdu dem ji bî vê kêşanê pêktê. Jiber vê yekê jêra dema nho û freh tê gotin.

Ev lêker ji lêkera fermanê tê kêşan. Daçeka wê ya demê "dî" ye. Ji lêkerên xwerû "bî" ya daçeka fermanê dîkeve û lî chê wê daçeka demê "dî" tê danin. Heke lêker bî dengdêrê destpê bike, ji daçeka demê dengdêr dîkeve û bêdenga daçekê xwe bî dengdêra lêkerve dîgire. Weki: Êşan diêşe dêşê, avêtin diavêje davêje, inan diine dine û dîvan curên kêşananda "d" dîkare bibe "t" ji. Weki: Dêşe têşê, davêje tavêje, dine tine...

Dî lêkerên hevedudaniyên daçekida, daçeka demê dîkeve navber pêşlêker û lêker û gişk peve dîgiri. Bî dawiya lêkerên dervazive ji qertafcinavak tîne danin:

Nedervazi

Ez dîkevîm

Tu dîkevi

Ew dîkeve

ez dîbezîm

tu dîbezi

ew dîbeze

Em dıkevin	em dıbezın
Hûn dıkevin	hûn dıbezın
Ew dıkevin	ew dıbezın
Dervazi	
Ez dıçinım	ez çêdıkım
Tu dıçini	tu çêdiki
Ew dıçine	ew çêdıke
Em dıçının	em çêdıkın
Hûn dıçının	hûn çêdıkın
Ew dıçının	ew çêdıkın
Neyini	
Ew nakeve	ew nabeze
Ew naçine	ew çênake

Balakêş: Xebitandına lêkerê bî têgîha dema nho yan jî freh, jî herkina danekê tê zanin:

Karbidestên maldar û koledaran bertil dıxwın, yê gelan naxwın. Reşo xwarın dıxwe. Dî hevokên pêşida "dıxwın, naxwın" her-deme, ya dawî dıxwe dema nhoye.

Karker û cotar lî pêşber zorker û koladaran berxwedanê tajon.

Neteweyên serdest û refa mjoker, jehriya dubendiyê têxın nav netewe, gel û refa bîndest.

RAWEYA PÊŞKERÎ ÇIROKIYA DEMA NHO Û FREH.

137. Çirokiya dema nho û freh: Jîber ku dî dema borida dabaş jî dema nho û frehê berî wê gavê tê kîrîn, jêra çirokiya dema nho û freh tê gotin. Nexu çirokiya deme nho û freh, dabaş jî dema nho û frehê boriye, dî dema borida. Mina mî dîkır, te dîfırot, wî dîbırıya. Yanî ne nho, dî wê gava borida mî dîkır, te dîfırot, wî dîbırıya.

Ev lêker jî qurmê lêkerê tê kêşan. Daçeka demê "dî" lî pêşî bî lêkerve tê danin. Mina: dıgot, dışand, dıçınıya. Lêkerên heveduda-niyên daçeki, daçeka demê dıkeve navber pêşlêker û lêker û gişk bî heve têne zeliqandin. Mina: Hıdıda, radıkır, dadıda, vedıbû.

Lêkerên bî dengdêra "i" bîqedin danina "a" yek bî dawiya kêşanêve çêtire. Mina: Dıbırıya, dıreviya, dıkeniya.

Dı lêkerên dında, danin û ne danina "a" yê mina heve. Mina: Radıza radızaya, dıçû dıçûya, dışemırand dışemıranda, vedıkır vedıkıra.

Divê dı lêkerên nedervazida, qertaşcinavk û gava du dengdêr rastê hev bên "y" ya kelijandinê neyê jî bir krın.

Nedervazi

Ez dıketım	ez dıbezima
Tu dıketi	tu dıbeziya
Ew dıket	ew dıbeziya
Em dıketın	em dıbezina
Hûn dıketın	hûn dıbezina
Ew dıketın	ew dıbezina

Dervazi

Mın dıçand	mın çêdıkır
Te dıçand	te çêdıkır
Wê dıçand	wi çêdıkır
Me dıçand	me çêdıkır
We dıçand	we çêdıkır
Wan dıçand	wan çêdıkır

Neyini

Wan ne dıçand	wan çênedıkır
We ne dıçand	we venedıxwar

Balakêş: Hinde herêm: Tu dıbeziyayi, tu dıreviyayi bıkartınin

Esker lı ciyê xwe melûl û dıl şkesti dıman, bê deng guh dıdan gotaran, bê dıl û bî sisti dıhıştın wan rêkın eniya şer (Ereb Şemo)

Jıbo şiyar bûna gelê Kurd, Ehmedê Xani dıxebıtiya û Melayê Cziri jî hılbeste çêdıkır.

RAWEYA PÊŞKERÎ

ÇIROKÎYA DEMANHO Ê FREHA HEVEDUDANÎ

138. Çirokiya nhoya hevedudani: Jıber ku jî du lêkran pêktê he-

vedudani û dabaş ji dema nho û frehe di dema borida çirokiye ji. Jiber vê yekê jêra çirokiya dema nho û freha hevedudani tê gotin.

Şxwe têgîha çirokiyê ji hindik dîguherine. Yani demê hnek ve-birtir û xwerûtir dike.

Ev kêşan ne tevayîye, yani di hinde lêkeranda dîxwîyê. Heta nho çar lêker (zanin zani, vêyan, vêya, wêrin wêri, karin kari) hatî-ne senîfandî (fêsbî kîrîn).

Ev ji mina çirokiya dema nho û freh, jî qurmê lêkerê û daçekê demê tê kêşan. Teni lêkera "bû" lê tê zêde kirin. Daçek, lêker û lêkera "bû" bi heve tene danin:

Mî dîkaribû	mî dîzanibû
Te dîkaribû	te dîzanibû
Wî dîkaribû	wê dîzanibû
Me dîkaribû	me dîzanibû
We dîkaribû	we dîzanibû
Wan dîkaribû	wan dîvêyabû
Te dîwêribû	te dîzanibû
Mî dîwêribû	mî dîvêyabû
Wê dîwêribû	wî dîvêyabû
Me dîwêribû	me dîvêyabû
We dîwêribû	we dîvêyabû
Wan dîwêribû	wan dîvêyabû
Mî ne dîzanibû	te ne dîkaribû
Wan ne dîwêribû	we ne dîvêyabû

Hinde herêmê Kurdistanê "î" ya lî dawîya lêkeranve bi "î" yê dîguherin. Hînga wha dibe: Dîkaribû, dîzanibû, dîwêribû...

Di zanîna mînda herdu ewa jî dîrîstî. Lewra têgîh naguhere.

Hinde herêm jî dîvîyabû bîkartînin. Bî mî ev jî raste. Lewra vî-yan jî mîna vêyanê radere û têgîha wan jî yeke.

Kesi ne dîzanibû ku lî serê wê qewîmîye çî ecêba grane (Memê Alan)

Gelo bavê mî di wextêda zîamekî hîkûmetê bû, jîber ku di emîrda hatîbû gotin ku dîvîyabû hemî mîxtar arîkarîya bawo bîkî. (Ereb Şemo)

WANE XXII

RAWEYA PÊŞKERÎ DEMA BÊ

Dema paşi, dema dû nho, dema paşeroj.

139. Dema bê: Krînê hê destpê nekriye. Jibo vê yekê jêra dema bê tê gotin.

Ev lêker ji lêkera fermanê tê kêşan.

Daçeka nmandina demê "ê" ye. Gorê devokên herêman "ê" ya daçek bî serê xwe ji tê bîkaranin. Weki: Ê bîxwe. Bî "w, d, t" yêve ji tê danin. Weki: Wê bîxwe, dê bîxwe, tê bîxwe...

Daçeka demê cda lî beriya lêker heta lî beriya kirdê ji disa cda tê danin. Weki: Reşo dê bîçe şerê axan, wê Reşo here şerê vegirtaxan. Ez tê çekan bîkirim, Wê ez çekan bîkirim, ez çekan dê bîkirim. Heke kîrde cinavk be, "ê" ya daçeka demê pêve ji tê danin. Weki: Ezê herme dbîstana blind, tuyê heri zanoşkê.

Daçeka fermanê "bî" lî ciyê xwe dîmine. Dî hemi kêşanên lêkeranda, bî dawîya lêkeranve qertaftcinavk têne danin:

Nedervazi

Ezê bîkevîm

Tuyê bîkevi

Ewê bîkeve

ezê bîbezîm

tuyê bîbeziy

ewê bîbeze

Emê bıkevin	emê bıbezın
Hûnê bıkevin	hûnê bıbezın
Ewê bıkevin	ewê bıbezın
Dervazi	
Ezê bıçinım	ezê çêkım
Tuyê bıçini	tuyê çêki
Ewê bıçine	ewê çêke
Emê bıçinın	emê çêkın
Hûnê bıçinın	hûnê çêkın
Ewê bıçinın	ewê çêkın
Neyini	
Ezê nkevim	ezê nebezım
Ezê neçinım	emê çênekın

Çawan dı tabloyêda ji dıxwiyê ku "ne" ya daçeka neyini, "bı" ya daçek êxistıye û xwe lı ciyê wê daniye.

Jıbo pêşve çûnê ezê pır bıxebıtım.
Ger wi bı vê rengê Mem rha kır
Derdêd dlê me wi dewa kır
Wer meyi msır lı ser inadê
Em dê bıgırın we reng cêhadê (Ehmedê Xani)

RAWEYA PÊŞKERÎ ÇIROKIYA DEMA BÊ.

140. Çirokiya dema bê: Jıber ku dı dema boride dabaş jı dema bê tê krın, jêra çirokiya dema bê tê gotın.

Gotox xwe dıbe dema bori û jı dema bêya wan gavan dabaş dıke. Mina: Dê Azad bıxwenda, dê Reşo bıçûya şer, wê Zerifê bıniwisiya, Ferzende û Kendal dê bıhatına. Yani dı wê gavêda hê ne xwendibû, ne çûbû, ne nvisibû û ne hatıbûn, dê bıxwenda, bıçûya, bıniwisiya û bıhatına. Bı vê rewşê ji bıbêjim: Mın dê wergırta, yani ne nho, wê gav bori mın dê wergırta.

Çirokiya dema bê, jı qurmê lêkerê tê keşan. Ev ji mina dema bê "ê" ya daçek bı serê xwe ji tê bıkarandin û bı "w, d, t" yêve ji dıgire,

lî pêşî lêkeran heta lî pêşî kîrdan cda û heke kîrde cinavkbe bî cinavkêve jî tê danîn. "Bî" ya daçek lî pêşîya lêkerên xwerû dîmine. Jî dema bê guherti, ev jî qurmê lêkerê tê kêşan û "a" ya çiroki bî dawîya kêşananve tê danîn. Mina: Ezê bixebîtim_a, dê Kurdo gerdo bîkuşt_a, mîn dê rêzman bînvîsîy_a, Şeva Nevroza sala par, xort û keçên Kurdan lî çîyayên blînd dê agir bîkîrîna.

Dî lêkerên nedervazîda qertafcinavk û navbera du dengdêran "y" ya kelîjandîne neyê jî bir kîrî:

Nedervazî

Ezê bîketîma	ezê bîbezîma
Tuyê bîketa	tuyê bîbeziya
Ewê bîketa	ewê bîbeziya
Emê bîketîna	emê bîbezîna
Hûnê bîketîna	hûnê bîbezîna
Ewê bîketîna	ewê bîbezîna

Dervazî

Mînê bîçanda	mînê çêkîra
Teyê bîçanda	teyê çêkîra
Wêyê bîçanda	wîyê çêkîra
Meyê bîçanda	meyê çêkîra
Weyê bîçanda	weyê çêkîra
Wanê bîçanda	wanê çêkîra

Neyînî

Wîyê neçanda	wêyê çênekîra
Emê neketîna	emê venebûna

Balakêş: Dî lêkerên nedervazîda yekaniya dudan: Tuyê bîketa-ya, tuyê bîbeziyaya, tuyê bîketîyaya jî têne bîkaranîn û gava cinavkên desta mîn (mîn, te, wî, wê, me, we, wan) bîbîrî kîrde, daçek-ka dema bê cda lî pêşî yan jî lî pê cinavkê bête danîn çêtîre. Mina: Wan ê bavêta, dê me bîkîra, te dê rakîra, tê mîn bîjenda...

RAWEYA PÊŞKERÎ

DEMA BÊYA HEVEDUDANÎ

141. Dema bêya hevedudanî: Jîber ku jî du lêkeran pêktê û jî

dema bêye ji, jêra dema bêya hevedudani tê gotin.

Dî vê kêşanêda du dem hene, yani tevlêheviya dema bê û dema boriye û têngîha herdu deman ji têda dixwiyên. Mina: Wê Reşo çûbe hewara karkeran, dê Azad dbîstana blind xwendibe, Karker û cotkarên welat misoger dê şiyar bîbîn. Yani Reşo, Azad, karker û cotkar heta nho ne sekînine, wê hewara karkeran, xwendin û şiyar bûn pêkanibîn.

Ev kêşan ji qurmê lêkerê û jî lêkara "bûn, be" pêktê, Lêkara "be" herwekê qertafekê edeti lî dawiya lêkerve digire û daçeka dema bê "ê, wê, dê, tê" mina dema bê lî pêşi, heta lî pêşi servê û kirdê cda ku kirdê cinavk be bî cinavkêve ji tê danin.

Dî lêkerên nedervazida xwezayî qertafcinavk hene. Lî navber lêkera bêdang qedayî û lêkera "be" "î" ya kelijandinê û gava du dengdêr rastê hev hatin "y" ya kelijandinê neyê jî bir krin:

Nedervazi

Ezê ketibim	ezê bezibim
Tuyê ketibi	tuyê bezibi
Ewê ketibe	ewê bezibe
Emê ketibin	emê bezibin
Hûnê ketibin	hûnê bezibin
Ewê ketibin	ewê bezibin

Dervazi

Minê çandibe	minê çêkırıbe
Teyê çandibe	teyê çêkırıbe
Wêyê çandibe	wiyê çêkırıbe
Meyê çandibe	meyê çêkırıbe
Weyê çandibe	weyê çêkırıbe
Wanê çandibe	wanê çêkırıbe

Neyini

Meyê ne çandibe	meyê çênekırıbe
Teyê ne çandibe	teyê çênekırıbe
Hûnê ne kenibin	hûnê rûneniştibin

Dêma bêya hevedudani ya lêkera zani, karî û wêri, çawan bî drûva jorin tê bîkaranin, bî vi ewayî jêrin ji tê xebitandin:

Ezê bîkaribim, tuyê bîkaribi, ewê bîkaribe...

Divê bête zanin ku dî vê kêşanêda teni têngîha dema bê heye.

Dê Reşo ji şoreşêra qumbere peyda krîbîn

Dê Dîjwar çûbe nav karkerên karxanê

RAWEYA PÊŞKERÎ ÇIROKIYA DEMA BÊYA HEVEDUDANÎ.

142. Çirokiya bêya hevedudani: Jîber ku jî du lêkeran pêktê hevedudani û dema bê jî bî çiroki tê dabaş krîn çirokiye. Jîbo vê yekê jêra çirokiya dema bêya hevedudani tê gotin.

Çêbûna vê kêşanê nîzikê dema bêya hevedudaniye. Têngîha wê şxwe çirokiya deme bêya hevedudaniye.

Divê kêşanêda lêkara "be" dibe "bû" û "a" ya çiroki jî bî dawiyêve tê danin.

Qertaftcinavk û "î, y" ya kelijandinê neyê jî bir krîn:

Nedervazi

Ezê ketîbûma

Tûyê ketîbûya

Ewê ketîbûya

Emê ketîbûna

Hûnê ketîbûna

Ewê ketîbûna

ezê bezîbûma

tuyê bezîbûya

ewê bezîbûya

emê bezîbûna

hûnê bezîbûna

ewê bezîbûna

Dervazi

Mînê çandîbûya

Teyê çandîbûya

Wêyê çandîbûya

Meyê çandîbûya

Weyê çandîbûya

Wanê çandîbûya

mînê çêkîrîbûya

teyê çekîrîbûya

wiyê çêkîrîbûya

meyê çêkîrîbûya

weyê çêkîrîbûya

wanê çêkîrîbûya

Neyîni

Teyê ne çandîbûya

Mînê venexwarîbûya

Weyê ne kelandîbûya

teyê çênexîrîbûya

mînê venexuştîbûya

weyê veneşartîbûya

Çirokiya dema bêya hevedudani ya lêkera zani, kari, wêri bî vi

ewayi ji tê bikaranin:

Mînê bîzanîbûya, mînê bîkarîbûya, mînê bîwênîbûya

Teyê bîzanîbûya, teyê bîkarîbûya, teyê bîwênîbûya

Wêyê bîzanîbûya, wiyê bîkarîbûya, wêyê bîwênîbûya

Balakêş: Mînê xwarîba, teyê şandîba, weyê guhertîbûwa, meyê guhastîbûwa ji tene bikarani.

Balakêş: Gişk rawe yanî raweyên pêşkerî, şertiyên pêşkerî, raweyên daxwazî dîgel hemî çirokiyan bî 39 (sîh û neh) celebên hatî kşandin. Pzo gelek kêşanên hinde lêkeran hene ku bî serê xwe kêşan dîxwiyên ji lê ji alî mînve heya iro guhertînek grîng ne hate ditin. Jîber vê yekê li dawîya kêşanên peywendên wan hatî vekî-tandin.

WANE XXIII

ŞERTİYÊN PÊŞKERÎ, RAWEYA ŞERTİYÊN PÊŞKERÎ

143. Şertiyên pêşkeri: Gava bûyin yanji krin, bî şertanve hate grê dan, jêra şerti û gava raweyên pêşkeri bikevine şertan, şertiyên pêşkeri têne gotin. Jiber vê yekê ji vê kêşanêra, raweya şertiyên pêşkeri yan ji şertiyên pêşkeri tê gotin.

Dî zmanê meda du celeb şerti hene:

Şertên raweyên pêşkeri

Şertên raweyên daxwazi (şert-daxwaz)

Şertên raweyên daxwazi dê li daneka wanda bête dabaş krin. Emê dabaşê binin li ser şertên raweyên pêşkeri.

ŞERTÊN RAWEYÊN PÊŞKERÎ

144. Şertên raweyên pêşkeri: Raweyên pêşkeri gorê dem û kesan têne kêş, daçekek ji daçekên şerti (er, wer, ger, eger, heke, heker, heger, ku) li pêşi lêkeran heta li pêşi kirdan cda tê danin û raweyên pêşkeri dîzîvirine raweyên şertiyên pêşkeri. Mina: Eger min kîr, heke te xwend, ku wan pirtûk nvisand, ger tu nexwini dê bîminî.

145. ŞERTÊ DEMÂ BORİYA TÊDAYÎ:

Eger ez bezim,
Er tu beziy
Ku em bezin
Heker ez ne bezim

heke te çêkır
wer te çênekır
er wê çêkır
ku wi çênekır

146. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMÂ BORİYA TÊDAYÎ:

Ger ez bezibûm
Wer tu bezibûy
Er ew bezibûn
Ku tu ne bezibûy

ger me çêkırîbû
wer we çêkırîbû
heke mın çêkırîbû
heger te çênekırîbû

147. ŞERTÊ DEMÂ BORİYA DÛDAR:

Eger ez bezime
Heker em bezine
Heke ew beziye
Heke ew ne bezine

heke te çêkırîye
eger we çêkırîye
ku wê çêkırîye
eger wan çênekırîye

148. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMÂ BORİYA DÛDAR:

Heke ez bezibûme
Eger tu bezibûyi
Heke ew bezibûye
Eger tu ne bezibûyi

ku me çêkırîbûye
eger we çêkırîbûye
eger wan çêkırîbûye
heke te çênekırîbûye

149. ŞERTÊ DEMÂ NHO Û FREH:

Eger ez dıbezım
Heke tu dıbeziy
Eger ew dıbezın
Heke ez nabezım

heke tu çêdıki
eger hûn çêdıkın
eger ew çêdıke
er hûn çênakın

Heke hate mlê mın, dê tu bıbıhizi dengê mın (gotın)

150. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMANHO Û FREH:

Heke ez dıbezima	heke mın çêdıkır
Heke tu dıbeziya	eger te çedıkır
Er ew dıbezina	er hûn dıbezina
Eger em ne dıbezina	eger we çênedıkır

151. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMANHO Û FREHA HEVEDUDANÎ: (LÊKERA ZANÎ, KARÎ, VÊ YA, WÊRÎ)

Heke mın dıkaribû	eger te dıvêyabû
Eger we dıkaribû	heke wan dıvêyabû
Ger me dıwêribû	eger we dızanibû
Heke mın ne dızanibû	heke we ne dızanibû

Ger bî kuştın wer bî hıştın emr û fermane teye (Melayê Cziri)
Heke heye naqedinım, vî pilonê reş neqetinım (gotın)
Qiza Beko got: Dıvê tu bî mın dî soz û bextê mêrane.
Eger Xwedê kır mrazê te bî Zina zêdane.
Tuyê destê mın bıgırî, bıbi bajarê mıxırbyane.
Eger Zin serdılıka teye, wê bî mınve bıbın dıduyane. (Memê Alan)

152. ŞERTÊ DEMANBÊ:

Eger ezê bıbezım	eger ezê çêkım
Heke tuyê bıbezi	heke tuyê çêki
Eger ewê bıbeze	eger ewê çêneke
Heke emê ne bezın	heke emê çênekın

153. ŞERTÊ ÇİROKİYA DEMANBÊ:

Heke ezê bıbezima	eger mınê çêkır
Heke tuyê bıbeziya	ku teyê çêkır
Eger ewê bıbeziya	eger wêyê çêkır
Heke ezê nebezima	heke wiyê çênekır

154. ŞERTÊ DEMA BÊYA HEVE DUDANÎ:

Eger ezê bezibım
Heger tuyê bezibi
Ku dê ew bezibın
Ku ezê ne bezibım

eger minê çekırıbe
heke dê we çekırıbe
ku wanê çekırıbe
ku dê we çenekırıbe

155. ŞERTÊ ÇİROKIYA DEMA BÊYA HEVE DUDANÎ:

Ger dê ez bezibûma
Ger ewê bezibûya
Heke ewê bezibûna
Ku ezê ne bezibûma

ger dê me çekırıbûya
ger weyê çekırıbûya
ku wiyê çekırıbûya
ku dê wan çenekırıbûya

Ger bızanım wez dı heşrêda nebinım dılberê
Cennetê dê jê çikım pê wer bıkıyım xakûsterê.

Ger wi bı vi rengi Mem rha kır
Derdêd dlê me wi dewa kır

Wer mayi mısır lı ser inadê
Em dê bıgırın wereng çêhdê

Ger dê wi nezer bıda me carek
İksirê teweccuha mubarek (Ehemedê xani)

Eger koledaran xwina gelên belengaz ne mêtına, dê çawan zengin bıbûna?

Dıvê bête zanin ku dı hinde ciyanda, hinde hoker ji mina daçekên şerti têne bıkaranın û bersıv ji dıxwazın lê ne şertine:

Dema tu hati, wê ji bine. Ciyê axa hebe ez naçımê.

Hingi gelê Kurd negihije mafê xwe, dê têkoşına wi bıdomine.

Kengi tu hati ezê vê pirtûka hêjay bıdım te

Balakêş: Jıbo zêde ci ne girtinê, şertiyên pêşkeri bı sê kesan û bı kesek ji neyini û bı du lêkeran hatın kşandın. Bı fermo hûn gişk lêkeran bı herşêş kesan bıkişinin.

WANE XXIV

DI LÊKERANDA RAWE

156. Raweyên daxwazi: Raweyên daxwazi bûyinê, krînê, ji demê gringûr bi daxwazê dînimîn. Herçiqas ne gring be ji disa bi ewayek dem têda heye.

Raweyên daxwazi pêncin:

Fermani

Xwestini

Blani

Vêni

Şert-daxwaz

Fermani, çawan di mjara fermanêda ji dê bête dabaş krîn ku ji-qurmê lêkera fermanê tê kêşan û ji dema bê ji ne tenhaye. Jibo vê yekê li ser wê sekînin naxwaze.

Ji bil fermaniyê, heryek ji raweyên daxwazi (xwestini, blani, vêni, şert, daxwaz) du celebî:

Daxwazi

Daxwaziyên hevedudani

Ji daxwaziyên rûtra daxwazi, ji daxwaziyên hevedudanira daxwaziyên hevedudani tê gotin û gişk xwedi çirokine ji.

157. Daxwaziyên rût: Ji qurmê lekera fermanê pêktên û ji dema

bê ji têne hejmartin. Şxwe cdaya wan jî dema bê ewe ku daçeka dema bê (ê, wê, dê tê) negirin.

Xwestîni	Blani	Vêni	Şert-daxwaz
Bîbîrim	bla bîbîrim	divê bîbîrim	heke bîbîrim
Bîbîrit	bla bîbîrit	divê bîbîrit	heke bîbîrit

Çawan li jorin jî dixwiyê ku xwestîni bê daçekeke. Blani, vêni û şert-daxwazê jî heryek daçeka xwe (bla, divê, heke) girtine.

158. Daxwaziyên hevedudani: Ev kêşan jî qurmê lêkerê û jî lêkera "bû be" pêktên û jî dema bori têne hejmartin. Şxwe cdaya wan jî dema bori, ewe ku lêkera "bû, be" dîgîrin:

Xwestîni	Blani	Vêni	Şert-daxwaz
Mîn bribe	bla mîn bribe	divê mîn bribe	heke te bribe
Te bribe	bla te bribe	divê te bribe	ku te bribe

Wsan xwiya ku xwestîni bê daçeka. Blani, vêni û şert-daxwaz, heryek daçeka xwe û gişkan jî lêkera "be" girtine.

Balakêş: Lêkera dema bê, lêkera xwestîni, lêkera blani, lêkera vêni û lêkera şert-daxwaz, dîgel hevedudani û çirokiyên xwe gişk jî hêmanên hev têne kêşan. Pzo xwestîni jî bê daçekiya xwe û ewên din jî heryek bi daçeka xwe jî hev cda dibin û têne nasin. Divê nvisvan û xwendekar jî van hajdar bîbîr ku neyêne tevlêhev krin:

Ezê	bînvîsîm	dema bê
Ez	bînvîsîm	xwestîni
Bla ez	bînvîsîm	blani
Divê ez	bînvîsîm	vêni
Ger ez	bînvîsîm	şert-daxwaz
Mîn dê	bînvîsiya	Çirokiya dema bê
Mîn	bînvîsiya	çirokiya xwestîni
Bla mîn	bînvîsiya	çirokiya blani
Divê te	bînvîsiya	çirokiya vêni
Eger te	bînvîsiya	çirokiya şert-daxwaz
Mînê	nvisibe	dema bêya hevedudani
Mîn	nvisibe	xwestîniya hevedudani
Bla te	nvisibe	blaniya hevedudani
Divê te	nvisibe	vêniya hevedudani

Ku me	nvisibe	şert-daxwaza hevedudani
Minê	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya dema bê
Me	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya xwestini
Bla te	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya blani
Divê wi	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya vênî
Eger wê	nvisibûya	çirokiya hevedudaniya şert-daxwaz

Bî vê rewşê hemî lêkerên zmanê me têne kêşan. Danîna daçekan jî peywîstîye. Divê bête zanîn ku ewên jî hêmana zmanê Kurdî tam agahdar nebûn van herpênc lêkeran, tevlihev dikin û jî bî der-nakevî.

FERMANÎ RAWEYA FERMANÎ

159. Raweya fermanî: Jiber ku bûyin yan jî krîn bî fermanê pêktê, jêra fermanî tê gotin. Wekî: Rindbe, qencbe, bîkîr. Bîfiroş.

Dî vê kêşanêda dem ne grînge. Ya grîng têgîhe. Dî zamê Kurdîda ferman, tenî jîbo yakani û praniya dudane. Daçek fermanî "bî" ye. Ev daçek lî pêşî bî lêkerê tê danîn.

Çawan dî mjara pêkhatîna qurmê lêkeranda (lî mjara III an bîncêrîn) hatibû ditin ku daçek fermanê, dî lêkerên xwerûda wekî xwarî bîxwe, frotî bîfiroş peywîstîye. Dî lêkerên arikerda wekî ava krîn ava ke ava bîke û lêkerên çekirîda wekî xemilandin bîxemilîn kêfîye. Dî lêkerên daçek da wekî vexwarî bîvexwe û jî lêkerên kê mî here, were bî vebîr nayê bikaranîn.

Daçek fermanî ya neyînî "me" ye. "Me" ya daçek neyînî bî ya daçek erênî têxe û ciyê wê digire. Dî gişk lêkeranda tê bikaranîn. Dî lêkerên hevedudaniyên daçekda, "me" ya daçek dîkeve navber pêşlêker û lêker gişk peve dizelîqîn. Dî lêkerên dînda, dîkeve pêşî û bî lêkeranve dizelîqe.

Dî hinde herêmê Kurdistanêda, lî ciyê "me" ya daçek "ne" bî-kartînin lê ev çewte gelek bête şemiranandin:

Nedervazî

Bîkev bîbez

Bîkevî bîbezî

Dervazî

bîçîn çêke

bîçînî çêkî

Neyini

Mekev mebez

Mekevın mebezın

meçin çêmeke

meçının çêmekın

Jıbo nermayi û domina fermanê ya yakani, "e" yek lı dawiyê bı lêkerve tê danin:

Bıkeve bıbeze

Mekeve mebeze

bıçine çêke

meçine çêmeke

Balakêş: Eger qurmê lêkerê tıpek teni be, "e" yek pêve danin çêtire û êdi "e" yek dın naxwaze. Weki: Krın "k" bıke. Çêkırın ji jı vê beşêye.

Balakêş: Gava "bı" ya daçekka fermanê, lı pêşi lêkera kêm "he-re" bête danin, têgıha wê dıguhere. Weki: Bıhere, yani vê tıştê bıhere, bıbe.

Megır, ku te gırt bermede, ku te berda lı pê meçe (Gotina mezınan)

Karker û gelên bındest bıbın yek. (Lenin)

Gelên bındest! berê xwe bıdın xwinmij û koledaran û bızanın ku gel û karkerên netewê serdest brayên wene.

XWESTINI

Raweya xwestini

160. Raweya xwestini: Jıber ku bûyin yan ji krın bı xwestinê pêktê, jêra raweya xwestini tê gotın.

Ev kêşan, heke jı çêbûna xwe, heke jı têgıha xwe dı nav dema bêda tê ditın û xwestinê ifade dıke. Carna daçekên sedemi (da, ku) cda têne pêşi lêkera xwestini têgıha wê zelaltır dıke. Mina: Şûr kêşa da lêxe, Reşo tving bır ku axê bıkuje. Yani sedem Lêxistinê şur kêşa û sedem kuştinê tving bır. Dıvê qenc bête zanin, ev "ku" ne şertiye, ne cinavke û ne ji grêke. Jı vê "ku" yêra "ku" ya sedemi tê gotın.

Raweya xwestini jı qurmê lêkera fermanê tê kêşan. Dı lêkerên xwerûda, "bı" ya daçekka fermanê lı ciyê xwe dimine û dı gişk kêşananda qertaf cinavk têne danin. Gava kırde ne cinavk be, dı

yekaniya sîsêyanda bî lêkerve danina "t" yek çêture. Mina: Rabî, bîbêjî. Vi ewayi qenctî, xwestîniya sîsêyan jî fermaniya dudan tê qetandin. Carna "t" dibe "tîn" jî. Mina: Bîrevî, bîçî, rabî:

Nedervazî

Ez bîkevî	ez bîbezî
Tu bîkevi	tu bîbezi
Ew bîkeve	ew bîbeze
Em bîkevî	em bîbezî
Hûn bîkevî	hûn bîbezî
Ew bîkevî	ew bîbezî

Dervazî

Ez bîçînî	ez çêkî
Tu bîçînî	tu çêki
Ew bîçîne	ew çêke
Em bîçînî	em çêkî
Hûn bîçînî	hûn çêkî
Ew bîçînî	ew çêkî

Neyînî

Ez nêrevînî	ez ranêkevî
Tu nêkenî	tu wênegî

Gava ku dema me jî wek te hat
 Em dest bîdî hev bî kar û xebat
 Serê te jî wek serê xwedî mel
 Jî hev belav bîkî tev bîkî qenal (Cîgerxwîn)
 Dest davêje mawîzerê ku lî wî bîxe (Rabûn)
 Em dibîstanan bîxwînî kar û pişik hî bîbî
 Bax û bostanan bîçînî çiçek û gul şî bîbî (Cîgerxwîn)
 Em bî ser dijîmî wek pê û brûskan bîrîjî
 Gerçî em dê bêne kuştî wî digel xwe bîkujî (Cîgerxwîn)

ÇIROKÎYA XWESTÎNÎ

161. Çirokiya xwestîni: Jîber ku bî çiroki dabaş jî xwestînê tê krî. Jêra çirokiya xwestîni tê gotî.

J1 qurmê lêkerê tê kêşan. "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dı-
mine. Lı dawiya kêşananve "a" ya çiroki tê danin.

Dı lêkerên nedervazida qertaftcinavk û lı navber du dengdêran
"y" ya kelijandinê neyê jı bir krın:

Nedervazi

Ez bıketıma	ez bıbezima
Tu bıketaya	tu bıbeziya
Ew bıketa	ew bıbeziya
Em bıketına	em bıbezina
Hûn bıketına	hûn bıbezina
Ew bıketına	ew bıbezina

Dervazi

Mın bıçanda	mın çêkıra
Te bıçanda	te çêkıra
Wi bıçanda	wê çêkıra
Me bıçanda	me çêkıra
We bıçanda	we çêkıra
Wan bıçanda	wan çêkıra
Neyini	
Me negırwaya	me hılnekıra
We neşemıranda	we venexwara

Balakêş: Têgıha çirokiyê dı çirokiyên raweyên pêşkerida ha-
tıbûn vekıtandin. Êdi dı vanda em ser nasekının.

Xwezıya ku lı mın xezeb kıra mir
Manendê Memê bı qeyd û zencir
Ez jı bışıhandıma wê çalê
Rojek veketa lı mın jı salê
Carek bıdiya mın ew grıftar
Derman bıkıra mın ew brındar
Emrê mın eger çı yek remeq bû
Heqa ku mırın jı bo me heq bû (Ehmedê Xani)

XWESTINIYA HEVEDUDANI

162. Xwestuniya hevedudani: Jiber ku bûyin yan ji krîn bî xwestinê tê nişan dan "xwestini" û jî du lêkeran pêktê hevedudaniye jî. Jîbo vê yekê jêra xwestuniya hevedudani tê gotin.

Çawan xwestini dî nav dema bêda tê ditin, xwestuniya hevedudani jî heke bî têgîha xwe û heke çêbûna xwe dî nav dema borida dixwiyê.

Jî qurmê lêkerê û jî lêkera "bû, be" pêktê. Lêkera "be" herweki qertafeki edeti lî dawî bî lêkerve tê danin.

Dî lêkerên nedervazida qertafcinavk lî cîyê xwe radiwestin:

Nedervazi

Ez ketibim	ez bezibim
Tu ketibi	tu bezibi
Ew ketibe	ew bezibe
Em ketibin	em bizibin
Hûn ketibin	hûn bezibin
Ew ketibin	ew bezibin

Dervazi

Mîn çandibe	mîn çêkıribe
Te çandibe	te çêkıribe
Wê çandibe	wî çêkıribe
Me çandibe	me çêkıribe
We çandibe	we çêkıribe
Wan çandibe	wan çêkıribe

Neyini

Te ne xwestibe	te hîlnedabe
We ne guherandibe	te ranehejandibe

Xwestuniya hevedudani ya lêkera zani, kari û wêri, bî vi ewayi jî tê bîkaranin:

Ez bîzanibim	tu bîzanibi	ew bîzanibe
Ez bîwêribim	tu bîwêribi	ew bîwêribe
Em bîkaribin	hûn bîkaribin	ew bîkaribin

Zanibe bawer bîke mîlet jî dijmin meztire (Cigerxwin)

ÇIROKIYA XWESTINIYA HEVEDUDANI

163. Çirokiya xwestiniya hevedudani: Jiber ku xwestiniya hevedudani bî çiroki tê dabaş krîn, jêra çirokiya xwestiniya hevedudani tê gotin. Jî xwestiniya hevedudani guherti, "a" ya çiroki lî dawî lêkeran tê zêde krîn û lêkera "be" jî dibe "bû". Mina" Ez xemîlibûma, tu veşiribûya:

Nedervazi

Ez ketibûma

Tu ketibûya

Ew ketibûya

Em ketibûna

Hûn ketibûna

Ew ketibûna

Dervazi

Mîn çandibûya

Te çandibûya

Wi çandibûya

Me çandibûya

Neyini

We ne kelijandibûya

tu bezibûya

ez bezibûma

ew bezibûya

em bezibûna

hûn bezibûna

ew bezibûna

mîn çêkiribûya

te çêkiribûya

wê çêkiribûya

me çêkiribûya

wan veneçerixandibûya

164. Ev herdu kêşan (xwestiniya hevedudani û çirokiya wê) hindik têne bîkaranin. Gava têne bîkaranin jî herwekî ku têgîha şert-daxwaz dîdîn. Geleke bête zanin ku peywendîya xwestinî bî şert-daxwazra tune. Lewra bê daçek, şert-daxwaz nayê hzîrin û nabêjî.

Balakêş: Mîn hejandîba, mîn hejandîbûwa, mîn razandîba û mîn razandîbûwa jî têne xebîtantîn.

WANE XXV

RAWEYA BLANÎ

Blani, xwestîna blani, fermana blani

165. Raweya blani: Ev rawe ji mina raweya xwestîni jî dema bê tê hejmartin.

Jîber ku bûyin yanji krîn bî daçeka "bla" pêktê jêra blani tê gotin. Têgîha wê di navber xwestin û fermanêdaye. Yani fermanek xwestîni yan jî xwestînek fermanîye. Wekok: Bla Reşo mir bîqute, bla Qerwaş xema xatûna xwe meke, bla tu bîçî şerê koledaran, bla ez bîçmê...

Jî qurmê lekera fermanê û daçeka "bra, bera, bere, bla" pêktê. Yek jî van daçekan lî pêşî lêker heta lî pêşî kîrde cda tê danin û "bî" ya daçeka fermanê lî cîyê xwe dîmine. Di hemî kêşananda qertafcinavk tene danin:

Nedervazi

Bla ez bîkevîm

Bla tu bîkevi

Bla ew bîkeve

Bla em bîkevîn

Bla hûn bîkevîn

Bla ew bîkevîn

bla ez bîbezîm

bla tu bîbezi

bla ew bîbeze

bla em bîbezîn

bla hûn bîbezîn

bla ew bîbezîn

Dervazi

Bla ez bıçınım
 Bla tû bıçını
 Bla ew bıçine
 Bla em bıçının
 Bla hûn bıçının
 Bla ew bıçının

bla ez çekim
 bla tu çeki
 bla ew çeke
 bla em çekin
 bla hûn çekin
 bla ew çekin

Neyini

Bla em neçının
 Bla ew nekın

bla em veneçının
 bla hûn venekın

Balakêş: Yekaniya sîsêyan: Bla rındbıt, bla rakevıt, bla bınıt, bla bıxwıt bête bıkaranın çêtire.

 Bla bıt saimê dehrê, bla iftari carek bıt (M. Cziri)

ÇİROKIYA BLANI

166. Çirokiya blani: Jıber ku blani bı çiroki tê dabaş krın, jêra çirokiya blani tê gotın. Şxwe dı blanida têgıha wê hatbû vekıtandın. Ev ji çirokiya wêye.

Jı qurmê lêkerê tê kêşan û "bı" ya daçeka fermanê lı ciyê xwe dıminc. Lı dawıya lêkerve "a" ya çiroki tê zeliqandın, daçekek ji daçekên blani (bla, bra, bera, bere) cda lı pêşi lêker heta lı pêşi kırde tê danin. Bı dawıya lêkerên nedervazive qertıfandına qertafci-navkan dıxwaze û tipên kelıjandınê ji neyên jı bir krın:

Nedervazi

Bla ez bıketıma
 Bla tu bı ketıya
 Bla ew bıketa
 Bla em bıketına
 Bla hûn bıketına
 Bla ew bıketına

bla ez bıbezima
 bla tu bıbeziya
 bla ew bıbeziya
 bla em bıbezina
 bla hûn bıbezina
 bla ew bıbezina

Dervazi

Bla mın bıçanda
 Bla te bıçanda

bla mın çekıra
 bla te çekıra

Bla wê biçanda
Bla me biçanda
Bla we biçanda
Bla wan biçanda

bla wi çêkîra
bla me çêkîra
bla we çêkîra
bla wan çêkîra

Neyini

Bla te netewîzanda
Bla te neşêlanda

bla te veneqetanda
bla tu raneketîya

Balakêş: Gava bla me biçandîna, bla we biçandîna, bla wan biçandîna bête bıkaranin, serve praniye. Yani me zewî biçandîna. Zewî ji yekî pirtire.

Bla jê bîhata bla sîfte serê mîn bîşkinanda. (Gotîna mezînan)
Bla bîxwenda paşî bîgota

BLANIYA HEVEDUDANÎ

167. Blaniya hevedudani: Jîber ku jî daçeka bla û jî du lêkeran pêktê, jêra blaniya hevedudani tê gotin.

Çawan blani dî nav dema bêda, blaniya hevedudani jî dî nav dema borîda tê ditin lê têgîha wan nîzîkê hevîn. Şxwe hinde herêm dî ciyên hevda bîkartînin.

Jî qurmê lêkerê û jî lêkera "bû, be" pêktê. Lêkera "be" herwekî qertafek lî dawî bî lêkerve tê zeliqandin. "bla" ya daçek jî lî pêşî lêker heta lî pêşî kîrde cda tê danîn. Dî lêkerên nedervazîda, qertafcinavk bî lêkera "be" ve têne qerufandin:

Nedervazî

Bla ez ketûbîm
Bla tu ketûbî
Bla ew ketûbe
Bla em ketûbîn
Bla hûn ketûbîn
Bla ew ketûbîn

bla ez bezibîm
bla tu bezibî
bla ew bezibe
bla em bezibîn
bla hûn bezibîn
bla ew bezibîn

Dervazî

Bla mîn çandîbe
Bla te çandîbe

bla mîn çêkîrîbe
bla te çêkîrîbe

Bla wê çandibe
Bla me çandibe
Bla we çandibe
Bla wan çandibe

bla wi çêkırıbe
bla me çêkırıbe
bla we çêkırıbe
bla wan çêkırıbe

Neyini

Bala wan ne reşandibe
Bla we ne gerandibe

bla wan venereşandibe
bla we venegerandibe

Blaniya hevedudaniya lêkera zani, kari û wêri bı vê rewşê ji tê bıkaranin:

Bla ez bıkarıbım bla tu bıkarıbi bla ew bıkarıbe
Bla ez bızanıbım bla tu bızanıbi bla ew bızanıbe
Bla em bızanıbın bla hûn bızanıbın bla ew bızanıbın
Bla ez bıwêrbım bla tu bıwêrıbi bla ew bıwerıbe

Bla mêbe şır qismete

Bla şandibe, bla hındıkbe (Gotın)

ÇİROKİYA BLANIYA HEVEDUDANİ

168. Çirokiya blaniya hevedudani: Jıber ku blaniya hevedudani, bı çiroki tê dabaş krın jêra çirokiya blaniya hevedudani tê gotın.

Pêkhatına vê kêşanê ji blaniya hevedudani guherti, "a" ya çiroki bı dawiya kêşananêve tê danin û "be" ya lêkerji dibe "bû". Mina: Bla drûbûya, bla revibûya, bla dadabûya:

Nedervazi

Bla ez ketıbûma
Bla tu ketıbûya
Bala ew ketıbûya
Bla ew ketıbûna
Bla hûn ketıbûna
Bla ew ketıbûna

bla ez bezibûma
bla tu bezibûya
bla ew bezibûya
bla ew bezibûna
bla hûn bezibûna
bla ew bezibûna

Dervazi

Bla mın çandıbûya
Bla te çandıbûya
Bla wi çandıbûya

bla mın çêkırıbûya
bla te çêkırıbûya
bla wê çêkırıbûya

Bla me çandibûya
Bla we çandibûya
Bla wan çandibûya

Neyini

Bla te ne dabûya
Bla me ne qetandibûya
Bla we ne kırıbûya

bla me çekırıbûya
bla we çekırıbûya
bla wan çekırıbûya

bla te venedabûya
bla me raneqetandibûya
bla we ranekırıbûya

Çirokiya blaniya hevedudani ya lêkera zani, kari û wêri bı vi
ewayi ji tê kêşan:

Bla mın bızanibûya
Bla me bıkaribûya
Bla wê bıwêribûya

bla te bızanibûya
bla we bıkaribûya
bla wi bıwêribûya

Ev qayde jibo xwestini, vênî û şert-daxwaz ji dibe:

Mın bızanibûya
Divê me bızanibûya
Eger wi bızanibûya

te bızanibûya
divê we bızanibûya
eger wê bıwêribûya

Balakêş: Bla kolaba, bla kolabûwa, bla bızanıba, bla bızanibûwa ji têne bıkaranın û neyiniya wan ji wsan.

WANE XXVI

RAWEYA VÊNI

Luzomi, peywisti, bivênevi

169. Raweya vênî: Jiber ku bûyin yan jî krîn bî bivênevi û bî luzomiyê pêktê jêra raweya vênî tê gotin û têgîha bivêneviyê, peywistiyê dide. Wekok: Divê tu biçî dbîstanê, divê tu pirtûkan pîr bixwini û divê tu waneyê xwe qenc bîzani. Yani çûyina te ya dbîstanê, pîr pirtûk xwendina te û zanina te ya waneyan peywistiye.

Dem û pêkhatina vê rawê mina raweya blaniye (lî mjara 165 an binêrîn) tenî dî ciyê "bla" ya daçekda "gereke, geleke, gotî û divê" yek jî van daçekên vênî têne danin û têgîha vênî dîdîn:

Nedervazi

Divê ez bîkevîm

Divê tu bîkevi

Divê ew bîkeve

Divê em bîbezîm

Divê hûn bîkevîn

Divê ew bîkevîn

Dervazi

Divê ez biçînim

Divê tu biçîni

divê ez bîbezîm

divê tu bîbezi

divê ew bîbeze

divê em bîkevîn

divê hûn bîbezîm

divê ew bîbezîm

divê tû çêki

divê ez çêkîm

Divê em biçinin
 Divê hûn biçinin
 Divê ew biçinin
 Divê ew biçine
Neyini
 Divê ez neqewîrînim
 Divê tu newesti
 Divê ew nesekine

divê em çêkîn
 divê hûn çêkîn
 divê ew çêkîn
 divê ew çêke

 divê ez raneqewîrînim
 divê tu ranewesti
 divê ew venesekine

ÇIROKIYA VÊNI

170. Çirokiya vênî: Jîber ku vênî bî çiroki tê dabaş krîn, jêra çirokiya vênî tê gotin.

Mina çirokiya blani pêktê (lî mjara 166 an bînêrîn). Teni daçekek ji daçekên vênî (gereke, geleke, gotî, divê) di ciyê "bla" da tê danin:

Nedervazi

Divê ez bîketîma
 Divê tu bîketîya
 Divê ew bîketa
 Divê em bîketîna
 Divê hûn bîketîna
 Divê ew bîketîna

divê ez bîbezîma
 divê tu bîbezîya
 divê ew bîbezîya
 divê em bîbezîna
 divê hûn bîbezîna
 divê ew bîbezîna

Dervazi

Divê mîn biçanda
 Divê te biçanda
 Divê wê biçanda
 Divê me biçanda
 Divê we biçanda
 Divê wan biçanda

divê te çêkîra
 divê mîn çêkîra
 divê wî çêkîra
 divê me çêkîre
 divê we çêkîra
 divê wan çêkîra

Neyini

Divê wê nekîra
 Divê ew nebûna
 Divê ew neketa

divê wî ranekîra
 divê ew venebûna
 divê ew veneketa

Balakêş: Herçiqas vin, vên, vêyan û gotin raderin ji û lêker ji ji-

wan têne kşandin lê dı vır da bı daçekî têne bıkaranin. Heta bı vi rengi bêne bıkaranin daçekın.

VÊNIYA HEVEDUDANÎ

171. Vêniya hevedudani: Jıber ku vênî bı du lêkeran pêktê, jêra vênîya hevedudani tê gotın.

Dem û pêkhatına vê rawê mina blaniya hevedudaniye. Teni dı ciyê "bla" da, yek jı daçekên vênî tê danin û têgıha vênî dıde:

Nedervazi

Goti ez ketıbım	goti ez bezıbım
Divê tu ketıbi	divê tu bezıbi
Goti ew ketıbe	goti ew bezıbe
Goti em ketıbın	goti em bezıbın
Divê hûn ketıbın	divê hûn bezıbın
Goti ew ketıbın	goti ew bezıbın

Dervazi

Gereke mın çandıbe	gereke mın çêkırıbe
Geleke te çandıbe	geleke te çêkırıbe
Geleke wê çandıbe	geleke wi çêkırıbe
Gereke me çandıbe	gereke me çêkırıbe
Gereke we çandıbe	gereke we çêkırıbe
Geleke wan çandıbe	geleke wan çêkırıbe

Neyini

Goti tu ne şemitıbi	goti tu veneşemitıbi
Geleke ew ne beyıbe	geleke ew venebeyıbe

Vêniya hevedudaniya lêkera zani, kari, wêri wlo ji dıbe:

Divê tu bızanıbi, divê tu bıkarıbi, divê tu bıwêrıbi

ÇİROKIYA VÊNIYA HEVEDUDANÎ

172. Çirokiya vênîya hevedudani: Jıber ku vênîya hevedudani bı çiroki dabaş jê tê krın, jêra çirokiya vênîya hevedudani tê gotın. Mina çirokiya blaniya hevedudani pêktê. Teni daçekek jı daçekên vênî dı ciyê "bla" da tê danin û têgıha vênî dınımine:

Nedervazi

Divê ez ketibûma

Goti tu ketibûya

Gereke ew katibûya

Geleke em ketibûna

Divê ew ketibûna

geleke ez bezibûma

geleke tu bezibûya

geleke ew bezibûya

divê hûn bezi bûna

divê ew bezibûna

Dervazi

Gereke min çandibûya

Gereke te çandibûya

Geleke wê çandibûya

Gereke me çandibûya

Geleke we çandibûya

Goti wan çandibûya

geleke min çêkırîbûya

gereke te çêkırîbûya

geleke wi çêkırîbûya

gereke me çêkırîbûya

geleke we çêkırîbûya

goti wan çêkırîbûya

Neyini

Goti te ne jendibûya

Goti me ne kuştibûya

Divê we ne kêşabûya

divê te venci jendibûya

goti me venekuştibûya

divê we venekêşabûya

Gereke tu çûbuya arikariya gel û karkeran.

Ey dost bî dîl be yarê qencan

Ya qenc bîbe neyarê qencan

Ew qencin ew qencyê dîzanin

Ew xeyrê qencyê tu nîzanin

Hîndê ku bî wan bîki cefayê

Ew dê bîgîrî bî dîl wefayê

Zînhar mebe muhubê xîraban

nedost ne dijminê kulaban

ger dostbî dê bîkî nî te murdar

wer dijmini dê bîkî nî bîrindar (Ehmedê Xani)

WANE XXVII

ŞERT-DAXWAZ

Raweya şert-daxwaz, raweya şertê daxwazi

173. Raweya şert-daxwaz: Jiber ku Bûyin yanji krin bî şertanve tê grêdan û jî hêmana daxwazê jî tê hmatê, jêra şert-daxwaz tê gotin.

Hevokek şert-daxwazi: Eger koledar bêne qewirandî dê gel rîzgar bibe, hekerne tentêl naguhere. Jî vê hevokê hate zanîn, rîzgarîya gel bî şertê qewirandîna koledarve û ne guhertin jî bî mayîna wanve hatiye grêdan.

Guhertîna şert-daxwazê jî şertiyên pêşkerî ewe ku jî hêmana daxwazê pêktê. (Lî mjara 144 an binêrîn)

Dem û pêkhatîna vê rewê mina raweya blaniye. (Lî mjara 165 an binêrîn) Tenî dî ciyê "bla" ya daçekda, daçekek jî daçekên şerti (er, wer, ger, eger, heke, heker û ku) tê danîn û têgaha şert-daxwazê pêktê:

Nedervazi

Eger ez bîkevîm
Wer tu bîkevi
Heke ew bîkeve
Er em bîkevîn
Ger ew bîkevîn

eger ez bîbezîm
wer tu bîbezi
heke ew bîbeze
er em bîbezîn
ger ew bîbezîn

Ku hûn bıkevın
Dervazi
Heker ez bıçınım
Heke tu bıçını
Ger ew bıçine
Eger em bıçının
Er hûn bıçının
Wer ew bıçının
Neyini
Eger ez negihijınım
Eger tu negijgijini
Wer ew negire

ku hûn bıbezın
heker ez çêkım
heke tu çêki
ger ew çêke
eger em çêkın
er hûn çêkın
wer ew çêkın
eger ez ranegihijınım
heke tu venegijgijini
wer ew venegire

ÇİROKIYA ŞERT-DAXWAZ

174. Çirokiya şert-daxwaz: Jıber ku şert -daxwaz bı çiroki tê da-
baş kın, çirokiya şert-daxwaz tê gotın

Ev çiroki mina çirokiya bilani pêktê (l1 166 an bınêrın). Teni da-
çekek ji daçekên şerti dı ciyê "bla" da tê danin û têgihî çirokiya
şert-daxwaz tê hmatê:

Nedervazi
Heke ez bıketıma
Eger tu bıketıya
Wer ew bıketa
Ger em bıketına
Er hûn bıketına
Ku ew bıketına

Dervazi
Heke mın bıçanda
Eger te bıçanda
Ger wê bıçanda
Wer me bıçanda
Er we bıçanda
Ku wan bıçanda
Neyini
Heke mın nekıra

heke ez bıbezıma
heke tu bıbeziya
wer ew bıbeziya
ger em bıbezina
er hûn bıbezina
ku ew bıbezina

heke mın çêkıra
eger te çêkıra
ger wi çêkıra
wer me çêkıra
er we çêkıra
ku wan çêkıra

heke mın ranekıra

Eger ew nezabûya
Ger te neweşanda

eger ew ranezabûya
ger te raneweşanda

ŞERT-DAXWAZA HEVEDUDANİ

175. Şert-daxwaza hevedudani: Jiber ku şert-daxwaz jî du lêkeran pêktê, jêra şert-daxwaza hevedudani tê gotin.

Dem û pêkhatina vê, mina blaniya hevedudaniye. (L1 mjara 167 an binêrîn) Teni dî ciyê "bla" da daçekek jî daçekên şerti tê danin û têgiha şert-daxwaza hevedudani pêktê:

Nedervazi

Heker ez ketûbim
Heke tu ketûbî
Eger ew ketûbe
Ger em ketûbîn
Er hûn ketûbîn
Wer ew ketûbîn

heker ez bezibim
heke tu bezibî
eger ew bezibe
ger em bezibîn
er hûn bezibîn
wer ew bezibîn

Dervazi

Eger min çandibe
Ger te çandibe
Wer wê çandibe
Heke me çandibe
Heker we çandibe
Ku wan çandibe

eger min çêkıribe
ger te çêkıribe
wer wê çêkıribe
heke me çêkıribe
heker we çêkıribe
ku wan çêkıribe

Neyini

Heke te ne xistibe
Eger wê ne jiyandibe
Ger ew ne mırbe

heke te vênexistibe
eger wi venejiyandibe
ger ew venemırbe

ÇIROKIYA ŞERT-DAXWAZA HEVEDUDANİ

176. Çirokiya şert-daxwaza hevedudani: Jiber ku şert-daxwaza hevedudani bî çiroki dabaş jê tê krîn, jêre çirokiya şert-daxwaza hevedudani tê gotin.

Mina çirokiya blaniya hevedudani pêktê. (L1 mjara 168 an binêrîn) Teni daçekek jî daçekên şerti dî ciyê daçeka "bla" da tê da-

nin û têgîha çirokiya şert-daxwaza hevedudani tê hmatê:

Nedervazi

Heker ez ketîbûma
Heke tu ketîbûya
Eger ew ketîbûya
Ger em ketîbûna
Ku hûn ketîbûna
Wer ew ketîbûna

heker ez bezîbûma
heke tu bezîbûya
eger ew bezîbûya
ger em bezîbûna
ku hûn bezîbûna
wer ew bezîbûna

Dervazi

Ger mîn çandîbûya
Eger te çandîbûya
Heke wê çandîbûya
Wer me çandîbûya
Ger we çandîbûya
Er wan çandîbûya

ger mîn çêkîrîbûya
eger te çêkîrîbûya
heke wi çêkîrîbûya
wer me çêkîrîbûya
ger we çêkîrîbûya
er wan çêkîrîbûya

Neyini

Heke te ne rîstîbûya
Eger we ne bîjartîbûya
Ku mîn ne kîrîbûya

heke te vînerîstîbûya
eger we hîlnebjartîbûya
ku mîn danekîrîbûya

Hinde herêmê Kurdistanê: heke pelîxandîba, heke pelîxandîbûwa, eger razandîba, eger razandîbûwa bîkartinin.

Balakêş: Jîbo bî hêsanî hin bûn û ne şaş krîna xwendevanan, dî gişk wekokên kêşana lêkeranda, lêkera "ket, bezi, çand û çêkîr" hatin bîkaranin. Geleke qenc bête zanin ku çqas lêkerên Kurdi hene gişk bî qayda van herçar lêkeran tene kşandin.

Balakêş: Hevedudani û hevedudaniyên çiroki ya lêkera zani, kari û wêri, kêşana dema bê: Ezê bîzanîbîm, mînê bîzanîbûya, xwestîni: Ez bîzanîbîm, mîn bîzanîbûya, blani: Bla ez bîzanîbîm, bla mîn bîzanîbûya, vîni: Dîvê ez bîzanîbîm, dîvê mîn bîzanîbûya û şert-daxwaz: Heke ez bîzanîbîm, heke mîn bîzanîbûya, herwekî raweyên serbîxwe dîxwîyên jî lê mîn cdayek grîng dî navber van û hevdudani û hevedudaniyên çirokiyên dînda ne dît. Sedem vê yekê me lî dawîya hevedudaniya dema bê (141), hevedudaniya çirokiye dema bê (142), lî dawîya xwestîniya hevedudani (162), lî dawîya blaniya hevedudani (167), çirokiya blaniya hevedudani (168) û lî dawîya vîniya hevedudani (171) dabaş kîr û êdî lî ser ne sekînin.

Parçek xwendinê WELAT

178. Welat erda bav û kalane. Mafê her keseke ku ji welatê xwe hez bike, ava bike û biparêze. Ewê ji welatê xwe hez neke û ne-parêze, tu heyinên xwe yên netewî, cvakî û kesî nikare biparêze. Berkêşan, mafe, dad, aborî û gişk heyinên jî cvatanra divên di nav welêda pêktên. Hez krîna welêt wekheve welatî. Welatî brayên hevîn û brayên gelên Dnî. Kar û ziyana wan yên hevîn.

Kesê jî welatê xwe hez dîke, jî weletiyên xwe jî hezdîke û kesê jî welatiyên xwe hez dîke jî gelên Dnî gişk hez dîke.

Hez krîna welêt, yê gel û yê refa serdest ne jî hevîn. Refa serdest mîna gurên devbixwin welat û welatiyan talan dîkî, dîmîjî û bî hovane mal û emaka wan dîxwî. Tu gavê refa serdest, bratiya gelan naxwaze û napejîrîn jî. Refa serdest brayê biyanîyane û di fermana rîsta emperyalîst û mjokerandane

Welatê me Kurdîstane, cîyê bav û kalane. Bav û kalên me têda hatîne Dnî, jîna xwe domandîne û têda mîne. Jîbo parastîna welêt şer krîne, kuştîne û hatîne kuştî. Axa welêt bî xwîna wan hatiye vestîrandî û jî mera hatiye pêşkêş krî. Divê em jî welatê xwe biparêzî, ava bîkî, him têda rûnî û him jî welatek ava jî nesla bêra pêşkêş bîkî

Welatê me welatekî freh, mezî pîr xweşe. Tevda çîya, deşt, mîrg, zozan, rê û kanîne. Gişk hêjanên sererd û bînerd têda hene. Nemaze tevda gewher û nîfte. Her celebên berkêşanê dîgîhîjîne, lê tu lî vê sodretê bînêre ku di vî welatê dewlemenda, welatî bîrçî tazi, dil û xzanî. Tenî têda axa, şêx, dede, ajan û burjuwayên şol-yekbûy tîrî. Ev refa bextreş, dîjmînê gel û di fermane emperyalîst-mjokerdanî. Welat dîmîjî, dîxwî bî dîjmînan dîdî xwarî. Şxwe gava jî wan tê pîrsî "em ne Kurdî" dîbêjî. Pî wan njada xwe dîgîhînan mezînen olî yên Ereban û hnek jî wan jî "Tirkê esil emîn, yên di Anadolêda ne Tirkî" dîbêjî.

Hostayê mezî Cîgerxwî, dewlemendiya welêt şerpezetî, bîrçî-tî û belengaziya gelê Kurd dîbine û jî kovana dlê xwe wha dîqire:

Welatê me tev xêr û bêre

Tev medene, tev ziv û zêre

Çi kîm iro maye jî xelqêre

Belê hosta rast dibêje. Piştê şerê parve krîna emperyalîstan yê
yekem, Kurdistan destê emperyalîst û mjokeran hate belav krîn û
xîstî çar parçe.

		Raweyên pêşkeri		Tabloya tevayî	
		Boriya têdayî	Boriya dûdar	Nho û freh	Dema bê
		mîn zani te zani wê zani me zani we zani wan zani	mîn zaniye te zaniye wi zaniye me zaniye we zaniye wan zaniye	ez dîzanîm tu dîzani ew dîzane em dîzanîn hûn dîzanîn ew dîzanîn	ezê bîzanîm tûyê bîzani ewê bîzane emê bîzanîn hûnê bîzanîn ewê bîzanîn
	Neyini	mîn ne zani	te ne zaniye	ew nîzane	ewê nezane
	Şerti	ku mîn zani ku me zani	ku te zaniye ku wê zaniye	ku tu dîzani ku ew dîzanîn	ku emê bîzanîn ku ewê bîzanîn
					Mînê zanibe teyê zanibe wêyê zanibe meyê zanibe weyê zanibe wanê zanibe
	Neyini				mînê ne zanibe
	Şerti				ku meyê zanibe ku weyê zanibe
				mîn dîzaniya te dîzaniya wê dîzaniya me dîzaniya we dîzaniya wan dîzaniya	mînê bîzaniya teyê bîzaniya wiyê bîzaniya meyê bîzaniya weyê bîzaniya wanê bîzaniya
		Neyini		te ne dîzaniya	meyê nezaniya
		Şerti		ku me dîzaniya ku we dîzaniya	ku weyê bîzaniya ku meyê bîzaniya
			Mîn zanibû te zanibû wê zanibû me zanibû we zanibû wan zanibû	mîn dîzanibû te dîzanibû wê dîzanibû me dîzanibû we dîzanibû wan dîzanibû	Mînê zanibûya teyê zanibûya wiyê zanibûya meyê zanibûya weyê zanibûya wanê zanibûya
		Neyini	te ne zanibû	me ne zanibêye	we ne dîzanibû
		Şerti	ku mîn zanibû ku te zanibû	ku me zanibêye ku wi zanibû	ku weyê zanibûya ku meyêzanibêya

Balakêş: Sedem ci teng bûnê, neyini gorê kesek û şertiyên pêşkeri ji gorê du kesen hatin kîşandin. Hûn bi her şeş kesan ji bîkîşîn

Raweyên daxwazi (inşai)

Xwestini	Blani	Vêni	Şert-daxwaz	Fermani
ez bızanım tu bızani ew bızane em bızanin hûn bızanin ew bızanin	bla ez bızanım bla tu bızani bla ew bızane bla em bızanin bla hûn bızanin bla ew bızanin	divê ez bızanım divê tu bızani divê ew bızane divê em bızanin divê hûn bızanin divê ew bızanin	ku ez bızanım ku tu bızani ku ew bızane ku em bızanin ku hûn bızanin ku ew bızanin	bızan bızanin
ez nezanım	bla ez nezanım	divê ez nezanım	ku tu nezani	mezan
mın zanibe te zanibe wê zanibe me zanibe we zanibe wan zanibe	bla mın zanibe bla te zanibe bla wi zanibe bla me zanibe bla we zanibe bla wan zanibe	divê mın zanibe divê te zanibe divê wê zanibe divê me zanibe divê we zanibe divê wan zanibe	ku mın zanibe ku te zanibe ku wi zanibe ku me zanibe ku we zanibe ku wan zanibe	
me ne zanibe	bla me ne zanibe	divê we ne zanibe	ku wan ne zanibe	
mın bızaniya te bızaniya wi bızaniya me bızaniya we bızaniya wan bızaniya	bla mın bızaniya bla te bızaniya bla wê bızaniya bla me bızaniya bla we bızaniya bla wan bızaniya	divê mın bızaniya divê te bızaniya divê wê bızaniya divê me bızaniya divê we bızaniya divê wan bızaniya	ku mın bızaniya ku te bızaniya ku wi bızaniya ku me bızaniya ku we bızaniya ku wan bızaniya	
mın nezaniya	bla me nezaniya	divê we nezaniya	ku wan nezaniya	
mın zanibûya te zanibûya wê zanibûya me zanibûya we zanibûya wan zanibûya	bla mın zanibûya bla te zanibûya bla wi zanibûya bla me zanibûya bla we zanibûya bla wan zanibûya	divê mın zanibûya divê te zanibûya divê wê zanibûya divê me zanibûya divê we zanibûya divê wan zanibûya	ku mın zanibûya ku te zanibûya ku wê zanibûya ku me zanibûya ku we zanibûya ku wan zanibûya	
me ne zanibûya	bla we ne zanibûya	divê te ne zanibûya	ku wan ne zanibûya	

WANE XXVIII

BÛN

179. Lêkera bûn: Lêkera bûn, ji navdêr (nav, cinavk, rengdêrû hoker) an tê kêşan. Bî navdêranve qertifandîna qertaflêker (m, im, i, in, bi, bc, bû) an pêktê.

Lêkera bûn, dema freh, çirokiya têdayî, çirokiya dûdar, dema bê, çirokiya dema bê, raweyên daxwazî û çirokiyên wan jê tîr kêşan. Mina:

Ez rindim, ez rindbûm, ez rindbûme, ezê rindbim
Ezê rindbûma, ez rindbim, ez rindbûma, bla ez rindbim
Bla ez rindbûmê, divê ez rindbim, divê ez rindbûma
Heke ez rindbim, eger ez rindbûma, rindbe, rindbim

Nasina lêkera bûn ji lêkera hevduvaniya ariker ku bî lêkera "bû" pêktê. Emê ji kşandîna lêkera "bûn" ra, lêkera "bûn" û ji lêkera ariker lêkera "bû" (lî mjara 98 an binêrîn) ra, lêkera "bûyîn bîbêjîn.

Divê çawan dî peyivînêda lêkera bûn ji lêkera bûyînê tê nasîn, ew ji bî drêj krîna kita dawî pêktê, wsa gelege dî nvisandinêda ji bête nasîn. Wekok: Ez rindbûm, ev kêşan çirokiya boriya têdayî ya lêkera bûne, yan pêşkêş krîna drûva tentêla xwe ya lêkera bûyînêye? Gava lêkera "bû" bî navdêrve hate danîn, çirokiya

têdayiye, yani kêşana lêkera bûne. Eger lêkera "bû" jî navdêrê cda hate danin, nmandina drûva tentêlêye. Dî hinde hevokanda, jîbo nmandina tentêlê, lêkera "bû" cda lî pêşî navdêr tê danin. Mina: Ez bûm karbîdest. Ez bûm serok, tu bûy pêşmerge lê ev ne tevayîye. Bêweku ez bûm serok, ez bûm şoreşker, ez bûm şvan dibe lê ez bûm zengin, ez bûm rind, ez bûm zer nabe.

Hinde herêm, kêşana lêkera bûn, dî ciyê "bû" da "û" tenî bikartinin:

Bû	û
Rindbû	rindû
Darbû	darû
Nexweşbû	nexweşû
Sorbû	sorû
Karbîdestbû	karbîdestû

Dî destê wêda tvingbû, dî destê wida tvingû û êd.

Kêşana lekera bûn, raweyên pêşkerî minî pêşkerîyan û raweyên daxwazî jî minî daxwazîyan tene kşandin. yani kêşana lêkera bûn, bê guhertin minî lêkerên edetine, yan dî drûva raweyên pêşkerî yan jî dî drûva raweyên daxwazîdanin. Hemî rawe jî heryek dî daneka xweda hatine vekitandin. Jiber vê yekê êdî vekitandin naxwaze, tenî tablo dê bêne danin.

Neyinî: Heke pêxîstî tunebe, yani pêxîstî kîrde pxwe be lî pêşî û heke pêxîstî hebe lî pê kîrde cda tê danin:

Ne ezîm ez ne karbîdestîm, ez ne rindîm
 Ne ezbûm ez ne karbîdestbûm ez ne rindbûm
 Bla ne ezbûma bla ez ne karbîdestbûma

RAWHEYÊN PÊŞKERÎ

180. DEMA FREH:

Ezîm	ez qencîm	ez karkerîm
Tuyî	tu qenci	tu karkerî
Ewe	ew qence	ew karkere
Emîn	em qencîn	em karkerîn
Hûnîn	hûn qencîn	hûn karkerîn

Ewın	ew qencın	ew karkerın
Neyini		
Ne ezım	ez ne qencım	ez ne karkerım
Ne tui	tu ne rındi	tu ne pêşmergeyi

Hinde hêrêm neyiniyê bı vi ewayi bıkartın:

Ez nınım	ez qenc nınım	ez karker nınım
Tu nını	tu rınd nını	tu pêşmerge nını

Balakêş: Çawan pêşmerge me, spehime dıbe wsan ji pêşmergeyim, spehiyim ji dıbe û herdu ji ji hêmana zmên tên.

Balakêş: Praniya yekan û dudan teni danina cinavkan peywıstıye. Lewra yên dında qertaflêker, cinavkan ji dınımın. Mina:

Qencım, qenci, qence, qencın, başım, başi, başe, başın

Dı devoka Buhtida praniya yekem ji danina cinavkê naxwaze Lewra qertaflêkera "in" cinavkê ji dınımine. Mina:

Rındın, başın, pêşmergeyin, mêrin, jnin, şoreşkerin

Dı vırda jıbo ne şewışinê em cinavkan ji gişk datin.

181. ÇIROKIYA DEMA BORIYA TÊDAYİ:

Ezbûm	ez rındbûm	ez pêşmergebûm
Tubûy	tu rındbûy	tu pêşmergebûy
Ewbû	ew pêşmergebû	ew rındbû
Embûn	em rındbûn	em pêşmergebûn
Ewbûn	ew rındbûn	ew pêşmergebûn
Hûnbûn	hûn pêşmergebûn	hûn rındbûn
Neyini		
Ne embûn	em ne gerdobûn	em ne bazırganbûn
Ne hûnbûn	hûn ne dewlemendbûn	hûn ne xzanbûn
Ne ewbûn	ew ne zarobûn	ew ne keçbûn

182. ÇIROKIYA DEMA BORIYA DÛDAR:

Ezbûme	ez pçûkbûme	ez xortbûme
Tubûyi	tu pçûkbûyi	tu xortbûyi
Ewbûye	ew pçûkbûye	ew xortbûye

Embûne	em pçûkbûne	em xortbûne
Hûnbûne	hûn pçûkbûne	hûn xortbûne
Ewbûne	ew pçûkbûne	ew xortbûne
Neyini		
Î e ezbûme	ez ne mjokerbûme	ez ne suxtebûme
Î e tubûyi	tu ne mjokerbûyi	tu ne suxtebûyi
Ne ewbûye	ew ne mjokerbûye	ew ne suxtebûye

183. DEMA BÊ:

Dê ezbîm	ezê palebîm	ezê serokbîm
Dê tubî	tuyê palebî	tuyê serokbî
Dê ewbe	ewê palebe	ewê serokbe
Dê embîn	emê palebîn	emê serokbîn
Dê hûnbîn	hûnê palebîn	hûnê serokbîn
Dê ewbîn	ewê palebîn	ewê serokbîn
Neyini		
Dê ne ezbîm	ezê ne betalbîm	ezê ne valabîm
Dê ne tubî	tuyê ne betalbî	tuyê ne valabî
Dê ne ewbe	ewê ne betalbe	ewê ne valabe

Ezêbîm, tuyêbî, ewêbe ewêbît ewêbîtîn û ez dê qencbîm, tu dê qencbî, ew dê qencbe ji têne bıkaranin.

Balakêş: Ew rengdêrên ku bî daçeka neyini bûne rengdêr, daçek û navdêr bî heve tên danin. Mina:

Neqenc axayê neqenc	nexweş keçîka nexweş
Nemêr mêmêr nemêr	nesazî lêkera nesazî

184. ÇIROKÎYA DEMA BÊ:

Ezêbûma	ezê cotkarbûma	ezê xotaxbûma
Tuyêbûya	tuyê cotkarbûya	tuyê xotaxbûya
Ewêbûya	ewê cotkarbûya	ewê xotaxbûya
Emêbûna	emê cotkarbûna	emê xotaxbûna
Hûnêbûna	hûnê cotkarbûna	hûnê xotaxbûna
Ewêbûna	ewê cotkarbûna	ewê xotaxbûna

Neyini

Dê ne ezbûma

Dê ne hûnbûna

Dê ne ewbûna

ezê ne şvanbûma

hûnê ne şvanbûna

ewê ne şvanbûna

ezê ne gavanbûma

hûnê ne gavanbûna

ewê ne gavanbûna

ŞERTİYÊN PÊŞKERÎ

Şertiyên raweyên pêşkeri: Ev şerti, teni cda danina daçekek ji daçekên şerti (er, ger, wer, eger, heke, heker, ku) li pêşi lêkeran tê hmatê. Mina:

Heke ezım, eger tuyi, er ewe, wer emın, ku hûnın

Eger ezbûm, heke tubûy, er ewbû, wer embûn, ku ewbûn

Zêde ser sekının naxwaze. Lewra raweyên pêşkeri hatıbûn danin, ev ji şertiyên wanın.

RAWİYÊN DAXWAZÎ**185. RAWEYA FERMANÎ:**

Be qencbe

Bın qencbın

karkerbe

karkerbın

pêşmergebe

pêşmergebın

186. RAWEYA XWESTINÎ:

Ezbım

Tubi

Ewbe

Embın

Hûnbın

Ewbın

Neyini

Ne ezbım

Ne embın

Ne hûnbın

ez gernasbım

tu gernasbi

ew gernasbe

em gerqasbın

hûn gernasbın

ew gernasbın

ez ne kardarbım

em ne kardarbın

hûn ne kardarbın

ez maldarbım

tu maldarbi

ew maldarbe

em maldarbın

hûn maldarbın

ew maldarbın

ez ne nviskarbım

em ne nviskarbın

hûn ne nviskarbın

Balakêş: Gava kırde ne cinavkbe, geleke "t, tın" ek bı dawiya lêkera yekaniya sîsêyanve bête qertıfandın. Mina:

B¹ b¹ b¹ qencb¹ qencb¹
 B¹ vi ewayi kêşana sîşeyan jî fermanî çêtir tê nasin.

186. A. ÇIROKÎYA XWESTINÎ:

Ezbûma	ez xwendevanbûma	ez mezînbûma
Tubûya	tu xwendevanbûya	tu mezînbûya
Ewbûya	ew xwendevanbûya	ew mezînbûya
Embûna	em xwendevanbûna	em mezînbûna
Hûnbûna	hûn xwendevanbûna	hûn xwendevanbûna
Ewbûna	ew mezînbûna	ew xwendevanbûna
Neyini		
Ne embûna	em ne xêşimbûna	em ne xeradbûna
Ne hûnbûna	hûn ne xêşimbûna	hûn ne xeradbûna
Ne ewbûna	ew ne xêşimbûna	ew ne xeradbûna

 Jî wan berxan yek jî ezbûma xwezi. (Kemal Badîllî)

187. RAWEYA BLANÎ:

Bla ezbîm	bla ez bedewbîm	bla ez mêrbîm
Bla tubî	bla tu bedewbî	bla tu mêrbî
Bla ewbe	bla ew mêrbe	bla ew bedewbe
Bla embîn	bla em bedewbîn	bla em mêrbîn
Bla hûnbîn	bla hûn bedewbîn	bla hûn mêrbîn
Bla ewbîn	bla ew bedewbîn	bla ew mêrbîn
Neyini		
Bla ne ezbîm	bla ez ne jînbîm	bla ez ne duhtbîm
Bla ne tubî	bla tu ne jînbî	bla tu ne duhtbî
Bla ne ewbe	bla ew ne jînbî	bla ew ne duhtbe

188. ÇIROKÎYA BLANÎ:

Bla ezbûma	bla ez şengbûma	bla ez başbûma
Bla tubûya	bla tu şengbûya	bla tu başbûya

Bla ewbûya	bla ew şengbûya	bla ew başbûya
Bla embûna	bla em şengbûna	bla em başbûna
Bla hûnbûna	bla hûn şengbûna	bla hûn başbûna
Bla ewbûna	bla ew şengbûna	bla ew başbûna
Neyini		
Bla ne embûna	bla em ne kurbûna	bla em ne keçbûna
Bla ne ewbûna	bla ew ne kurbûna	bla ew ne keçbûna
Bla ne tubûya	bla tu ne kurbûya	bla tu ne keçbûya

189. RAWEYA VÊNÎ:

Divê ezbîm	divê ez jirbîm	divê ez mirbîm
Divê ne tubî	goti tu jirbî	divê tu mirbî
Divê ewbe	divê ew jirbe	divê ew mirbe
Divê embîn	goti em jirbîn	goti em mirbîn
Goti hûnbîn	goti hûn jirbîn	goti hûn mirbîn
Goti ewbîn	goti ew jirbîn	goti ew mirbîn
Neyini		
Divê ne ezbîm	divê ez ne jirbîm	divê ez ne mirbîm
Goti ne tubî	goti tu ne jirbî	goti tu ne mirbî
Divê ne ewbe	divê ew ne jirbe	divê ew ne mirbe

190. ÇIROKÎYA VÊNÎ:

Divê ezbûma	divê ez şêrbûma	divê ez zirbûma
Goti tubûya	goti tu şêrbûya	goti tu zirbûya
Goti ewbûya	goti ew şêrbûya	goti ew zirbûya
Goti embûne	goti em şêrbûna	goti em zirbûna
Divê hûnbûna	divê hûn şêrbûna	divê hûn zirbûna
Divê ewbûna	divê ew şêrbûna	divê ew zirbûna
Neyini		
Divê ne embûna	divê em ne kalbûna	
Divê ne hûnbûna	divê hûn ne kalbûna	
Divê ne ewbûna	divê ew ne kalbûna	

Çirokiya xwestini, blani û vênî: Karkerba, karkerbûwa, bla karker-

ba, bla karkerbûwa, bla karkerbûwan, geleke karkerba, geleke karkerbûwa, dîvê karkerbûwan ji têne bîkaranin.

191. RAWEYA ŞERT-DAXWAZ:

Eger ez bîm	eger ez merdbîm	eger ez pêşmergebîm
Heke tubî	heke tu merdbî	heke tu pêşmergebî
Heke ewbe	heke ew merdbe	heke ew pêşmergebe
Eger embîn	eger em merdbîn	eger em pêşmergebîn
Eger hûnbîn	eger hûn merdbîn	eger hûn pêşmergebîn
Heke ewbîn	heke ew merdbîn	heke ew pêşmergebîn
Neyini		
Ger ne ez bîm	er ez ne melabîm	ger ez ne axabîm
Ku ne tubî	ku tu ne melabî	eger tu ne axabî
Er ne ewbe	er ew ne melabe	eger ew ne axabe

192. ÇIROKÎYA ŞERT-DAXWAZ:

Heke ez bûma	eger ez wezabûma	eger ez jarbûma
Eger tubûya	heke tu wezabûya	heke tu jarbûya
Heke ewbûya	heke ew wezabûya	heke ew jarbûya
Eger embûna	eger em wezabûna	eger jarbûna
Ger hûnbûna	ger hûn wezabûna	ger hûn jarbûna
Wer ewbûna	wer ew wezabûna	wer ew jarbûna

Neyini

Er ne ez bûma	ku ez ne zanabûma	er ez ne candarbûma
Ku ne tubûya	ku tu ne zanabûya	ku tu ne candarbûya
Er ne ewbûya	er ew ne zanabûya	er ew ne candarbûya

Heke qencba, heke qencban, heke qencbûwa, heke qencbûwan ji têne bîkaranin.

Balakêş: Jî lêkera bûn sê navdêr hatin kşandin. Dîvê bête zanin ku çqas navdêrên me hene gişk bî van qaydan têne kşandin.

 Mîn jî jinê daxwaz gula sor û geşe
 Lê kerê reş birçiye armanc û daxwaz kelbeşe

Tîm jî dêmên sorgulî ez rûgeş û dîlxweş dîbîm
Ah û nalin min jî tir û awêrên çavên reşe
Ger divê cejnêde carek lebşeker maçek bîdî
Tême govend û sema pîr şad û cejna min xweşe
Min dema destê xwe dayê awêrek da dîl revayê
Dîl kete nav lerz û tayê badexwer û serxweşe
(Cigerxwin)

WANE XXIX

HEBÛN

193. Kşandına lêkera hebûn: Ev lêker jî lêkera heyin "he" û jî qertaflêkeran pêktê.

Bî heve danina "he" û qertaflêkerek, lêkera hebûn tê hmatê.

Hêmana lêkera hebûn bî têgîha dema frehe. Çirokiya boriya têdayî û dûdar, dema bê û çirokiya wê, raweya fermanî, raweyên daxwazî û çirokiyên wan jî têne kşandin.

Dî tentêla neyinîda, daçeka neyinî "he" yê têxe û xwe lî ciyê wê datîne û heyinî dibe neyinî:

Mîn heye, mîn neye, mîn tune

Mîn hebû, mîn nebû, mîn tunebû

Mîn drav hebû, mîn drav nebû

Mîn drav tunebû...

Çawan lî daneka ahengiya lêkeranda hatibû ditin ku dî lêkera hebûnda ahengiya lêker bî serveraye. (lî daneka 126 an binêrîn)
Yanî yekani û praniya serve bî lêkeran tê zanîn:

Mîn tving heye

mîn tving hene

Mîn xani heye

mîn xani hene

RAWEYA PÊŞKERÎ

194. Dema freh:

Mın heye	mın pirtûk heye	mın pirtûk hene
Te heye	te pirtûk heye	te pirtûk hene
Wi heye	wê pirtûk heye	wi pirtûk hene
Me heye	me pirtûk heye	me pirtûk hene
We heye	we pirtûk heye	we pirtûk hene
Wan heye	wan pirtûk heye	wan pirtûk hene

Neyini

Mı tune	mın pirtûk tune	mın pirtûk tune
---------	-----------------	-----------------

Dı neyini da, çawan lı jorin ji dixwiyê, lı pêşi daçeka neyini "tu" yek bête danin çêtire. Dı hinde herêmanda: Mın niye, mın pirtûk niye, mın nine, mın pirtûk nine. Serve prani ji. Mın ninin, mın pirtûk ninin tê bikaranin û mın henin, mı neyin ji tene xebitan-din

Go mın du kurik heyin dı mesûm

Bê bab û yetim û jar û mehrûm (Ehmedê Xani)

Mafê mrofên neteweyê bîndest tune ku bendek ji bendên burju-wayê netewê serdest tercih bikin

195. ÇIROKÎYA DEMA BORIYA TÊDAYÎ:

Mın hebû	mın dewlet hebû	mın dbistan hebû
Te hebû	te dewlet hebû	te dbistan hebû
Wê hebû	wê dewlet hebû	wê dbistan hebû
Me hebû	me dewlet hebû	me dbistan hebû
We hebû	we dewlet hebû	we dbistan hebû
Wan hebû	wan dewlet hebû	wan dbistan hebû

Prani

Mın hebûn	mın dewlet hebûn	mın dbistan hebûn
-----------	------------------	-------------------

Neyini

Mın nebû	mın dewlet nebû	mın dbistan nebûn
----------	-----------------	-------------------

196. ÇİROKİYA DEMA BORİYA DÛDAR:

Min hebûye	mın welet hebûye	mın zevi hebûye
Te hebûye	te welat hebûye	te zevi hebûye
Wê hebûye	wi welat hebûye	wê zevi hebûye
Me hebûye	me welat hebûye	me zevi hebûye
We hebûye	we welat hebûye	we zevi hebûye
Wan hebûye	wan welat hebûye	wan zevi hebûye
Prani		
Te hebûne	te welat hebûne	te zevi hebûne
Neyini		
Te nebûye	te welat nebûye	te zevi nebûne

197. DEMA BÊ:

Minê hebe	minê zman hebe	minê stran hebe
Teyê hebe	teyê zman hebe	teyê stran hebe
Wêyê hebe	wiyê zman hebe	wêyê stran hebe
Meyê hebe	meyê zman hebe	meyê stran hebe
Weyê hebe	weyê zman hebe	weyê stran hebe
Wanê hebe	wanê zman hebe	wanê stran hebe
Prani		
Minê hebin	minê zman hebin	minê stran hebin
Neyini		
Wêyê nebe	wiyê zman nebe	wêyê stran nebin

198. ÇİROKİYA DEMA BÊ

Minê hebûya	minê çiya hebûya	minê zozan hebûya
Teyê hebûya	teyê zozan hebûya	teyê çiya hebûya
Wêyê hebûya	wiyê çiya hebûya	wêyê zozan hebûya
Meyê hebûya	meyê çiya hebûya	meyê zozan hebûya
Weyê hebûya	weyê zozan hebûya	weyê çiya hebûya
Wanê hebûya	wanê çiya hebûya	wanê zozan hebûya

Prani

Meyê hebûna meyê çiya hebûna meyê zozan hebûna

Neyini

Meyê nebûya meyê çiya nebûya meyê zozan nebûya

Şertiyen raweyên pêşkeri, lı pêşi kêşanan cda danina daçekek jı daçekên şerti pêktên. Mina: Ku mın heye, heke mın hebû, er mın hebûye, eger mınê hebe, ger dê mın hebûya...

RAWAYÊN DAXWAZÎ

199. Raweya fermani: Hebe, hebın. Neyini: Tunebe, tunebın...

200. RAWEYA XWESTINÎ:

Mın hebe	mın pergal hebe	mın lêzım hebe
Te hebe	te pergal hebe	te lêzım hebe
Wê hebe	wê pergal hebe	wi lêzım hebe
Me hebe	me pergal hebe	me lêzım hebe
We hebe	we pergal hebe	we lêzım hebe
Wan hebe	wan pergal hebe	wan lêzım hebe

Prani

We hebın we pergal hebın we lêzım hebın

Neyini

We nebe we pergal nebe we lêzım nebın

Mın hebın sêsed hezar ezman û dev
Yek demê xafil neminım roj û şev (Ehmedê Bateyi)

201. ÇIROKÎYA XWESTINÎ:

Mın hebûya	mın pez hebûya	mın bêrivan hebûya
Te hebûya	te pez hebûya	te bêrivan hebûya
Wê hebûya	wê pez hebûya	wi bêrivan hebûya
Me hebûya	me pez hebûya	me bêrivan hebûya
We hebûya	we pez hebûya	we bêrivan hebûya
Wan hebûya	wan pez hebûya	wan bêrivan hebûya

Prani û neyini:

Wan hebûna wan pez hebûna

wan lêzım nebûna

202. RAWEYA BLANÎ:

Bla mın hebe

bla mın şûr hebe

bla mın tir hebe

Bla te hebe

bla te şûr hebe

bla te tir hebe

Bla wê hebe

bla wê şûr hebe

bla wi tir hebe

Bla me hebe

bla me şûr hebe

bla me tir hebe

Bla we hebe

bla we şûr hebe

bla we tir hebe

Bla wan hebe

bla wan şûr hebe

bla wan tir hebe

Prani û neyini:

Bla mın hebin

bla mın şûr hebin

bla mın tir tunebin

203. ÇİROKİYA BLANÎ:

Bla mın hebûya

bla mın kêr hebûya

bla mın rım hebûya

Bla te hebûya

bla te kêr hebûya

bla te rım hebûya

Bla wê hebûya

bla wi rım hebûya

bla wê kêr hebûya

Bla me hebûya

bla me kêr hebûya

bla me rım hebûya

Bla we hebûya

bla we kêr hebûya

bla we rım hebûya

Bla wan hebûya

bla wan kêr hebûya

bla wan rım hebûya

Prani û neyini:

Bla te hebûna

bla te kêr hebûna

bla te rım nebûna

204. RAWEYA VÊNÎ:

Divê mın hebe

divê mın sêv hebe

divê mın lêv hebe

Divê te hebe

divê te sêv hebe

divê te lêv hebe

Goti wê hebe

goti wi sêv hebe

goti wê lêv hebe

Goti me hebe

goti me sêv hebe

goti me lêv hebe

Goti we hebe

goti we sêv hebe

goti we lêv hebe

Divê wan hebe

divê wan sêv hebe

divê wan lêv hebe

Prani û neyini:

Divê wê hebin

divê wi sêv hebin

divê wê lêv nebin

205. ÇİROKİYA VÊNÎ:

Divê min hebûya divê min çav hebûya divê min nav hebûya
Goti te hebûya goti te çav hebûya goti te nav hebûya
Goti wê hebûya goti wi çav hebûya goti wê nav hebûya
Divê me hebûya divê me çav hebûya divê me nav hebûya
Goti we hebûya goti we çav hebûya goti we nav hebûya
Divê wan hebûya divê wan çav hebûya divê wan nav hebûya

Prani û neyini:

Divê me hebûna divê me çav hebûna divê me nav hebûna

206. RAWEYA ŞERT-DAXWAZ:

Heke min hebe heke min nan hebe heke min dan hebe
Heke te hebe heke te nan hebe heke te dan hebe
Eger wê hebe eger wi nan hebe eger wê dan hebe
Eger me hebe eger me nan hebe eger me dan hebe
Eger we hebe eger we nan hebe eger we dan hebe
Ger wan hebe ger wan nan hebe wer wan dan hebe

Prani û neyini:

Eger me hebin eger me nan hebin eger me dan nebin

207. ÇİROKİYA ŞERT-DAXWAZ:

Eger min hebûya eger min mêr hebûya ger min şêr hebûya
Eger te hebûya eger te mêr hebûya ger te şêr hebûya
Heke wê hebûya heke wê mêr hebûya heke wi şêr hebûya
Heke me hebûya heke me mêr hebûya heke me şêr hebûya
Heke we hebûya heke we mêr hebûya heke we şêr hebûya
Ger wan hebûya ger wan mêr hebûya wer wan şêr hebûya

Prani û neyini:

Ger we hebûna ger we mêr hebûna ger we şêr tunebûna

Ger dê hebûya me ji xwîdanek
Ali keremek letife danek (Ehmedê Xani)

208. Gava lêkera hebûn mina lêkera bûn bête bıkarandin, ji hebûnê derdikeve û dibe "bûn". Cinavkên desta ez û qertaflêkeran dîgîrîn û mina lêkera "bûn" tê kêşan:

Ez heme	ez hebûm	ezê hebim	bla ez hebim
Tu heyî	tu hebûy	tuyê hebiy	bla tu hebiy
Ew heye	ew hebû	ewê hebe	bla ew hebe
Em hene	em hebûn	emê hebin	bla em hebin
Hûn hene	hûn hebûn	hûnê hebin	bla hûn hebin
Ew hene	ew hebûn	ewê hebin	bla ew hebin
Neyînî			
Ez tuneme	tu tuneî	ewê tunebin	bla ew tunebin

WANE XXX

DI LÊKERANDA PIRSYARI

209. Dî lêkeranda pîrsyari: Jî bîl pîrsina bî hokerên pîrsiyari, dî zmanê meda graniya peyivîna pîrsyari bî tonaja dengan pêktê. Yanî bî drêj krîna kita dawî pîrsin tê hmatê. Xwezay dî nvisandîna çareki wha tune. Pzo danîna îşareta pîrsiyari (?) lî dawîya lêker û hevokan, lêker yan jî hevok dîbîn pîrsiyari. Mina: Hûn bîçîne şerê azadî? Dê tu bîkari rêzîman bînivîsi? Tu dîkari nvisandîna Kurdi bîxwîni?

Hinde ewayên peyivîna û nvisandîna jî bî daçekan pêktên. Xwezay gava bî daçekan jî bête pîrsin, disa dî nvisandîna lî dawîya lêker û hevokan, gelege îşareta pîrsê bête danîn.

Jîbo pîrsînê hinde daçekên pîrsiyari evîna: Ma, qey, qay, gelo. "Ma" bî sere xwe jî tê bîkaranîn. Mina: Ma tu naçî bajêr? Bî "qey, gelo" ve jî tê danîn û bî hevra dîbîn daçekek. Mina: Maqey tu naçî nav karkeran? Magelo refa perçîqî bî xwe hesaye?

Daçekên pîrsiyari cda lî pêşî lêkeran, heta lî pêşî kirdan tene danîn .

Graniya xebata "gelo" jîbo diyar krîna kovanane. Mina: Gelo ezê rîzgariya gel û karkeran bîbinim? Gelo ezê jî vê zîndanê bîfîlitim? Gelo dermanê şîyar bûna gel û karkeran çîye? Ev hevokên

han dîdîn diyar krîn ku gotox dî kovan rîzgariya gel û karkeran, flî-
tina jî zîndanê û peyda krîna dermanê şîyar bûna gel û karkeranda-
ye.

Xwezay "gelo" dî her ciyêda tenî kovanan diyar nake. Dî hinde
ciyanda, wekî daçekên dîn jî pîrsan pêktine.

Gelo disa bîbinim ez çrayê wesletê hîlbit
Bîsojim şubhê perwanê dî ber wê nar û şewqêda
Lî kelbê asêtanê xwe ne pîrsî qet hebîb carek
Gelo nayîne birê em dî vê nêçîr û ravêda

(Melayê Czirî)

Daçeka "ma, qey, qay" jî lêker û hevokan têxîn tentêla pîrsiyarî.
Mîna: Ezê biçim, ma tu nayê? Qey te nan xwarîye? Maqey fravîna
me ne xweş bû?

Bî hinde daçekên dîn jî pîrsiyarî pêktên, dê lî daneka daçekên
pîrsiyarî û hevokanda bîna dabaş krîn.

Ağîr û pêta evînê, îlleta dax û brînê
Xweş dibî ma ew bîdînê? Şerbeta lêvan mefaye (Melayê Czirî)
Gelo karê te çîye? Mrov entellektuelbe û derveyê welat jî lî ser
siyaset mjûl nebe, ew çî tîşte? Maqey tu ne Kurdî? (Dr. Şvan)
Gelo Demîrel jî wî ne pîrsibû, yan jî wîra ne gotibû ku kîjan we-
zirîye bîde wî? (Rojî welat)

HOKER

210. Hoker: Hoker navê wan peyvên çqasî, çawanî, cîh, pîrs û
demên ku têne pêşî lêkeran û bzava lêkeran kîfş dîkîn. Çawan te-
nî serê xwe rengdêr nebe. Wsan bî serê xwe tenî hoker jî nayê po-
nîjin. Yanî hoker jî mîna rengdêran, gava bî tena xwebe, jî nav
zêdetîr ne tîşteke. Rengdêr navdêran reng û kîfş dîkîn. Hoker jî he-
rîkîna lêkeran teyîn dîke û lepata wan dî nav dem, cî, çawanîda kîfş
dîkîn. Bî ewayek dîn bîbêjin hoker rengdêrên lêkeran. Her çqas
hoker dîkevîne pêşî navdêran û wan reng û kîfş dîkîn jî disa têgîha

wan bî lêkeranve grêdayine. Her hoker nave lê her nav ne hokere. Ew daçekên hokerane tèn bîkaranin, jî hokeran tène hejmartin.

Dî zmanê mede hoker, nav û daçekên ku hokerane tène bîkaranin gelekî. Tesbîta gişkan hîm pîr zore û hîm jî hecma pîrtûka me hîlnade. Tenî emê qaydê gişkan daynî û hemî celebên jî çendek jê bînivîsin.

Hoker, yan bî serêxwe yan jî bî navdêrekra cda lî pêşî lêkeran tène danin, çawani, çendani, pîrsiyari, û ciyan teyîn û jî raweyên pêşkerî çêtir demên lêkeran kîş û zelal dîkî.

Hoker dîbî pînc bîr:

- A- Hokerên demin
- B- Hokerên chin
- C- Hokerên çawani
- D- Hokerên çqasi
- E- Hokerên pîrsiyari

211. A- Hokerên demin: Bûyînê yan jî krînê dî nav demanda nîşan dîdî:

Dho ez çûme dîbîstanê, îro jî ezê bîçimê, Par bavo ez şandîm têkoşera gelêr, isal jî ez dîponîjim.

Dho, îro, par û isal hokerî. Lewra bîzava lêkeran dî demanda nîmandî.

Ewayek dî bîbêjin, bersivî dana pîrsa "kengî" hokerên demin tène nasîn min, kengî? dho, îro, par û isal.

Hnek jî hokerên demin:

Baharê	êvarê	nivro	sbê
Berî	ew roj	nîjkeve	sîfte
Betîrpêr	havinê	par	şevadî
Betîrpêrar	hema	pêr	şevadîn
Dan	hêj, hêjan	pêrar	şevêdî
Dana sbê	hînga, hîngo	paşî, paşve	şevê, pşev
Dana êvarê	hîngorê	payizê	şevîn
Demadî	îro	pêşda	zavîstanê
Dewra berî	isal	rojê	zû
Dho	mêj, mêjve	saledî	zûda
Dreng	nho, nha	saltîredî	zûve

212. B- Hokerên chin: Ev hoker ci û derên bûyin' û krînên lêkeran teyin dîkîn. Ango berokên lêkera nişan dîdîn. Mina:

Ez derketim derve. Tu berbîmal dîçî, av serejêr dîçe .

Mîrî lî dormedarê koledar û mjokeran xweş dîgere.

Derve, berbîmal, serejêr û dormedar hokerî, ci û berokên lêkeran nişan dîdîn

Bersiv dana pîrsa "lî kû, kûve" hokerên chin têne nasîn. mina:

Ez derketim, lî kû? Bersiv: derve

Çendek jî hokerên chin:

Ali	Domedar	Kêlek	Rast
Bal	dor	navber	rastbîrast
Berane	dormedar	navê	rex
Berjêr	dû	neqeb	serbîser
Bîndest	dûr	nîk	seranser
Berwar	ervaz	nşiv, nşov	serdest
Berjêr	hawêr	nivhend	serejêr
Bîn	herder	nîzik, nêzik	seropa
Cem	hêl	paş	tenîşt
Çarnîkar	hundîr	pêş	xar
Der, derek	jêr	pêşber	vîr
Derve	jor	pêve	wîr

Hinde hoker hîm têgîha "chin" û hîm jî têgîha "demin" têda he-
ne. Mina:

Dûr, nîzik, paşî, pêşî...

Ew jî jî têgîha herîkîna hevoka tê zanîn.

213. C- Hokerên çawani: Ev hoker drûv û tentêla lêkeran nişan dîdîn. Yanî çawan bûye û çawan hatîye krîn kîş dîkîn. Mina:

Reşo bî lez çû, Azad pîrtûkan xweş dîxwîne

Rêzan bî bayêbez xwe nivê şevê ghande şoreşê

Lez, xweş, bayêbez hokerî û çawaniya lêkeran nişan dîdîn.

Jîbo nasîna hokera çawani, pîrsa "çawan" tê krîn, bersiv hokera çawaniye. Mina: Çawan çû? Lez. Çawan xwend? xweş...

Hnek jî hokerên çawani:

Baş	freh	Qenc	teng
Bîh	gran	qewî	xweş

Çê, çêtir	hêdi	rınd	xrab
Dnıst	hêdika	sıst	wha
Drêj	jêhati	sık	wsan, wlo
Eware	kurt	svık	zor

Divê bête zanin, navdêr dema navan reng û kıfş bıkın "rengdêr" in û gava bzava lêkeran teyin bıkın "hoker" in. Wekok:

Rengdêr

Zerifa rınd xwend
Reşoyê gran hat
Barana payizê bari
Temoyê bıçek çû şer
Natorvanê rojê hat
Azad darê erzan kri

Hoker

Zerifê rınd xwend
Reşo gran hat
Baran payizê bari
Temo bıçek çû şer
Natorvan roj hat
Azad dar erzan kri

Balakêş: Daçeka "tır" têgıha hokeran zêdedar dıke, "tırtır" ducendi dıke û "trin" ji hedê dawı dıde. Mina:

Kêm, kêmtır, kêmtırtır, kemptırin
Zêde, zêdetır, zêdetırtır, zêdetırin

214. D- Hokerên çqasi (çendani): Ev hoker Pır û hındıki, yani çendaniya bzava lêkeran kıfş û teyin dıkın. Mina:

Gelek caran ji mınra gotıbûn ku baweriya xwe bı şêx û axan meyne, hındık ji be dıwanda qenc dernakevın.

Lewra ew pır malê sêwi, xzan û bê dest û peyan dıxwın

Gelek, hındık û pır hokerın û çendaniya bzava lêkeran nmandıne?

Jıbo nasına hokera çqasi, pırsa "çend, çqas" tê krın, bersıv hokera çqasiye. Mina: Çend car? gelek. Çqas qenc dernakevın? hındık-be ji.

Hnek ji hokerên çqasi:

Bes	hnan	hevçend	pır, pırtır
Carna	hne	hew	teni
Çendek	hındek	hewçend	zehf, zaf
Ew çend	hındekan	hewqa, hewqas	zehfcar
Gelek	hındık	kêm, kêmtır	zêde, zêdetır

Divê bête zanın ku hejmar ji, hokeri têne bıkaranın. Mina:

Karker şeş-şeş çûne xebetê. tu çar-çar hejmêre

215. E- Hokerên pîrsiyari: Ev hoker bî pîrsiyari, bzava lêkera
teyîn dîkî. Mina:

Tu kengi xwe jî destê xwinmîjan rîzgar bîkî? Tu çra heta
nha mayî? Te çawan kedxwerê xwe ne nasiye?

Kengi, çra û çawan hokerên pîrsiyarînin.

Çendek jî hokerên pîrsiyari:

Bî çî	çawan	çer	çî gav
Çankî	çend	çî dem	çma
Çra	kengi	ki	kijkan
Çto	kêjan	kijan	lî kû

Hinde hokerên pîrsiyari hene ku dem û ciyan jî dînimîn. Ew
hoker, jî hokerên dem û ciyan jî têne hejmartin. Mina: Kengi, lî kû.

Tacdîn ku dîgel bran bî meş hat
Kapên jî bo memê duşêş hat (Ehmedê Xanî)

WANE XXXI

DAÇEK

216. Daçek: Daçek bî serê xwe bê têgîhên taybetinîn. Pzo gava daçek bî peyvanra bêne bıkaranin têgîh dıgırın, yan ji têgîha peyvan zelal dıkın. Mina: Diyarbekır dı Diyarbekırda, Lı Diyarbekır, Jı Diyarbekır, bı Diyarbekırve. Mala mın dı Diyarbekırdaye, Ez lı Diyarbekırê rûdınım, Ez jı Diyarbekırê tēm, Ez bı Diyarbekırve çûm...

Hinde, daçek, carna ciyê peyvek û hevokek dıgırın û heke bî serê xwe têgîhek jar ifade bıkın ji, disa têgîha wan bî peyv û hevokanve grêdayine. Mina:

Qey tu êdi ji axanra dê pır bıxebıtı? Na

Ma tu doza karker û cotkaran dıpejırini? Belê

Yani êdi ez ji axanra naxebıtım û doza karker û cotkaran ji dıpejırinım. Vaye "na, belê" daçekın û ciyê hevokên keti girtine.

Drûvê danina daçekan

217. Daçekên lêker çêkırrox: Daçekên dı lêker çêkırmanda têne bıkaranin. Mina: Rakırın, dakırın, vekırın û yên dı lêker kşananda têne xebıtandın, teni "bı, dı" mina bıke, dıke û neyiniyên daçek yan ji tip êxıstox, mina meke, nake, najo, navêje û neyiniyên lêkerên daçekı, mina vmeke, hılmeke, ranedıkır, venedıkır bı lêkeranve

têne danin.

Gava du daçek bî hevra bêne bıkaranın û bî daçeka "her" a daçekek, hejmarek, navdêrek, yek û du kite bîn, bî heve danina wan çêtire. Mina:

An go, ango, jî ber jiber, jî bo jibo, yan jî yanji

Her weki Herweki, her dem herdem, her çar herçar...

Daçekên dîn gişk cda têne danin.

218. Dî zmanê daçek: Dî zmanê meda daçek prîn. Şxwe mrov dîkare bêje ku zmanê Kurdi, bî daçekan tê peyivîn.

Hinde navdêr jî hene ku bî daçekane têne bıkaranın û gava navdêrek bî daçekane hate xebitandin, jî daçekan tê hejmartin. Jî-ber vê yekê jî wan navdêranra jî emê daçek bîbêjin.

Celebên daçekan: Dî zmanê meda heft celeb daçek hene:

A- Daçekên lêkeri

E- Daçekên pîrsiyari

B- Daçekên raweyi

F- Daçekên sedemi

C- Daçekên navdêri

G- Daçekên vekîti

D- Daçekên erênî û neyînî

219. A- Daçekên lêkeri: Jî van daçekanra, daçekên lêkerçêker jî tê gotin. Lewra dî çêkirina lêkeranda têne bıkaranın:

Ba	der	lê	rê	têk
Ber	hîl	pê	rû	ve
Çê	hin	pêk	ser	vê
Da	jê	ra	tê	wer
Badan	hîlkîrîn		pêkhatîn	têketîn
Berketîn	hînkîrîn		rakîrîn	têkdan
Çêkîrîn	jêkîrîn		rêkîrîn	veketîn
Dakîrîn	lêkîrîn		rûniştîn	vêketîn
Derkîrîn	pêketîn		serketîn	wergirtîn

Daçeka "ve" jî gişkan pîrtir tê bıkaranın. Ev daçek dî gelek ciyanda bzava lêkerên tîne nivîyê. Mina:

Sekîni vesekîni, xebîti vexebîti, xwar vexwar

Bri vebîri, girt vegirt, westa vewesta...

Yani tam ne sekîni, ne xebîti, ne xwar, ne bri, negirt û ne westa. Herweki sekîni, xebîti, xwar, bri, girt û westa.

Daçekên dîn jî lêkeran normal çêdikin, hîndik yan jî pîr têgihên

lêkeran yêh hêmani dıguherinin.

Nıştımın bı çekan tê vegirtın û bı çekan tê standın (Gotına mezınan)

220. B- Daçekên raweyi: Jı vanra daçekên kêşana lêkeran ji tê gotın:

Dema nho û freh : dı

Dema bê : ê, dê, tê, wê

Raweya fermani : bı

Raweya blani : bla, bra, bera, bere

Raweya vênî : divê, geleke, goti

Raweyên şerti : er, wer, ger, ege, eger, heke, ku, heker.

Bı van daçekan lêker têne kşandın. (bı fermo lı raweyên pêşkeri û daxwazi binêrın)

221. C- Daçekên navdêri: Jı vanra daçekên berin û daçekên tewanga navan ji tê gotın:

Lı pêşi navan Dı, jı, lı, bı

Dı maldame, jı mal têm, lı malım, bı malve çûm

Lı dawî navan ji

Jı wê jî dengêk derneket.

222. D- Daçekên erêni û neyini:

Erêni: Bla, belê, erê, herê, hemın, şxwe

Neyini: Bê, ne, na, nı, me, no, nexêr

Bı van daçekan erêni û neyini yan ji pejırandın û ne pejırandın pêktên.

223. E- Daçekên pırsiyari: Ev daçek ewın ku bı wan pırs têne krın:

Çanki, çawan, çer, çma, çra, çto, gelo, ka, kani

Ma, qay, qey, pra, praji, wa, weh, wey, ya

224. F- Daçekên sedemi:

Ber, da, daku, jiber, jibo, bo, ku, seba, sedem

Ber vê yekê çû, bo mın bine, çov rakır da lêxe, ez

hatım da ku tu neçi, ez jiber stemê derketım, jibo te

ani, hat ku tu ne tırsi, seba mın hat, sedem çı nayê

225. G- Daçekên vekîti:

Ba, bal, belki, bes, bese, carci, cardi, cem, spas
 Disa, êdi, gel, gor, gore, heçi, her, heta, şabaş
 Heya, hingi, lema, lew, lewma, lewra, manend, mina
 Minanda, nîk, pzo, qaşo, şubhi, şxwe, şxwileve, teni
 Tewri, weki, wha, wlo, wsa, xwezka, xwezi, xwezîl

Ba te	gel mine	lewma xwar	şxwileve briye
Bal mîn	gor wan	lewra xwest	teni tu were
Belkê bê	goreyê we	manendê te	tewri mezin
Bes tu weri	heçi ezîm	mina şêr	weki mêran
Bese bixwe	her camêr	minande wi	wha nabe
Carci were	heta êvarê	nîk te	wlo dibe
Cardi here	heya sbehê	pzo qedand	wsa ne rinde
Cem wêye	hingi gayek	qaşo ne hatîye	xwezka bî mîn
Disa hat	lema nayê	şubhi mîn	xwezi bîkîra
Êdi nayê	lew çû	şxwe nayê	xwezîl bîhata

Spas jîbo şoreşkerê gelê Kurd, şabaş jî xwîdêra

BANEŞAN= Deng

